



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artûklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

PIRSGIRÊKÊN ZAROKÊN DUZIMAN

DI DIBISTANÊN YEKZIMAN DE

Cemîl GUNEŞ

16711035

Şêwirmendê Tezê

Dr. Hînkar Mustafa ASLAN

Mêrdîn-2018



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artûklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**PIRSGIRÊKÊN ZAROKÊN DUZIMAN
DI DIBISTANÊN YEKZIMAN DE**

Cemîl GUNEŞ

16711035

Şêwirmendê Tezê

Dr. Hînkar Mustafa ASLAN

Mêrdîn-2018

PÊŞGOTIN

Bi vê lêkolînê pîrsgirêkên zarokên duziman ên wek xwendin-nivîsandin, fêhmîkirin, ragihandinê ku di dibistanên yekziman de dijîn hat lêkolînkirin. Pêşî bi metnên zanistî ên di vî warî de pîspor in hat rûkirin, vegotin û paşê jî ev pîrsgirêkên ku zarok dijîn bi alîkariya formekê ku bi pêşniyarên pîsporan hatiye amadekirin çavdêriyên mamosteyên ku zimanê wan î zikmakî ji hev cuda hat zelalkirin.

Bi vê lêkolînê me xwest balê bidin ser pîrsgirêkên zarokên duziman yên li dibistanê Tirkîyê. Her çiqas duzimanî ji bo zarokan eke avantajek bê dîtî jî, ji bo zarokên du ziman yên li dibastên vî welatî dibe dezavantaj. Ev dezavantaj bandorek nerênî li ser perwerde, jiyan, têkilî û serkeftina zarokan dike.

Ev lêkolîn di pêvajoyeke dirêj û dijwar de hat kirin. Bê guman gelek kes hene ku di vê pêvajoyê de qasî ku ji wan qediyane alîkarî bi vê lêkolînê kirine û kedeke mezin dane. Di serî de ji bo arîkarîya wan ez ji şêwirmendên xwe Mustafa Aslan û mamoste Nurettin Beltekîn re spas dikim. Dîsa ji bo alîkarî di warê wergera metnên îngîlîzî de malavahiya hevala xwe yî hêja Mamoste Ezgî Çelîk dikim. Ji hevsera xwe yî ku bi her awayî piştgiyariya xwe moral û motîvasyona min xweş dikir re, ji zarokên xwe yî delalîk Mordem û Dilkenê ku bi duzimaniyên xwe yî şêrîn hêz û deyx didan min re spasîyên mezin dikim. Ji mamosteyên ku li sehayê bi çavdêrî û fikrên xwe yî hêja ez agahdar kirim re spasîyên ji dil dikim û malavahiya wan dixwazim.

KURTE

Ziman ew amûr e ku têkiliya mirovan bi civakê û bi saziyên civakê re datîne. Perwerdehî jî amadekirina mirovan ji civakê û ji pêdiviyên civakê re ye. Bê guman perwerdehî bi zimanê civakê bê kirin hêja û kêrhatî ye. Lê mixabin li Tirkîyeyê her sal bi milyonan zarok bi zimanekî ji zimanê wan î zimakî cudatir perwerde dibin. Ev pêvajo jî bi xwe re gelek pîrsgirêkan tîne. Armanca vê tezê tespîtîkirina pîrsgirêkên zarokên duziman ên di dibistanên yekziman de ku ji aliyê xwendin-nivîsandin, ragihandin, fêhmîkirin, axaftin, lihevîkirina zarokan a pol û dibistanê ye.

Bi vê xebatê pîrsgirêkên zarokên duziman ên ku di dibistanên yekziman de dijîn hat lêkolînkirin. Ev lêkolîn bi pîrsgirêkên xwendekarên pola yekemîn a dibistana seretayî hat sînorkirin. Lêkolîn bi riya forma hevdiîtinê ku hatiye amadekirin hat kirin. Ev hevdiîtin bi 24 mamosteyên pola yekemîn ku 12 jê zimanê wan î zikmakî kurdî, 11 jê zimanê wan î zikmakî tirkî û yek jî zimanê wê yî zikmakî erebî hat kirin.

Tez ji çar beşan û ji encamê pêk tê. Di beşa yekemîn de mijar hatiye vegotin û armanc, rêbaz, sînor û çarçoveya lêkolînê hatine danîn. Di beşa duwemîn de têgehên zimên ên wek ziman, zimanê yekemîn, zimanê zikmakî, duzimanî û hwd. bi awayekî berfireh hatine nîqaşîkirin. Di beşa sêyem de têkiliya ziman û perwerdehiyê hatine danîn û li ser vê esasê giringiya perwerdehiya zimanê zikmakî û duzimanî hatiye vegotin. Di beşa dawî ya lêkolînê de jî daneyên lêkolînê hatine parvekirin û bi awayekî giştî hatine nirxandin.

Bi daneyên lêkolînê hat fêhmîkirin ku zarokên duziman ji ber cudahiya zimên, li dibistanê rastî gelek pîrsgirêkan tînin. Li gor lêkolînê diyar bû ku ev xwendekarên duziman ku bi zimanê xwe yî duwemîn perwerde dibin piranî di warê nivîsandin, fêhmîkirin û têkiliya bi mamosteyan re pîrsgirêkên mezin dijîn. Di encamê de jî ji bo serkeftina zarokên duziman, pêşniyara perwerdehiya duzimanî hatiye kirin.

Bêjeyên sereke: Perwerdehiya yekzimanî, duzimanî, pîrsgirêk, pîrsgirêkên hînbûnê

ÖZET

Dil insan ile toplum ve toplumun kurumları arasındaki ilişkiyi kuran önemli bir araçtır. Eğitim de insanı topluma ve toplumun ihtiyaçlarına hazırlama sürecidir. Şüphesiz ki eğitim süreci toplumun kendi dili ile yapıldığı zaman değerli ve de faydalıdır. Ne yazık ki Türkiye’de yılda milyonlarca öğrenci anadilleri dışında bir dil ile eğitime tabi tutuldukları için birçok sorun ile karşılaşılıyorlar. Bu araştırmanın amacı da tek dilli okullarda eğitim göre ikidilli çocukların okuma-yazma, iletişim ve okul-sınıfa uyumda yaşadığı sorunları tespit etmektir.

Bu araştırma ilkokul 1. sınıfa giden öğrencilerin yaşadığı sorunlar ile sınırlandırılmıştır. ile sınırlandırılmıştır. Araştırma hazırlanan bir mülakat formu ile yapılmıştır. Bu görüşmeler toplam 24 öğretmen ile gerçekleşmiştir. Bu öğretmenlerden 12sinin anadili Kürtçe, 11inin anadili Türkçe ve 1inin ise Arapça’dır.

Bu araştırma dört bölümden oluşmuştur. İlk bölümde araştırmanın konusu, amacı, yöntemi, sınırlılığı ve çerçevesi anlatılmıştır. İkinci bölümde dil, anadil, birinci dil, ikinci dil, ikidillilik gibi terimler geniş bir şekilde anlatılmıştır. Üçüncü bölümde eğitim ve dil ilişkisi açıklanıp anadilinde ve ikidilli eğitim anlatılmıştır ve son bölümde ise saha çalışmasında elde edilen verilen değerlendirilip ve tespitler yapılmıştır.

Elde edilen verilerden anlaşıldı ki ikidilli çocuklar, eğitim dilinin farklı olmasından dolayı birçok sorun ile karşılaşılıyorlar. Keza anlaşıldı ki bu ikidilli çocuklar okuma-yazma, anlama, iletişim ve öğretmen-okula uyum konusunda ciddi sorunlar yaşamaktadır. Sonuç bölümünde ise yapılan tespitler teorik zeminde tartışılıp çocukların akademik başarısı için ikidilli eğitim önerilmiştir.

Anahtar kelimeler: Tekdilli eğitim, ikidillilik, sorun, öğrenme sorunları

ABSTRACT

Language is an important tool that establishes a relationship between human beings, society and institutions. And education is a process that prepares human beings for the society and according to society's needs. There is no doubt that the process of education is useful and meaningful if it is done in the society's mother tongue. Unfortunately, in Turkey, millions of students face a lot of problems because they are educated in a language other than their mother tongue. The purpose of this study is to identify the bilingual students' difficulties, educated in monolingual schools, with reading, writing, communicating and adapting to class/school.

The scope of this study is limited to the problems encountered by the students of 1st class in Primary school. The study was carried out with a questionnaire form. The interviews were carried out with 24 teachers in total and conducted according to this questionnaire form. Twelve of these teachers are native speakers of Kurdish, 11 of them are native speakers of Turkish and one of them is Arabic

This study consists of 3 chapters. The first chapter concentrates on terms such as language, mother tongue, first language, second language and bilingualism in detail. The second chapter explains the relationship between education and language, and discusses the bilingual education and education in mother tongue. The last chapter includes observations and assessment of data collected in the field.

It's concluded that bilingual children face many problems when they are educated in another language other than their mother tongue. It's also concluded that bilingual children have serious difficulty with reading, writing, understanding, communicating and adapting to school. In the conclusion, assessments are discussed theoretically and bilingual education is suggested for children to be successful academically.

Key words: monolingual education, bilingualism, problem, learning, monolingual education, bilingualism, problems in learning

KURTEBÊJE

Vgh: Veguhêzer

hwd.: Her wekî din

Z1: Zimanê yekemîn

Z2: Zimanê duwemîn

NY: Neteweyên Yekbûyî

SHEA: Saziya Hevkariyê ya Ewlehiya Avrûpayê

KA: Konseya Avrûpayê

YA: Yekitiya Avrûpayê

NAVEROK

DESTPÊK

Mijara Lêkolînê.....	1
Armanc û Girîngîya Lêkolînê.....	4
Çarçove û Sînorên Lêkolînê.....	5
Rêbaza Lêkolînê.....	6
Pirsgirêk û Astengiyên Lêkolînê.....	6

BEŞA YEKEMÎN

ZIMAN

1.1. ZIMAN ÇI YE?.....	8
1.1.1. Zimanê Zikmakî.....	10
1.1.2. Zimanê Duwemîn.....	12
1.1.3. Zimanê Biyanî.....	13
1.2. Duzimanî Çi Ye?.....	13
1.2.1. Duzimaniya Hemwext.....	20
1.2.2. Duzimaniya Rêzîn.....	20
1.2.3. Duzimaniya Kesî.....	21
1.2.4. Duzimaniya Civakî.....	22

1.2.5. Duzimaniya Zêdeker.....	22
1.2.6. Duzimaniya Kêmker.....	23
1.2.7. Nîvzimanî.....	23

BEŞA DUWEMÎN

ZIMAN Û PERWERDE

2.1. ZIMAN Û PERWERDE.....	26
2.1.1. Perwerdehiya Bi Zimanê Zikmakî.....	31
2.1.1.1. Girîngiya Perwerdehiya Zimanê Zikmakî.....	33
2.1.1.2. Mafê Perwerdehiya Zimanê Zikmakî di Qada Navnetewî de.....	38
2.1.2. Perwerdehiya Duzimanî.....	41
2.1.3. Çend Modelên Serekê yên Perwerdehiya Duzimanî.....	42
2.1.3.1. Modela Derbasiyê.....	43
2.1.3.2. Modela Parastinê.....	43
2.1.3.3. Modela Dewlemedkirî.....	44
2.1.3.4. Modela Duzimanîkirinê.....	44
2.1.4. Modelên Perwerdehiya Duzimanî yên Çend Welatan.....	45
2.1.4.1. Îspanya.....	46
2.1.4.2. Îsraîl.....	47
2.1.4.3. Qraliyeta Yekbûyî.....	48
2.1.4.4. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê.....	48

2.1.4.5. Çîn.....	49
2.1.4.6. Almany.....	50
2.2. LI TIRKIYEYÊ POLÎTIKAYÊN PERWERDEHIYÊ.....	51

BEŞA SÊYEMÎN

NÛVEYÊN LÊKOLÎNÊ

3. NÛVEYÊN LÊKOLÎNÊ.....	54
3.1. Pirsgirêkên Xwendekaran ên Hunerên Zimên.....	56
3.2. Pirsgirêkên Xwendekaran Ên Ragihandinê.....	64
3.3. Pirsgirêkên Xwendekaran Ên Hevkirina Dibistan û Polê.....	69
3.4. Fikr û Tecrubeyên Mamosteyan.....	75
3.5. NÎQAŞEK GIŞTÎ DER BARÊ NÛVEYAN DE.....	81
ENCAM.....	85
ÇAVKANÎ.....	87

PÊVEK

Pêvek I: Forma Hevdîtînê

Pêvek II: Lîsteya Gotûbêjkeran

DESPÊK

Mirov hest û fikrên xwe bi riya zimên parve dikin. Ziman çawa ku ji dengên cuda pêk tê, dibe ku ji nîşan û tevgerên cuda jî pêk were. Di avabûna zimên de hinek pîvan hewce dike. Di cihana me yî îro de hezar zimanên ku mirovan bi pêş xistiye hene. Ji van hin zimanan jiyana xwe dewam dike lê mixabin hin ji wan zimanên mirî ne. Yê ku zimanan dide jiyandin, diafirîne û diparêze gel in (Guleryuz, 2004: 3). Mirov ji zayina xwe heta mirina xwe di nav pêvajoya hînbûn, fêhmîkirin û şîrovekirinê de xwe temam dike. Di vê astê de divê bandora perwerdehiya zimanê zikmakî ya li ser serkeftina zîhnî meyê jibîrkirin. Pergala ku nizane çi, ji bo çi hîn dikin û li gor vêya plansaziyekê çê nakin, ne mumkin e ku serkeftî bibe (Sînan, 2006: 75-78).

Ziman ji bo têkiliya bi malbat, derdor û civakê re ciheke giranbûha digire. Ev têkilî û pêşketina mirovan bi zimên tenê jî ne pêkan e. Perwerdehî jî ji bo vê têkiliyê û ji bo pêşketina mirovan girîng e. Ziman, qasî ku bandora xwe her aliyên mirovan dike, civaka ku mirov tê de dijî û heta welat û cihanê jî dike. Însan zindiyêke civakî ye. Bi serê xwe nikare bijî, di malbatekê an jî di civatekê de dijî. Loma ye ku zimanê ku bi kar tîne, wî kesî bi derdorê re dike nava têkiliyê (Güneş, 2014: 22).

Zimanê ku mirov ji bo îfadekirina hest, fikir û daxwaza xwe bikar tîne, cara ewilî ji dê û bavê xwe û paşê jî ji der dora xwe hîn dibe. Qasî ku derdor berfireh bibe û pêş bikeve, zimanê mirov jî pêş dikeve. Heger ev derdora ku berfireh dibe zimanekî din bipeyive, kes vî zimanî jî hîn dibe û dê zimanê duwemîn jî hîn bibe. Gelek civak di vê cihana global de dikevin nav civakên din û hînî zimanê din bûne. Hetta jê wêdetir hejmara kesên pirziman roj bi roj zêdetir bûye (Tulu, 2009: 1).

Li ser rûyê cihanê ji welatên yekziman pirtir, civak û welatên pirziman hene. Ango di roja me de ya asayî ne yekzimanî, pirzimanî ye. Rewşa pirzimanîyê ya welatên pirziman ên wek Kanada, DYA, Îsvîçre, Belçîka, Luksemburg, Finlandiya, Hîndîstan, Pakîstan û Sîngapur ji hev cudatir in. Statuya zimanan a li welatên pirziman li gorî pêkerên siyasî diyar dibe (Ozdogru û Dilman, 2014: 6-7). Pirzimanî li Tirkiyeyê jî bi awayekî dewlemend heye û gelek ziman li ser axa Tirkiyeyê kêman zêde tê bikaranîn. Li gorî lêkolîna ku Konda (2006) bi 48 hezar mirovan kiriye li

Tirkiyeyê rêjaya zimanê zikmakî yê gelan wisa ye: tirkî % 84.5, kurdî (kurmancî-zazakî) % 12.98, erebî % 1.38, zimanên din ên tirkî % 0.28, zimanên balkanî % 0.23, lazî % 0.12, çerkezî % 0.11, kafkasî % 0.07, ermenîkî % 0.07, rûmî % 0.06, zimanên avrûpî % 0.03, îbranî % 0.01 û yê din % 0.12.

Bi perwerdehiyê tiştên wek hînkirina xwendin-nivîsandinê, têkirina xwe îfadekirinê û hînkirina pîvanên zimên bûye armanc. Mirov bi saya perwerdehiyê gelek derfet û serkeftinên girîng bi dest xistiye. Perwerdehiyeke baş, standart jiyanê bilindtir û behreyên mirov ên ku bûyer û rastiniyê jiyanê baş rave dike, mikûntir dike. Perwerdehiyeke baş, rastiniya navbera bûyeran, dîtina têkilî û girêdan û rêgezan bi dest dixe (Jiyan, 2015: 46). Ji bo ku perwerdehiya tê kirin ji monologê wêdetir here, divê zimanê mamoste û xwendekaran yek be. Ev jî ancax bi perwerdehiya zimanê zikmakî pêkan e. Lê wekî tê zanîn, ji van zimana tenê tirkî zimanê perwerdeyê yê fermî ye.

Li Tirkiyeyê her sal bi milyonan zarok dest bi dibistana serhatî dikin. Ji van zarokan bi sed hezaran zimanê wan î zikmakî û yekemin cuda ne û piraniya wan jî kurdin. Lê ev zarok bi zimanê xwe yî duwemîn ango bi zimanê tirkî tevî pergala perwerdehiyê dibin. Wexta ku ev zarok dest bi perwerdehiyê dikin ne zimanê xwe baş dizanin û ne jî zimanê ku perwerdehî pê çê dibe baş dizanin. Ev zarok di dibistanên yek ziman de rastî probleman sereke yê weke xwendin-nivîsandin, têgihiştin û têkiliya navbera zarok-heval, zarok-mamoste û zarok-malbatê dibin. Her wiha ev pirsgrêk xwe di têkiliya navbera mirovan de jî dide der. Çunkî li gor Gozukuçuk (2014) ji bo ku têkilî xurt bibe divê zimanê axêver û guhdarvanan yek be. Lê ji ber ku di perwerdehiyê ya li Tirkiyeyê tenê tirkî tê bikaranîn, zarokên duziman derveyê vê tekiliyê dimînin û gelek caran bêdeng dimînin.

Weke ku pedagok Jim Cummins (2001b) piştrast dike, têkiliyeke xurt di navbera zimanê yekemîn û duwemîn de heye. Cummins dide zanîn ku têkiliyeke xurt di navbera zimanê zikmakî û zimanê duwemîn de heye û balê dîkşîne ser girîngiya zimanê zikmakî yê li ser hînbûna zimanê duwemîn û dibêje “zarokên ku zimanê xwe baş dizanin di zimanên din de jî serkeftî dibin. Lê heger li hember zimanê yekemîn helwesteke ne baş hebe, ev zarok di zimanên din de jî qels dimînin. Ev zarok ji ber ku zimanê ku pê perwerde dibîne baş nizane, dereng dest bi xwendinê dikin û dest bi

xwendinê bikin jî fêhm nakin” (2001b: 15-20). Li gorî Cummins(2001a) zarokên ku di zimanê xwe yî zikmakî de têr û tije ne, di zimanên din de jî serkeftî dibin û ev bandora xwe li ser serkeftinên din ên akademîk dike. Lê belê ev zarokên duziman bêyî ku zimanê xwe hîn bibin rastî zimanekî din tên û ev rasthatin jî gelek probleman bi xwe re tîne.

Li gorî pisporên wek Baker, Achmet, Herman zarokên ku bi zimanê xwe yî zikmakî bingeheke baş ava nekiribin, bi perwerdehiya zimanê duwemîn dibin nîvziman (Vgh, Tulu, 2009: 71). Ji van pisporan Baker (2001) dibêje ku zarokên zimanê wan î yekem di dibistanê de nayê nasîn û bi zimanê duwemîn perwerde dibînin, dibin nîvziman û di her du zimanan de jî qels dimînin û dibe ku nikaribin xwe îfade bikin, an go dibin nîvziman û di her du zimanan de jî nikarin xwe baş îfade bikin. Her weha Baker dibêje zarokên zimanê wan î yekem li dibistanê bêqedr e xwe kêmkî hevalên xwe dibînin û ev bandoreke mezin li ser derûniya wan dike. Sedema vê yekê jî perwerdeya yekzimanî ye ku ne zimanê zarokan î yekemîn e û bi xwe re gelek pirsgrêkan tîne. Mînak zarok li dibistanê, di danûstandinên bi hevalên xwe re rastî gelek pirsgrêkên têkilî û zimanî tên.

Ji aliyê din ve, weke ku Kaya û Aydın jî dibêjin, ger zarok bi zimanê xwe yî zikmakî yan jî bi zimanekî ku xwe baş îfade dike perwerdehiyê nebîne, dikeve nav nîqaşeke nasnameyî û entegreyî wî zimanî nabe (2014: 56). Ev jî rê li ber pirsgrêkên lihevkirina zarok a dibistanê vedike. Zarok xwe aîdî dibistanê hîs nake û li gor pîvanên dibistanê tevnagere.

Mijara Lêkolînê

Mijara vê lêkolînê tespîtkirina pirsgrêkên zarokên duziman ên kurd di dibistanên yekziman de perwerde dibin e. Zarokên ku di dibistana seretayî de diçin pola yekemîn bûye mijara lêkolînê. Dê li ser pirsgrêkên van zarokan ên wek xwendin-nivîsandin, fêhmkirin, hevkirina pol û dibistanê û têkiliya navbera zarok-zarok û zarok-mamosteyan bê rawestan.

Armanc û Girîngîya Lêkolînê

Armanca vê lêkolînê tespîtkirina pîrsgirêkên ku me li jor rêz kirin û nêrînên mamosteyan ên der barê van pîrsgirêkan de ye. Bi tespîtkirina van pîrsgirêkan û çavdêrî, pêşniyazên mamosteyan ên ji bo van zarokan jî hatiye armanckirin. Her wiha li Tirkiyeyê ligel ku ev pîrsgirêkeke li ber çavan e jî, li ser vê mijarê kêr xebat hatine kirin. Loma ye ku yek ji armancên vê xebatê jî, zêdekirina xebat û lêkolînên li ser duzimaniyê ye. Her wiha kesên ku li ser ziman, zimanê zikmakî, duzimanî û perwerdehiyê bixebitin, dê sûdê ji vê xebatê wergirin.

Çarçove û Sînorên Lêkolînê

Mijar bi pîrsgirêkên zarokên ku diçin pola yekemîn hatiye sînor kirin. Ji bo vê lêkolînê bi 24 mamosteyên pola yekemîn ku li Dêrika navçeya Mêrdînê dixebitin mulakat hat kirin. Forma mulakatê ji pênc beşan û ji 18 pîrsan pêk tê. Ji bo mulaketê, pîranî mamosteyên ku li gund dixebitin hat bijartin çunkî li gundan duzimanî hîn aktîf û zarok bi zimanê xwe dipeyivin. Ji van mamosteyan 12 jê jin û 12 jê mêr in. Her wiha ji zimanê zikmakî yê van mamosteyan 12 jê kurdî, 11 jê tirkî û yek jî jê erebî ye.

Rêbaza Lêkolînê

Ji bo vê lêkolînê du rêbaz hatine bikaranîn. Rêbaza yekem a vê lêkolînê analîza dokuman û çavkaniyên zanistî yên li ser mijarê ye. Çavkaniyên li ser zimên û duzimaniyê hatine lêkolînkirin, analîzkirin û wek referans hatine danîn. Ango ji bo lêkolîna ku bê kirin rêbaza teorik hatiye danîn.

Rêbaza din a lêkolînê jî xebata lêkolîna kalîtatîf e. Ji bo vê xebata sehayî da bi mamosteyan re bê kirin formeke mulakatê hatiye amadekirin. Armanca bijartina mulakatê jî ev e ku mamoste rasterast rastî pîrsgirêkên xwendekarên duziman tînin û jixwe mamoste hêmaneke girîng ya pêvajoya perwerdehiyê ne. Di vê mulakatê de pîrsên di der heqê serkeftina xwendekaran a xwendin û nivîsandin, guhdarkirin, fêhmkirinê û têkiliya xwendekaran a bi mamosteyan re û lihevkarîna xwendekaran bi pol û dibistanê re hatiye amadekirin. Di beşa dawî ya formê de fikrên mamosteyan a di der heqê duzimanî û perwerdehiya duzimaniyê de hatiye xwestin. Ev form li pisporan daye xwendin, kontrolkirin û halê xwe yî dawî girtiye.

Ev mulakat bi mamosteyan re wek sohbetekê hatiye kirin û deng hatiye qeydkirin. Ji bo her mamosteyê ku hevdîtin pê re hatiye kirin qod hatiye dayîn. Ev qod li gor zayend, rêza hevdîtinê û zimanê zikmakî yê mamosteyan hatiye dayîn. Di qodan de K kurdî, T tirkî, M mêr û J jî ji bo jinan hatiye dayîn. Wek mînak di K23DJyê de; K kurdî, 23 rêza hevdîtinê û J jî jin e. Piştî qeydkirinê deşîfrasyona van dangan bi awayekî cidî hatiye kirin û ev form bi vî awayî hatiye dagirtin. Dû re bersivên heman pirsan a mamosteyan tevan hatiye dabeşandin. Ji bo nirxandin û analîza daneyên lêkolînê rêbaza tasvîrê hatiye bikaranîn. Li gor tespîten ku hatine kirin, bersivên mamosteyan hatiye tasvîrkirin.

Pirsgirêk û Astengiyên Lêkolînê

Di pêvajoya vê lêkolînê de em rastî pirsgirêk û astengî li jêr hatiye rêzkirin hatin:

- Ji ber nezanîna zimanekî biyanî, çavkanî piranî ji tirkî hat wergirtin û fikr û ramanên kesên biyanî jî ji çavkaniyên tirkî hat veguhestin.
- Ji ber mamosteyên ku zimanê wan î zikmakî cuda ne û mamosteyên ku xwe nikarîbûn kurdî baş îfade bikin forma hevdîtinê tirkî hat amadekirin.
- Ji ber pêvajoyê mamoste fikr û çavdêriyên bi zelalî nedianîn zimên.
- Ji ber ku gihiştina hin gotar an nivîsan dijwar bû, ji bo lêkolînê li hin cihan veguhestin ji veguhestinê hat bikaranîn.

Helbet ev astengî bandor li ser lêkolînê kir. Mamoste ji ber rewşa siyasî ya welêt, fikrên xwe eşkere nedikirin. Her wiha hin mamoste ji ber fikrên xwe yî siyasî, bi awayekî alîgir pirsan dibersivandin. Her wiha gelek mamoste ji mijara duzimanîyê bêhay bûn loma ye ku pirs zû biz û nedihat fêhm kirin.

Li gorî lêkolîna ku Konda (2006) kiriye li tirkîyeyê kêr zêde 12 milyon kurd hene. Li gorî lêkolîna ku ji aliyê nivîskarên pirtûka "Kurd Çi Dixwazin" wek Mesûd Yegen, Ulaş Tol, M. Ali Çalışkan hatiye kirin ji sedî 90ê kurdan kurdî wek zimanê xwe yê zikmakî dibînin. Ji %75ê kurdan li mala xwe kurdî dipeyivin û ji %55ê zarokên kurd bi zimanê xwe yê zikmakî xebat didin (Yegen, Tol û Çalışkan, 2016: 85).

Komara Tirkîyeyê ku 1923an ava bûye ber bi avakirina modeleke netewewê dewletê ve çûye. Rejîma ku nû ava bûye ji bo rawekirina xwe ketiye lêgerîna neteweyekê. Qesta vê neteweyê tirk e (Aydın, 1995, Vgh. Sürmeli, 2015: 92). Ji wê rojê ve bilindkirina neteweya tirk bi awayekî tund û bi teoriyên wek ziman û dîrokê dewam kiriye. Ev tundî heta salên 80yê jî bi polîtîkayên cûrbûrê dewam kiriye.

Piştî darbeya eskerî ya 1980ê polîtîkayên dewletê yê zimên tundtir bûye û bi têgeha zimanên qedexekirî zimanên ji xeynî tirkî bi riya zagonan cara ewilî hatiye qedexekirin. Di vîya de hedefa ewil jî çand û zimanê kurdî ye (Sürmeli, 2015: 96). Ev zextên li ser zimên bandora xwe li polîtîkayên perwerdehiyê jî kiriye. Armanca û hedefên perwerdehiyê xeta xwe şaş kiriye û tenê li gor zimanekî hatiye saz kirin.

Lê di maddeya 42an a makezagona Tirkîyeyê de hatiye diyarkirin ku ji xeynî tirkî ji ti kesên din re bi zimanekî din perwerdehî nayê kirin. Lê di vê madeyê de îstîsneyek heye ku kêmarên gayrîmuslîm dikarin bi zimanên xwe perwerdehiyê bikin (Sîncar, 2015: 5).

Bi taybetî jî welatên ku pîrzimanî, pîrçandiyê qebûl dikin wek modeleke civakî qebûl dikin û vîya wek modeleke pêş dixin ligel zimanê dewletê zimanê zikmakî jî kirine zimanê perwerdehiyê û kirine politikaya xwe. Modelên welatên wek Almanya, Çîn, Afrîkaya Başûr, Bolîvyaya, Îsvîçre, Hollanda, ABD, Fransa, Kanada, Belçîka, Hindîstan, Britanya û Îspanya mînakên duzimanî ne (Eğitim-Sen, 2010).

Em ê bi vê lêkolînê pêşî ziman û cureyên zimanan ên wek duzimanî, zimanê zikmakî, nîvzimanî, zimanê yekemîn, zimanê duwemîn û zimanê biyanî pênase bikin. Dû re jî em ê girîngiya zimên, zimanê zikmakî, duzimanî û perwerdehiya zimanê zikmakî û perwerdehiya duzimanî bi awayekî berfireh li gor fikrên zimanzan

û pedagokan binirxînin. Her wiha em ê bi vê lêkolînê rewşa zimanan a li Tirkîyeyê û polîtîkayên perwerdehiyê yên Tirkîyeyê binirxînin. Her wiha em ê qala modelên perwerdehiya duzimanî yên sereke û çend welatên ku perwerdehiya duzimanî pêk tînin bikin.



BEŞA YEKEMÎN

ZIMAN

Ziman têgeheke girîng û her wiha ew qas jî berfireh e. Di vê jiyana global ya ku gelek ziman û çand êdî ketine nav hev du û bi hev re jiyana dîkin de ziman jî ciheke giranbuha digire. Ligel girîngiya zimên êdî bi sed milyon kes hene ku ne tenê zimanekî, bi sedemên cur bi cur gelek zimanan bi kar tînin. Helbet ev zimanên ku mirov bi kar tînin her yek ji wan xwedî taybetmendiyeke û jêdereke ye û dîsa ji van her yek bandoreke cuda li ser pêşketina zimanî û jiyana mirovan dike.

Em ê jî di vê beşê de zimên, li gor çarçoveya mijara xwe bidin nasîn. Em ê di vê çarçoveyê de girîngiya zimên a ji bo mirovan bi taybetî jî girîngiya zimên ya ji bo zarokan vebêjin. Li gel ziman û girîngiya zimên em ê qala çend têgehên sereke yên zimên yên wek zimanê zikmakî, zimanê duwemîn, zimanê biyanî, duzimanî, duzimaniya kesî, duzimaniya civakî û hwd. jî bikin.

2.1. ZIMAN ÇI YE?

Ji roja ku dinya ava bûye mirovên dinyayê hewcedarî têkilî bi hev re dîne dîtine. Ev zindî bi hezaran sal in bi dengên têkilî bi hev du re danîne. Ev ji denge xwezayî dest pê dike û heta niha jî bi zimanên ku ji hezaran peyv û gotinan pêk hatî dewam dike.

Mirovan her tim pêdivî bi parvekirinê dîtine. Ev carinan ji bo danê û carinan jî ji bo stendinê pêk hatiye. Ji bo fikirînê ziman hewce dike, tiştê an hêmanek ku fikrên mirovan îfade bike tune be fikir jî der nayê û nayê parvekirin (Vendrises, 2001: 27).

“Ziman, saziyeke civakî ya ku mirovan li gor pêdiviyên xwe ava kiriye û pêş xistiye ye.” Vendries (2001: 14). Her ziman xwedî pîvanên cuda, dengên cuda û gotin û biwêjên cuda ne çunkî her ziman li çandeke cuda, li erdnîgariyeke cuda û ji

nav bîr û baweriyên cuda derketiye holê. Ev cudahî encameke wisa derxistiye ku xwe li gor şert û mercên xwe û pîvanên xwe jiyan bike.

Aksan jî zimên bi awayî pêname dike: “Saziyêke ku mirov û civakan ava dike û avakê zanist û teknîkê ye. Ziman tune be em ê çawa bîranîneke xwe yî hêja an jî bûyereke fîzîk an kîmyayê vebêjin? Me yê evan çawa ji siberojan veguhezanda?” (2015: 11).

Crystal jî dide zanîn ku ziman ne tenê ew dengên ku em bi kar tînin an jî dibihîzin e. Ziman, nişana nasnameyê, dîroka embarê, pêdiviyêke curbicuriya mirovahiyê û perçeyek ji mirovahiyê ye (2013: 47-81). Ev gelên cihana global ku her roj nêzîkî hev dibin ancax bi zimên ji hev cuda dibin û nasnameya xwe nişan didin. Her wiha çîrokên gelan bi zimanî wan tê vegotin û ji nîfşên din re tê veguhestin. Cudahiya çand û zimên taybetmendiya herî girîng a ku neteweyan ji hev vediqetîne ye (Aydın û Kaya, 2014: 14).

Çand, nirx, huner û zanînen civakê bi riya zimên tê veguhestin. Têkiliya çand û zimên bi vî awayî tê pênamekirin: Ziman ji kesan re, wek perçeyêke çandê tê ragihandin û ev çanda ku em qal dikin jî dîsa bi zimên tê veguhestin. Mirov bi zimanê neteweya xwe dibin heybereke çandî. Têkiliya ziman û çanda neteweyekî hingî xurt e, mirov dikare bi lêkolînkirina zimanekî di der heqê bîr û bawerî, jiyan û kevneşopiyên neteweyan de agahiyê hêja bigire. Ziman, di avabûn û pêşketina çanda neteweyekî hêmana herî bingehîn e (Egitim- Sen, 2004: 6).

Li welatên netewperest ji bo rê li ber zimanên din bigirin gelek riyên cuda tê bikaranîn. Yek ji wan riyên ku herî balkêş jî çîroka babiliyan e. Li gor vê çîrokê xweda ji bo ku mirovan ceza bike gelek zimanên cuda afirandiye û tevlîhevî kiriye nava mirovan. Lê divê neyê jibîrkirin ku pêdiviya mirovan curbicuriyê heye. Her zimanek çandekê temsil dike û ev jî dewlemendiya xweza û mirovan e (Crystal, 2013: 41-42).

Ziman ji xeynî amûreke ragihandinê gelek tiştî îfade dike. Her ziman temsîla dîrok û civaka axîverên wî zimanî ye. Gotina pêşyan a “Zimanek mirovek, du ziman du mirov.” dewlemendiya ku li mirovan bar dike pir xweş îfade dike. Mirov çi qas

pir ziman zanibe asoya wan jî ew qas fireh û xweş dibe (Egitim-Sen, 2010a: 5). Her wiha gotineke pêşiyar a galan jî giringiya zimên bi gotina “Neteweyekî bê ziman, bê dil e.” xweş dike.

Rastiya herî bingeîn ya zimên jî fêhmkirin û îfadekirina însanan ya zimanên ku nedîtine ye. Ziman bêsînor e, mirov gelek îfadeyên zimanî diafirîne û bi kar tîne. Ev jî ji afirîneriya zimên tê (Chomsky, 2012: 12). Axaftin hunerek e. Mirov bi fikrên xwe bi dengên ku pê dizanin dixemilînin û bi awayekî ahengxweş tînin ziman. Ev jî ji xweşiya zimên tê.

Li gorî hin zimannas û lêkolîneran li ser rûyê dinyayê kêmkirî 6000 ziman hene ku li gelek welatên cihanê tê bikaranîn (Crystal, 2015: 27-28). Mixabin hejmara deng û zimanên li cihanê zêdetir in lê belê ji ber gelek sedemên cuda hejmarên zimanên cihanê bi texmînî wek 6000 tê dayîn.

2.1.1. Zimanê Zikmakî

Zimanê zikmakî ji aliyê gelek zanyar, zimanzan û rewşenbîran ve bi awayên cur bi cur hatiye pênasekirin. Bê guman pîrbûna pênaseyan giringiya zimanê zikmakî nîşan dide. Her wiha giringiyeke din a nêrînên zimanê zikmakî jî bandora zimanê zikmakî ya ku li ser mirovan dihêle ye.

Zimanê zikmakî ew ziman e ku zarok ji malbat, dê, derdor û civaka xwe yî çandî bêtîr hînkirin ango bi awayekî xwezayî û jixweber hîn dibe ye. Zimanê zikmakî, qasî mirovan xwezayî ye û di jiyana mirovan de ciheke xwe yî girîng heye. Hînbûna zimanê zikmakî piştî zayînê dest pê dike û di salên pitiktî û zaroktî êdî awaya xwe digire (Egitim-Sen, 2010a: 8).

Li gorî Oruç zimanê zikmakî, ew zimanê ewil ku ji dê, malbat, civaka xwe ku tê de dijî, di demên ewilî ên zayînê, di wextê zaroktî de, ragihandina ewilî ku pê tê kirin, ya ku herî baş pê dipeyive, bê hînkirin û hînbûn pê zane ye (2016: 281). Ji vê penaseyê diyar dibe ku zimanê zikmakî di civakê de bi awayekî xwezayî tê hînbûn.

Alpay jî zimanê bi vî awayî pênase dike. “Zimanê zikmakî yê zarokekî zimanê ewil e ku li derdora ji dayik bûye hîn bûye ye. Ji xeynî zarokên bê dê mezin

bûne hemû zarok vî zimanî ji dayika xwe hîn dibe. Pêvajoya hînbûna zimanê zikmakî heta temenekî diyar an jî heta ku bi destpêkirina dibistanê temam dibe.” (2010: 85).

Wek ku em dibînin pênasayên cur bi cur ji bo zimanê zikmakî hatine kirin. Baker jî vê curbicuriyê daye ber çavan û pênaseya zimanê zikmakî bi van gotinan rêz kiriye (2011: 283):

- Zimanê ku ji dayikê hîn dibe,
- Zimanê ewil ku mirov hîn dibe,
- Zimanê herî xurt ê di wextekî jiyanê de,
- Zimanê ku mirov herî zêde bi kar tîne,
- Zimanê ku mirov herî pir jê hez dike.

Her mirov bi zimanê ku hîn bûye difikire û sêwiran diafirînin. Loma zimanê zikmakî ew wateya ji pêşerojê heta paşerojê mirovan e. Afirineriya a niha bi rastiyên pêşerojê pêkan dibe. Dîvê têkiliya zimanê zikmakî a bi hefizeya civakî û kesî re ber çav bê girtin. Hişmendiya zimanê zikmakî ji ber ku yê ku ji civakê hatiye dûrxistin nêzîk dike û ya welidandî dîsa diafirîne girîng e (Egitim- Sen, 2004: 14).

Girîngiya Zimanê Zikmakî di Jiyana Zarokan de

Zarok bi zimanê xwe yî zikmakî dê, bav, malbat û derdora xwe nas dike. Hezkirina diya xwe, henekên bavê xwe û lîstikên bi hevalên xwe dilîze bi zimanê xwe zikmakî hîs dike û nas dike. Loma ye ku gelek tiştên ku bi zimanê zikmakî ya zarokan pêk nayê ji zarokan re wek tişteke biyanî tê û dibe ku zarok jê dûr bikeve.

Zimanê zikmakî ji xeynî amûreke îfadekirina daxwaz, hest û fikran, wî dike endamekî civaka ku tê de cih digire û wî dike xwedî kesayet. Têkiliya zarokê ku endamê civakê ye bi zimanê zikmakî çê dibe. Bi zimanê zikmakî hestê aîtbûna civakê ji zarok re çê dike. Zarok ewilî bi zimanê xwe yî zikmakî li cihanê dinêre û feza bi zimanê zikmakî bi cih dibe, her fikrên xwe yî di der heqê jiyanê de bi zimanê xwe yî zikmakî tîne zimên (Aksan, 2015: 51).

Sîncar jî girîngiya zimanê zikmakî bi van gotinan rêz dike. “Mirov qasî zimanê xwe bi kar tîne bi jiyanê re ye, dilşad dibe, digihêje ekla jiyanê, bi mirovan re dikeve têkiliyê û dibe xwedî heval çunkî di bingeha her tiştî de zimanê zikmakî heye. Lê zimanê ku ji malbata xwe hîn dibe çi qas bes e, peyv û gotinên zimanê xwe çi qas bi kar tîne? Hemû agahî û zanînên ku ji derdrora xwe hîn dibe perwerdehiya mirov pêk tîne. Dîsa di serî de ji diya xwe tiştên ji derdrora xwe hîn dibe bi zimanê zikmakî dibe.” (2015: 5).

Li gorî lêkolînên hatî kirin bandora zimanê zikmakî li ser pêşketina zarokan gelek heye û zimanê zikmakî li ser hînbûna zarokan roleke mezin dilîze. Ji van rolan yek jî di hînbûna zimanê duwemîn de rola zimanê zikmakî ye. Ango zimanê zikmakî hînbûna zimanê duwemîn hêsantir dike.

Li gorî Cummîns zarokên ku di zimanê xwe yî zikmakî de gihiştibe asteke têr û tije ev yek bandora xwe xwedevaniya zimanê duwemîn jî dike. Ev zarok zimanê xwe yî zikmakî li malê çiqasî baştir û dewlemendtir bike, bi awayekî amade dest bi dibistanê dike. Zarok zanebûna xwe yî zimanê zikmakî vediguhezîne zimanê duwemîn. Wexta ku em li vir lê dinêrin ev ziman pêwendiyên wan bi hev re hene (2001b: 15-20).

Gelek bandora zimanê zikmakî li ser zarokan hene. Ji aliyê xwendevaniyê, ragihandinê, psikolojik, zîhnî û hwd. Ji ber ku em ê van bandoran û girîngiya zimanê zikmakî di beşa sêyem de bi awayekî berfirew vebêjin, a niha me tenê bi kurtasî çend tişt anî zimên.

2.1.2. Zimanê Duwemîn

Li ser zimanê duwemîn pênaseyek ku li ser hatiye lihevkerin tune ye. Gelek kesan zimanê duwemîn bi awayekî cuda pênase kiriye. Ev guherîn li gorî şerdên kesên ku ziman hîn dibe pêk tê.

Li gorî Klein (1984) zimanê duwemîn piştî zimanê zikmakî an jî bi zimanê zikmakî re tê bikaranîn û ew zimanê ku di derdora ku mirov tê de dijî bi kar tîne ye (Vgh. Oruç, 2016: 282-284). Li gorî Baker(2011) jî zimanê duwemîn bi awayekî kronolojik zimanê duwemîn, zimanê hîn lawaz, zimanê ku ne zimanê zikmakî ye,

zimanê ku kê m tê bikaranîn e. Ev têgeh carinan ji bo zimanê sisêyan jî tê bikaranîn û carinan jî ji bo zimanê wî kesê ku li welatê wî jî te bikaranîn (Baker, 2011: 298).

Wek ku em ji pê naseyan jî dibînin li ser zimanê duwemîn nêzîkatiyên cuda hene. Carinan zimanê ku zimanê ku mirov kê m pê dizane ye, carinan zimanê zikmakî yê mirovan e û carinan jî ew zimanê ku mirov dû re pê hîn bûye ye. Nêzîkatiyên cuda yê duzimaniyê, girîngiya vê têgehê bi me dide nîşandan.

2.1.3. Zimanê Biyanî

Ew zimanê ku piştî zimanê zikmakî an jî zimanê yekem e, wek zimanê duwemîn jî tê bikaranîn. Lê belê her zimanê duwemîn jî wek zimanê biyanî jî nayê qebûl kirin. Li gorî Klein (1984), zimanê biyanî ew zimanê ku li derveyî wî welatê ku ew ziman lê tê axaftin û ji bo têkiliyên rojane nayê bikaranîn e (Vgh. Oruç, 2016: 287-288).

Alpay pê naseya zimanê biyanî bi awayekî cuda rave dike: Her zimanê ku ji xeynî zimanê zikmakî ê mirovî zimanê biyanî ye. Heger hûn laz bin û zimanê we yî zikmakî lazî be nexwe tirkî zimanê we yî biyanî ye. Heger zimanê we yî zikmakî kurdî be, tirkî zimanê we yî biyanî ye... (2010a: 86).

Li Tirkiyeyê bi dehan kê mnetewe hene ku zimanê wan î zikmakî ne tirkî ye. Lê neteweya ew kesên ku li Tirkiyeyê dijîn her çî be jî, neçar in ku tirkî hîn bibin û bi kar bînin. Li saziyên fermî, têkiliya derve ya mirovan pîranî bi vî zimanê hevpar angî bi tirkî çê dibe. Li gor van şert û mercan, em ê di vê xebata xwe de tirkî, wek zimanê duwemîn ê kesên netewe cuda bihesibînin. Angî em ê tirkî ji gelên din ên tirkiyeyê re wek zimanekî biyanî qebûl nekin.

2.2. DUZIMANÎ ÇI YE?

Ti welatên cihanê li ser axên ku tenê zimanek tê de tê bikaranîn ava nebûye. Ji aliyê zimanî ve welatên herî xîzan Îzlanda û Antartîka ye lê vir jî gelek zimanên cuda hene. Li aliyê din welatên wek Çîn, Hîndîstan, Endoneyza, welatê Amerîkaya Latîn, Rûsya û hemû welatên Afrîkayê ji gelek zimanan re malxweyiyê dike. Ev

ziman ne tene di jiyana rojane de tê bikaranîn, di karên fermî û têkiliya navbera komên cuda jî tê bikaranîn (Derince, 2012: 10).

Li cihanê 6000 ziman hene û ev 6000 ziman li 200 welatên cihanê tê bikaranîn. Ev jî tê wateya ku dinya ne ji yek zimanani ji pir zimanan pêk tê. Di van hinek welatan de 100 ziman tên axaftin. Ew kesên ku li hember vê pirzimanîyê yekzimanîyê diparêzin, mensûbê neteweyên yekziman in û ev kes di wê bawerîyê de ne ku dê rojekê her kes bi zimanê wî bipeyive. Duziamanî mimkun e. Mirov dikare zimanekî ji bo nasnameya xwe û zimanê din jî ji bo hevkirana bi mirovan re bi kar bîne (Egitim-Sen, 2010: 12-13).

Projeya netewe-dewletan ku ji 200 salî zêdetir e ku bûye bingeha sîstema polîtîk-îdarî ya cihanê sedemeke bingeîn a duzimanîyê ye. Ligel ku di ti sînorên netewe-dewletan de tenê gelek, netewek, zimanek û çandek tune jî, li gelek dewletan tenê zimanek bûye zimanekê fermî û civak neçar mane ku ligel zimanê xwe yî zikmakî zimanê fermî jî hîn bibin. Rewşa gele kurd ji bo vê yekê mîna keke baş e (Çiçek, 2007:38).

Li gorî agahiyên wezareta karên derve ya Tirkiyeyê, li Tirkiyeyê 52 ziman û zarava tên axaftin (Alpay, 2010a: 83). Hebûna 52 zimanan a li Tirkiyeyê tê wateya 52 kêmar, netewe an jî komên cur bi cur. Ev komên cuda li her deverên jiyane bi hev re têkilî datînin. Li kar, li derve, li dibistanê û di danûstandinên aborî de. Bivê nevê mirov rastî ziman û çandên cur bi cur tên. Li gor vê rastîyê em dikarin bêjin gelek kesên li Tirkiyeyê duziman an jî pirziman in.

Li ser duzimanîyê heta niha pênasayek ku em bêjin teqez ev e nehatiye kirin. Gelek nivîskar, sosyolog an jî zimanzan li gor fikr û ramanên xwe pênasayên cuda kirine. Li gorî Skourto (2000) 68 pênasayên cuda yên duzimanîyê hene (Vgh. Tulu, 2009: 53). Li gorî Romane (1989) duzimanî ji peyva “Bilingualism”ê hatiye. “bi” bi latîni tê wateya du û “lingualism” jî tê wateya zimanzanîyê. Duzimanî piranî li gorî kategoriyên cuda yên wek têrbûn û hêmanên cuda, îdeal û birêûpêk tê pênasekirin (Vgh. Tulu, 2009: 53).

Duzimanî di pênaseya xwe yî kevn de ji bo her du zimanan jî zanebûneke wekhev digotin lê di pênaseya ku em dikin de kesên ku di du zimanan de di astên cuda jî de bin duziman in. Pênaseya herî berfireh jî xwe îfadekirina kesekî bi awayekî ya bi zimanê duwemîn e. Li vê derê ji xeynî hînbûna gramerê, xwe îfadekirina kesekî ya bi devkî û nivîskî ye (Ayan û Koçbaş, 2009: 14).

Li gorî Oruç jî duzimanî ew qebîliyeta her du zimanan jî qasî zimanê xwe yî zikmakî an jî nêzîkî wê zanebûn e. Bi awayekî din bikaranîna zimanê duwemîn ji aliyê kesekî li gel zimanê xwe yî yekemîn ango zimanê zikmakî ye. Ev di heman demê de, tê wateya kesek di her du zimanan de jî li her aliyê jiyanê bi heman astî de xwe îfade bike (2016: 285-287)

Baker jî duzimaniyê têgeheke berfireh dibîne û çarçoveya wê nişan dide. Têgeheke berfireh e ku mirov kesekî an kesekê wek duziman bi nav bike. Di naveroka vê çarçoveyê de gelek astên cuda yên huneran hene. Têkiliya duzimaniyê tenê bi besariya du zimanan tune ye. Têkiliya wê bi karanîna zimên jî heye. Hinek kes di her du zimanan de jî baş be jî dibe ku zimanekî bi kar nîne an jî kêr kar bîne. Ya din jî dibe ku zimanekî wî an wê kesî/ê baş pêş neketibe lê dîsa jî xweş dipeyive. Ev kes dibe ku li ber xwe keve û nepeyive lê dîsa jî ew kes duziman e (Baker, 2011: 20).

Wek ku em dibînin pênaseyeke hevpar li ser duzimaniyê tune ye. Ne tenê zimanzan an pedagok di heman demê de zimanzanên civakî jî pênaseyek ji bo duzimaniyê danîne. Li gorî Watson (1995) zimanzanên civakî duzimaniyê bikaranîna du zimanan ji aliyê xwendin-nivîsandin, axaftin û fêhmîkirinê bi qasî zimanê zikmakî qebûl dikin (Vgh. Yazıcı û İlter, 2008).

Mînak ew kesên ku li malê bi kesên malbatê re kurdî, li dibistanê bi mamoste û hevalên xwe re tirkî dipeyivin duziman an jî pir ziman tînin qebûlkirin (Ayan û Koçbaş, 2011: 11). Jixwe bivê nevê ji ber ku tirkî zimanê fermî yê dewletê ye û gelek qanalên tirkî di televîzyonan de hene, her zarokên kurd bi awayekî xwezayî dibin duziman. Ev duzimanî yan beriya ku zarok here dibistanê çê dibe û heger ne wisa be jî ev li dibistanê çê dibe.

Bandora Duzimaniyê ya li Ser Pêşketina Zarokan

Mezinkirina zarokan bi duzimaniyê biryareke girîng e. Ev biryar dê bandorê li jiyana zarok û malbatê bike. Duzimanî yan jî yekzimanî dê bandorê nasname, jiyana civakî, zewac, xwendevanî, fikirîn û ger û geşta zarokan bike. Duzimanî ji zanîna du zimanan wêdetir e. Gelek fêde û pir kêr dezavantajên duzimaniyê hene. Ev li jêr hatiye nîşandan:

-Fersenda têkiliya berfireh,

-Di du zimanan de xwendevanî,

-Hîn pir çandîbûn û bi kûrahî pirçandî,

-Hîn pir xweşbînî û kêr nîjadperestî,

-Zêdebûna rêzgirtina ji xwe,

-Fêydeyên fikirînê,

-Ji aliyê nasnameyê bawerî ji xwe re,

-Serkeftina Dersê,

-Di hînbûna zimanê sêyemîn de serkeftin,

-Feydeyên aborî (Baker, 2011: 33-34).

Di duzimaniyê de ji tiştên ku bala me dikişîne yek jê jî bandora xwendevaniyê ye. Ji aliyê gelek lêkolîneran hatiye piştrastkirin ku zarokên duziman ji aliyê serkeftina xwendin û nivîsandinê ve gelekî baş in. Ango kesên ku di duzimaniyê de baş in, di hunerên wek xwendin û nivîsandinê de jî baş û serkeftî ne.

Li gorî gelek kesên pispor ên wek Cummins, Swain, Diaz, Bialystok duzimanî bandoreke erênî li ziman û heşê zarokan dike. Zarokên duziman ji wateyên zimên re hîn hestiyar in û li gor zarokên yekziman di karên zimên de hîn baş in. Di lêkolînên, ku li ser zarokên du ziman ên temen cuda ku li ser çareserkirina probleman

hatine kirin de jî encameke baş derketiye holê û ji aliyê fêhmkirin, bersivdayîn û fikirînê jî baştir derketine (Ayan û Koçbaş, 2009: 14).

Di lêkolînên ku li ser zarokên duziman hatine kirin de ev encam derketine holê; zarokên duziman di hînbûna xwendin û nivîsandina zimanan de serkeftî dibin. Di heman demê de ev zarok zimanê ku tê axaftin jî ji gelek alî ve baştir hîn dibin (Yazıcı û İlter, 2008: 47-61). Ev jî tê vê maneyê ku zarokên duziman, zimanê yekemîn û duwemîn ji kesên yekziman xweştir û baştir hîn dibin. Ango kesekî duziman, zimanê xwe yî duwemîn, ji kesên ku zimanê wî yî zikmakî baştir hîn dibe.

Li gorî Blystok (2010) lêkolînên ku vê dawiyê hatine kirin, zarokên pirziman ji aliyê fêhmkirina zimanan ji zarokên yekziman baştir in. Di lêkolînekê de gelek qertên ku ji wêneyên cuda pêkhatî didin zarokan. Dixwazin ku ev zarok van qartan li gor hin pîvanan rêz bikin. Di encamê de zarokên yekziman û duziman wek hev bersivê didin. Lê belê wexta ku pîvan tîr guhertin, zarokên duziman serkeftîtir derdikevin (Vgh. Ayan û Koçbaş, 2011: 12).

Zarokên duziman ne tenê ji aliyê xwendin û nivîsandinê, ji aliyê têkiliya navbera mirovan ve jî xwedî avantajên mezin in. Ji ber ku êdî li her welatî gelek ziman û çandên cuda hene. Mirov carinan neçar dimîne ku hunerên xwe yî axaftinê bi kar bînin û bi wan kesên din re têkiliyeke xurt û baş dînin.

Li gorî Gumperz (1982) rola hunerên ragihandinê rastî guhertinê hatiye. Ji bo rêvebirina rewşên cuda û ahenga van rewşan ragihandin gelekî girîng bûye. Têkilî danîna we bi kesên ku hûn nas nakin êdî gelekî girîng û hewce ye. Ji bo ku em mafên xwe û rayeya xwe di destê xwe de bigirin pêwîst e ku em têkilî bi mirovan re dînin. Ji bo ku em karê xwe bimeşînin û kesên li hember xwe qanîh bikin hewce ye ku em têkiliyê bi mirovên din re dînin. Loma ye ku ev sermayeya zimên divê wek dewlemendiyekê bê dîtin (Vgh. Cengiz, 2006: 41).

Avantajêke din a duzimaniyê jî serkeftina kesên a ji aliyê zîhnî ye; (Vgh. Bican, 2017: 123) Xebata herî berfireh a di der heqê bandora duzimaniyê ya li ser hunerên zîhnî kiriye xebata Jim Cummins e. Cummins (1979) bi xebata xwe yî bi navê 'teoriya şemûgê' nêrîneke nû aniyê vê mijara ku bandora duzimaniyê ya li ser

hunerên zihnî. Heta salên 1970î jî duzimanî ji aliyê derdorên perwerdehiyê ve wek pirgrirêkekê hatiye dîtin. Lê Cummins bi vê xebata xwe serdemeke nû daye destpêkirin (Yagmur, 2007: 62).

Li gorî Jim Cummins, ji bo ku hunerên zihnî yên zarokan pêş bikeve û ji bo ku fêydê ji bandora duzimaniyê ya li ser hunerên zihnî bê stendin, hewce ye ku zarok ji aliyê zimên ve were astekê. Ev asta bingeîn wek şemûgê ye. Ji bo ku zarok rastî bandora neyînî ya duzimaniyê neyên divê zarok di her du zimanan de jî bê şemûga yekemîn. Ji bo ku ev şemûg baştir were fêhmîkirin em ê bi şibandina wêneyî ya ku Baker (2006) çêkiriye taûderzî bikin. Em xaniyek sê qat ku hunerên zihnî û zimanî tê de vehewiyaye bifikirin. Heger zarok ji aliyê hunerên zimên ve li qata yekê be, divê bê zanîn ku zarok hem ji aliyê zihnî hem jî ji aliyê zimanî xwedî gelek kêmasî ye. Ev zarok dê xwe nikaribe baş îfade bike û nikaribe karên ku bi hunerên zihnî bê kirin bike. Zarokên ku di vê astê de ne duzimaniyên qels in û li gor hevalê xwe yî yekziman di her du zimanan de jî pey hevalên xwe ne. Zarokên ku di qata duda de ne, wek ku gihaştibin şemûga yekem. Ango di zimanekî de gihaştina asta hevalên xwe lê di zimanên din de hîn nehatine ew asta ku tê xwestin. Ji bo ku bandora duzimaniyê li ser serkeftina hunerên zihnî çê bibe, divê zarok bîn qata sisêyan. Ango divê werin şemûga dudan. Zarokên ku di vê astê de ne dibin duzimaniya wekhev û bandoreke gelekî erênî û xurt li ser hunerên zarok ên zihnî dike (Kutlay, 2007: 63).

Avantaja zarok û kesên duziman yek jê jî naskirina çand û hunerên welat û neteweyên din e. Mirov bi derketina derveyî welat dikarin bi axaftina bi wan kesan re kevneşopî û awayê jiyîna wan gelan nas bikin. Ev naskirina çandên din fersenda nêrînên pir alî jî dide mirovan. Êdî ev mirov ne tenê li gor çand û jiyana civaka xwe, li gor çandên ku zane û nas kiriye difikire.

Her wiha Baker jî li ser vê avantajê duzimaniyê ya naskirina çand û hunerên cuda çend tişt gotiye. Li gorî wî duzimanî fersenda tecrubekirina cihanê dide zarokan û kesên din. Bi her zimanî tevgerên cuda, gotinên gelêrî, çîrok, dîrok, kevneşopî, silavdayîn, kevneşopiyên mirin û zewacê, wêjeyên cuda û hwd dikeve rojevê. Du ziman bi xwe re tecrubeyeke çandî û ji çandên din re xweşbînî bi xwe re tîne (2011: 32)

Hin pispor fêdeyên duzimaniyê bi vî awayî rawe dikin (Bîcan, 2017:122-123):

- Mejiyê kesên duziman pir aktif û esnek e, di navbera du zimanan de pir xweşik û hêsan veguhestinê dikin (Zelasko û Antunez, 2000).
- Têgehên matematîkê zûtir fêhm dikin û problemên peyvî rehetir dibersivînin (Zelasko û Antunez, 2000).
- Mantixên xwe pirtir bi kar tînin (Bialystok û Majumder, 2011).
- Zimanên din zûtir û baştir hîn dibin (Jessner, 2008).
- Li gorî di lêkolînên ku vê dawiyê hatine kirin de kesên duziman li gor kesên din derengtir bi nexweşiya Alzheimer dikevin (Dreifus, 2011).

Çawa ku duzimanî bandoreke baş li ser pêşketina zarok dike, çi qas kêm be jî dezavantajên duzimaniyê jî hene. Ji ber vî awayî mezinkirina zarokên du ziman ne ew qas hêsan e. Carinan dibe ku dê û bav ji bo pêşketina zarokên xwe têkevin nava fikaran.

Dezavantaja ewil ev e ku zarok di her du zimaman de jî ne têr be ango qels bimîne. Li gor vê rewşê zarok dê nikaribe di mûfredata dibistanê de serkeftî bibe. Dezavantaja dudan jî hassasiyeta duzimaniyê ye. Divê dê û bav bi sebr be û bi plansaziyeke baş zarokên xwe hînî du zimanan bike. Dezvantaja sisêyan jî ji aliyê hestî ye. Dibe ku zarok her du zimanan qasî hev baş nizanibe. Ev rewş dibe ku ji aliyê malbatê yan jî ji aliyê derdorê ve bibe sedema helewesteke psikolojîk. Rewş bi vî awayî bibe, dê zarok xwe nebaş hîs bike û dê ji duzimaniya xwe bitirse. Dezvantaja çaran jî pirsgerêka nasnameya zarokan e. Zarokên ku bi du zimanan dipeyivin, dibe ku di nav nasnameyên her du zimanan de têkeve aloziyekê. An jî ji aliyên kesên derve ve rastî êrîşa nasnameyî were. Dezavantaja din a duzimaniyê jî ev e, dibe ku kesên duziman ji aliyê zimanê serdest ve rastî zextekê were û ev duzimanî têk here (Baker, 2011: 110-114).

Ne tenê Colîn Baker, gelek kesên din jî qala dezavantaj û bandorên ne baş yên duzimaniyê kirine. Lê ev nêrîn ne li ser pêşketina zarokan a akademîk in. Piranî bandora neyînî yî li ser jiyana zarok, fikrên zarok û civakê danîne ber çavan. Ev jî ji ber şerd û mercên cihê ku kesên lê dijîn diguhere.

Vasterling di sala 1936an de ji nêrîna Blocher bi rê ketiye û yekzimaniyê xwezayî, duzimaniyê wek du jiyanan bi nav kiriye. Li gor wî dibe ku duzimanî mirovan di wextê xamtiyê de bike şizofren; duzimanî ji bo kesekî ne dewlemendî lê bela ye (Vgh. Tulu, 2009: 57). Li gorî Blocher jî xetereya duzimaniyê a herî mezin ku derdixe holê lawazkirina hezkirina welat, ax û gelan e. Tiştên ku kesên din ehlaqî dibîne, ew bêalî nêzîk dibe. Bi duzimaniyê biwêjên kozmopolît û bêqarekteriya navnetewî her ku diçe zêdetir dibe (Blocher, 1982, Vgh. Tulu, 2009: 57).

Hînbûna duzimaniyê ya ji aliyê demê ve bi du awayan derdikeve holê. Ji hînbûna du zimanan a di heman wextê de re “duzimaniya hemwext tê gotin. Carinan jî ev hînbûn pê hev jî çê dibe û jî vêya re jî “duzimaniya rêzîn” tê gotin (Yazıcı û Genç, 2008).

2.2.1. Duzimaniya Hemwext

Duzimaniya hemwext wek duzimaniya rastîn jî tê zanîn û di vir de zarok ji zayina xwe ve rastî her du zimanan jî tê. Zarokên ku dê û bavên wan ji neteweyên cuda û zarokên kêmar duzimaniya hemwext in (Tulu, 2009: 64).

Duzimaniya hemwext wek marûzmayina du zimanan a ji zayînê ve tê pênasekirin. (Mergen, 2010: 36). Di vir de duzimanî hînbûna bi hev re ya zimanê yekem û duwemîn re pêk tê. Heger beriya sê salî zimanê duwemîn hatibe hînbûn, hingê duzimaniya hemwext pêk hatiye (Baker, 2011: 294).

Duzimaniya hemwext li gor temenê zarokan û axaftina dê-bav, malbat û derdorê tê diyarkirin. Ji ber ku zarokên ku li Tirkîyeyê dijîn li her deverên jiyanê rastî tirkî tî, em dikarin bêjin ev zarok duzimaniyên hemwext in. Çunki dê û bav bi zarokên xwe re kurdî jî bipeyivin, zarok bi dengên derdorê an jî televîzyonê jî tirkî dibihîze.

2.2.2. Duzimaniya Rêzîn

Di vir de duzimanî hînbûna zimanê duwemîn piştî zimanê yekemîn pêk tê. Wexta ku zaro piştî sê saliya xwe zimanê duwemîn hîn dibe, ev duzimanî derdikeve

holê. Ji aliyê dema hînbûna zimên, ji duzimaniya hemwext cudatir e (Baker, 2011: 284).

Heger zimanê duwemîn, piştî sê saliya zarok dest pê bike, hingê duzimaniya rêzîn pêk tê. Mînaka zarokên ku ji ber karen dê û bavan koçî welatekî din bûne ji vêya re mînak tê dayîn (Tulu, 2009: 64). Mirov dikare mînaka dê û bavên ku ewilî bi zimanê xwe yî zikmakî kurdî dipeyivin û piştî sê saliya zarok bi zarokên xwe re tirkî dipeyivin jî bidin.

2.2.3. Duzimaniya Kesî

Duzimaniya kesî, rewşa zanîna du zimanan a kesekî ye. Ev hînbûyîn bi gelek sedemên cuda û li derdorên cuda çê dibe û ev kes êdî duziman in. Duzimaniya kesî bi du awayan derdikeve holê: Jiyankirina li cihên du çand û ya din jî ji bo pêdiviyekê ye (Karaagaç, 2011: 222).

Mirov ji bo ku pêdiviyên xwe bi cih bînin qasî ku karibin, bi mirov an civakên din re din ava têkiliyê de ne. Ev têkilî dibe ku zimanek an jî bi du zimanan pêk were. Di temasa di du zimanan de duzimanî derdikeve holê. Li gorî Hamers û Blanc ev temas dibe ku civakî be, heger ne civakî be jî bi awayekî kesî jî pêkan e (Hamers û Blanc, 2000, Vgh. Bican, 2017: 109).

Duzimaniya kesî bi kîjan awayî jî bê pênasekirin, ji duzimaniya civakî ne cudatir e ango ne bi serê xwe ye. Lêkolîner di xebatên xwe de bale bixşînin ser vê nokteyê. Weke encam ziman/karanîna zimên ji peywendiya xwe yî ku pêk hatî nayê veqetandin (Bican, 2017: 110).

2.2.4. Duzimaniya Civakî

Duzimaniya civakî duzimanîbûna civakekê ya ji ber sedemên cur bir cur ên wek ji herikîna jiyana civakekê heta ji ola ku civak qebûl kiriye re, ji koçberiyê heta sedemên polîtîk û het ji ber modayê ye (Karaagaç, 2011: 717).

Duzimaniya civakî bi gelek dîsîplînan re din ava têkiliyê de ye û bergeha wê têra xwe berfireh e. Bûyerên civakî dikeve nav xebata duzimaniya civakî. Mînak di

hinek civakan de duzimanî qîmeteke baş dibînin û xwedî nirxandineke erênî ne. Bi xêra vî tiştî pêşketina duzimaniya civakî tê pêşxistin. Di hinek civakan de jî duzimanî wek tişteke neyînî tê dîtin, wek hêzeke perçekirinê tê îfadekirin, biçûk tê dîtin û di perwerdehiyê de tê qedexekirin. Wexta ku rewşa duzimaniyê ya guherîna di navbera nifşan de ya li Hindîstan û DYAyê bê berawirdkirin, divê bê zanîn ku koçberên nifşa duwemîn û sêyemîn zimanê xwe yî zikmakî ji bîr dikin û vediguherin yekzimaniya îngîlîzî (Grosjean, 1982: 111, Vgh. Bican, 2017: 110).

Di çarçoveya kurdî de li Tirkîyeyê, hale heyî piraniya kurdan duziman in. Repertûara zimên ya kurdan ji kurdî û tirkî pêk tê. Bi vî rengî dikare diyar bike ku cemaata zimanî ya kurdî, xwedî duzimaniya civakî ye. Di demekê de bikaranîna kurdî pirtir li cihên xeyrî-fermî û taybet hatiye sînordarkirin. Çunkî dinamik û şertên civakî bi guherînê re rû bi rû ne, her ku bajarîbûn berbelav dibe û tiştên jiyana nûjen bi riya zimanê tirkî di nav kurdan de bi cih dibe (Opengin, 2011: 37-38).

2.2.5. Duzimaniya Zêdeker

Duzimaniya zêdeker bi zêdebûna zimanê duwemîn zarok zimanê xwe yî zikmakî bi awayekî têgehî û akademîk pêş dixê tê pênasekirin. Cummins di lêkolîneke xwe de digihêje vê encamê ku tekiliyeke xurt di navbera duzimaniya zêdeker û pêşketina zarok a ji aliyê akademîk, zimanî û zîhnî heye (Coşkun, Derince û Uçarlar, 2010: 92).

Li gorî Triarhe û Herrman (2000) ji bo pêkhatina duzimaniya zêdeker hewce ye ku kes û civaka ku kes tê cih digire li hember du zimanan helwesteke erênî nîşan bide û piştgiriya bide. Zarokên ku dikevin vê beşê ji aliyê zîhnî, zimanî û serkeftina dibistanê ve gelekî baş in (Vgh. Tulu, 2009: 67).

Alpay bi awayekî din nêzîkî vê têgehê dibe. Li gorî Alpay duzimaniya zêdeker wexta ku zimanê zikmakî yê zarok di ewlehiyê de be dest pê dike. Ev jî bi feraseta malbat, civak û derdorê mumkin e. Lê mixabin di civaka me de ti kes ne xwedî duzimaniya zêdeker e, di serî ew kesên ku zimanê wan î zikmakî kurdî ye çunkî heta niha zimanê wan î zikmakî hatine înkarkirin (2010a: 87).

2.2.6. Duzimaniya Kêmker

Pirsgirêkên duzimanî û pirzimaniyê di şertên hestî û civakî de bi navê duzimaniya kêmker derdikeve holê. Duzimaniya kêmker wexta ku zimanê zikmakî yê kesekî li hember zimanê serdest bê qedr dibe derdikeve holê (Alpay, 2010: 87).

Li gorî Papapavlou (1997) di vê rewşê de zimanê zikmakî îhmal dibe û pêşketina zimanî zikmakî dereng dikeve. Duzimaniya kêmker piranî di zarokên kêmaran ên ku çand û zimanê wan nayê hezkirin de derdikeve holê. Di van zarokan de ji ber ku her du ziman jî têra xwe pêş nakeve, rewş diguhere nîvzamaniya du alî. Ev rewş jî ji binkeftina du zimanan pe ve ne tişteke din e (Vgh. Tulu, 2009: 67).

Bican jî vê rewşê bi heman fikre lê bi rêzikên cuda rave dike. Di hinek civakan de ji zimanekî derbesabûna zimanekî din tê dîtin û ev jî derbasbûna ji zimanê zikmakî ber bi zimanê serdest çê dibe. Di van civakan de piranî kesên ku zimanê din fêhm dike lê nikare bipeyive hene (2017: 114).

2.2.7. Nîvzimanî

Li gorî Achmet (2005) ev têgeh cara ewil ji aliyê zimanzanê fînlândî Hansegard tê bikaranîn. Di vir de zarokên koçber ên ku li Swêdê tenê perwerehiya zimanê swêdî dibînin tê pênasekirin. Zimanê swêdî ketiye şûna zimanê zikmakî yê van zarokan û ji bo ku zimanê wan î zikmakî pêş keve ti xebat nehatiye kirin. Di encamê vêya de hatiye dîtin ku di pêşketina zarokan a ji aliyê zîhnî û hestî gelek pirsgirêk derketine (Vgh. Tulu, 2009: 71).

Li gorî Skourtou (1999) nîvzimanî di wexta kêmbûn û pêşneketina du zimanan derdikeve holê. Ev diyarde di pêvajoya pêşketina zimanekî, bi zêdekirina zimanekî din rû dide. Di vê rewşê de zimanek bi temamî şûna zimanê din digire. Ev zimanê ku dikeve şûna zimanê din, dikeve pêşiya pêşketina zimanê din (Vgh. Tulu, 2009: 71).

Baker dide zanîn ku nîvzimanî herî zêde bandora xwe li ser hunerên zimên ên zarok kiriye. Ji ber ku di her du zimaman de jî pêşketineke şênber tune ye, ev bandoreke neyînî li ser serkeftina zimanî a zarok kiriye. Li gorî Hansegard (1975)

zarokên nîvziman di pênc aliyên zimên de zêfîndar in; ev zarok xwedî kêr peyv in, xwedî rêzimanêke şaş in, ji bo ku bipeyivin pir difikirin, di her du zimanan de jî ji xwezayîbûn û afirîneriyê dûr in û di îfadekirina her du zimanan de jî zehmetiyên mezin dikşînin (2001: 9).

Her wiha li gorî Achmet (2005) nîvzimanî di pêvajoya perwerdehiyê de derdikeve holê. Çunkî xwendekar di karanîna metnên razber de rastî zehmetiyên tê. Di pêşketina zimanî ya zarok de derengî heye û carinan ne mumkin e ku ev kêmasî temam bibe. Şertê ewil ê perwerdehiyê têrbûna zarok a ji aliyê zimên e. Ev têrahî di pêvajoya perwerdehiyê de pêş dikeve. Lê belê ev zarokên nîvziman tiştên ku tê gotin fêhm nake û nikare ti bersîveke baş bide hewcedariyên vê pêvajoyê. Ev zarok heger piştgiriyeke baş ji derdora xwe nestîne, mixabin dê bandoreke neyînî li ser serkeftina zarok a dibistanê, kesayetiya zarok û pêşeya ku rojên pêş de dike, bike (Vgh. Tulu, 2009: 74).

Cummins jî têgeha nîvzimanîyê ji bo serkeftina zarokan a akademîk bi kar anîye. Li gor wî ev têgeh ji bo zarokên duziman ên ku li dibistanên ku rastî helwesteke neyînî tên û nikarin di Z1 û Z2 de serkeftî bibin tê bikaranîn. Ango ji bo kesên ku hem di Z1ê hem jî Z2an nikarin xwe baş îfade bikin tê bikaranîn (2001a: 99).

Zarokên kurd ku li Tirkîyeyê dijîn ji vê têgehê re mînakêke baş in. Li Tirkîyeyê her sal bi sed hezaran zarokên kurdan bêyî ku zimanê xwe yî zikmakî h'în bibin, diçin dibistanê û li vir tenê bi zimanê tirkî perwerde dibin. Ev zarok piştî demekê ji zimanê xwe jî dibin û bi zimanê dibistanê jî nikarin xwe baş îfade bikin. Loma ye ku zarok di her du zimanan de jî pêş nakeve û ev jî bi xwe re gelek pirsgerêkên akademîk û zimanî tîne.

BEŞA DUWEMÎN

ZIMAN Û PERWERDE

Têkiliyeke pir xurt di navbera ziman û perwerdehiyê de ye çunkî perwerdehî bi her çi zimanî be jî bêguman bi zimên tê kirin û zanîn bi zimên tîr ragihandin. Ev perwerdehî carinan bi zimanekî û carinan jî bi gelek zimanan tê kirin. Ev jî li her welatî bi awa û pergaleke cuda tîr kirin. Her welat jî polîtîkayên xwe li gor armancên xwe pêk tîne û dimeşîne. Perwerdehî li hin welatan bi zimanekî tenê kirin û zimanên din û ku li welêt hene tîr redkirin, li hin welatan jî dewlemendiya çandî û zimanî tîr qebûlkirin û pergala perwerdehiyê li ser vê rastiyê tê avakirin.

Em ê di vê beşê de li ser têkiliya ziman û perwerdehiyê bisekinin. Ligel vê têkiliyê em ê perwerdehiya zimanê zikmakî, perwerdehiya duzimanî û girîngiya van pergalan a li ser xwendekaran bi awayekî berfireh vebêjin. Dîsa em ê qala modelên perwerdehiyê bikin û ji çend welatên cihanê mînakên modela perwerdehiyê bidin. Di dawiya beşê de jî em ê cih bidin polîtîkayên ziman û perwerdehiyê yên Tirkiyeyê.

2.1. ZIMAN Û PERWERDE

Têkiliyeke xurt di navbera ziman û perwerdehiyê de heye çunkî her perwerdehî bi zimanekî tê kirin. Ji ber vê têkiliya xurt, gelek dewlet li gor armanç û bîrdoziyên xwe pergalekê ava dikin û van du hêmanên girîng bi kar tînin.

a. Perwerde

Perwerdehî têgeheke ku heta niha gelek carî li ser hatiye nîqaşkirin û gelek pênaseyên wê hene ye. Bi giştî perwerdehî ew çalaki ye ku mirov dike xwedî zanîn û hunerên cuda û mirovan dike perçeyek civakê ye. Perwerdehî peywira gihaştina kesên civakê ya li gor pêdiviyên welêt girtiye ser xwe (Alver, 2015: 1).

Li gorî Gungor jî perwerde saziyeke civakî ya gerdûnî ye. Ji ya herî hêsan, heta ya herî aloz di her civakê de bi rêk û pêk an jî ne rêk û pêk pêvajoya

perwerdehiyê hatiye dîtîn. Ev gerdûnîbûn di her saziyê de bi awayekî berfireh cih digire. Dê û bav zarokên xwe perwerde dikin, oldar cemaata xwe perwerde dike, nivîskar xwendevanên xwe, lîstikvan temaşevanên xwe... (1988: 72).

Celep jî perwerdehiyê wek amûreke veguhestinê bi nav dike û pênaseya perwerdehiyê bi van gotinan rêz dike. Bi wateya xwe yî giştî perwerde, bi destxistin û veguhestina ji nifşên nû re ya nirx û krîterên civakî, kevneşopîyan, nêrit û adetan, zanîn û huneran, ziman û çandan e. Girêdayî vêya perwerde ji malbat û derdorê dest pê dike, li kuçê û dibistanê dewam dike. Komale, dibistan, çapemenî, heval, derdorên siyasî û saziyên fermî an ne fermî di nav pêvajoya perwerdehiyê de cih digirin (2005: 2-20).

Perwerdehî ji ber pîraliya xwe yî dewlemend her tim ji bo malbat, derdor, civak û dewletê bûye rojeve girîng. Her sazî an civak li gor pêdivî û armancên xwe yî civakî, siyasî û bîrdozî perwerdehiyê bi kar anîye û li gor xwe pergaleke makul ava kirine.

Li gorî Cookson û Sadovnik çar armancên sereke yên perwerdehiyê hene: (Vgh. Beltekin, 2014: 5 ji Vgh. Yuksel, 2004)

1. Armancên siyasî: Amadekirina xwendekaran a ji bo bi pergalê re li hev bikin û tevî pergalê bibin û hînkirina pîvanên civakî yên bingeîn e.
2. Armancên entelektüel: Bidestxistina ji aliyê xwendekaran a hunerên bingeîn ên zihnî wek xwendin, nivîsandin û bîrkarî; a hunerên zanistî yên wek wêje, dîrok û fen; hunerên fikirîne yên bilind wek analiz, sentez û nirxandin e.
3. Armancên civakî: Ji bo civakîbûna kesên hînkirina pîvan, krîter û nirxên curbicur ên civakî ye.
4. Armancên aborî: Amadekirina xwendekaran ji pişeyan re ye.

Van armancan herî zêde jî dewletên ku li gor feraseta netew-dewlet ava bûye bi kar tînin. Perwerdehiyê wek amûreke bingeîn û li gor armancên xwe yî curbicur dîzayn dikin û bi kar tînin. Her wiha plansaziya xwe yî perwerdehiyê jî li gor deh salên pêşiya xwe çê dikin û saz dikin.

Netew-dewlet perwerdehiya ku ji nû ve ava kiriye ji bo pêkanîna armancên xwe wek amûrekê dîtiye. Ji bo jinûveavakirina pergala civakî di çarçoveya krîter û armancên bîrdozî de pêk bînin pergala perwerdehiyê tê bikaranîn. Nêzîkatiya bi vî awayî xwe di pênaseyên perwerdehiyê jî dide der. Bi kurtasî perwerdehî ji bo pêşxistina fîzîkî, entelektüelî û moralî a kesên ku ji jiyana civakî re ne amade ne, tê pênasekirin (Çetin, 2001; Durkheim, 1956, Vgh. Şahin, 2008 ji Beltekîn, 2014: 5).

Li gorî Wallerstein (2001: 60) jî netewe-dewlet ji bo bi armanca di nav sînorên xwe de çandeke yekrû biafirîne û ji bo ku çandên cuda veşêre polîtîkayên curbicur pêş dixin. Ji bo nasnameyên cuda di nav çanda desthilatdar de bê bişaftin dibe ku 'zext'ê bi kar bîne û ev nebû jî dibe ku bi politikayên cuda dest bi bişaftina 'bi dil' bikin. Di dîrokê de dewlet ji bo avakirina neteweyekê sê amûrên bingeîn bi kar anîne: Pergala dibistanên dewletê, xizmeta leşkeriyê û merasîmên ji raya giştî re vekirî. Ev her sê jî bi dewamî tê bi kar anîn. Loma em dikarin bibêjin perwerdehî, amûra herî bi bandor a ji bo ku netewe-dewlet civakeke wekhev biafirîne ye (Vgh. Egitim-Sen, 2014: 107).

Li gorî Nohl jî perwerdehî ji bo endambûna kesên kêmar tên bikaranîn. Endambûna çanda kêmarên etnîkî rasterast ji aliyê desthilatdaran ve wek kêmasiyekê tê dîtin. Ev kêmasî ne tenê ji aliyê zimên, kêmasiya qodên zimên û bi çandeke wek dûrketina ji perwerdehiyê jî tê ravekirin. Armanca herî bingeîn a perwerdehiya bişaftinî telefikirina kêmasiyên zarokên kêmaran e û her wiha lihevkirina van zarokan a çanda civakî a piraniyan e (2014: 5).

Her kîjan sazî be, çi civak û çi dewlet ji bo peşketineke baş û kêrhatî divê politikayên perwerdehiyê li gor pirçandî û cudabûna xwe pêş bixe. Her wiha divê cudahiyên di nava dewletan de hene di pergala de bê temsîlkirin û qedr û qîmeta wan bi wan bidin hîskirin. Ev jî dibe ku bi polîtîkayên perwerdehiya pir çandî mimkun be. Ango ne tenê bi çanda desthilatdar, divê bi çandên cur bir cur bê hunandin.

Perwerdehiya pirçandî ku bijarteyên çandî, zimanî û etnîkî pêşkêşî xwendekaran dike, bi armanca ku pîrsgirêkên cudahiya di navbera ziman û çandan de ye çareser bike roleke mezin dilîze. Di vê perwerdehiyê de pîralîbûyîna xwendekaran

tê qebûlîkirin û ev piralîbûn wek avantajekê tê dîtin û bi vî awayî hestên hemwelatî bi xwendekaran dide qezençkirin û çandeke dewlemend a netewî tê bidestxistin. Perwerdehiya pirçandî ew pergal e ku pêşketina hemû xwendekarên ku ji aliyê ziman, ol, zayend, reng û çandê ve ji hev cuda ne lê bi awayekî wekhev ji xwe re kiriye armanç (Banks, 2013: 3).

Li gor Manning û Bauth (2009) perwerdehiya pirçandî xizmetê ji du armancên sereke re dike; yek jê hewl dide ku xwendekar taybetiyên ku mirovan ji hev vediqetîne yên wek çand, ziman, çînen civakî, zayend, ol û pêdiviyên taybet ên mirovan qebûl bike û rêzê ji wan re bigire, ya din jî qezençkirina hestên wek dad, wekhevî û demokrasiye ye (Vgh. Kaya&Aydin, 2014: 38).

b. Ziman

Yê ku parastin û barbiriya çandê dike ziman e. Tenê bi lêkolînkirina zimên mirov dikare agahiyan derbarê awayê jiyan, bawerî û kevneşopî û tevgera wan î çandî ya ji dîrokê ve ya neteweyekê bi dest bixe. Amûra herî mezin ya mirov tarzên xwe yî jiyanê, kederên xwe, kevneşopiyên xwe, kêf û şahiyên xwe, bi kurtasî ya ku wan ji nû ve va dike ziman e û loma ye ku mirov zimanê xwe dikin rêza yekem a honanên xwe; Çunkî dizanin ku çareya hebûnê ew şîfreya ku çanda wan parve dike ziman e (Terzioglu, 2007: 91).

Li gorî Guneş (2011) Perwerdehî di vê cihana me yî ku çaxa zanîne dijî de tişteki dijwar e. Ziman riya herî xweş a ku me bigihîjîne wê zanîne ye. Ziman dilê hînbûnê û hunera bê sînora mejiyên mirovan e. Mirov bi karanîna van hunerên xwe yî bêsînora hîn dibe û di jiyanê de xwe pêş dixin (Vgh. Gozukuçuk, 2015: 1).

Wek ku Demîrel û Şahînel (2006) jî dibêje mirov zimanê xwe ji derdora xwe hîn dibe û hemû taybetiyên zimanê xwe bi dest dixe. Bi vî awayî mirov, zimanê ku hîn dibe di her wextê jiyana xwe de bi kar tîne. Pêvajoya hînbûna zimên bi awayekî xwezayî li cem malbat û derdorê çê dibe; ev li dibistanê bi awayekî qestî çê dibe. Hînkirina zimên a ku li dibistana bi awayekî qestî çê dibe, pîvanên zimên û karanîneke rast dike armanc (Gozukuçuk, 2015: 34).

Divê xebatên ku ji bo hêsanîkirina pêvajoya perwerdehî û hînbûyîna zimên, li gor armancên xwe diyarkirî yan jî li gor pêdiviyên civakê bê kirin. Ji bo kur ê li ber kesên ku zimên hîn dibin xî, divê asta pêşketina ew kesên ku zimên hîn dibin bê diyarkirin û wek asteke rêzîn pê pênasêkirin (Bîcan, 2017: 54).

Ligel ew qas girîngî û taybetiyên ziman û perwerdehiya zimên hin civak, dewlet an jî komên din li gor xwe û armancên xwe tev diğerin. Van giringiyên ziman û perwerdehiya zimên didin aliyekî û li gor berjewendiyên xwe bi perwerdehiyê dilîzin. Ev jî pîrsgirêkên heyî mezintir dike û rê li ber pîrsgirên din vedike.

Ji ber sedema ku ziman hem amûr hem jî sembola, netewe-dewlet ji bo armanca xwe yî ku civakê veguherîne yekrengiyê, dest davêje zimên. Ziman tê birêvebirin, tê beralîkirin û heta ji nû ve tê afirandin. Ji bo her kes bi zimanê netewe-dewletan bipeyive serî li mekanîzmayên curbicur tê dayîn. Li ser vî esasî dewlet tenê bi zimanekî tê birêvebirin û zor didin wan gelên din ku her kes bi vî zimanî bipeyive û kar bike (Coşkun û yê din, 2010: 14).

Ev zordayîna peyivîna zimanê serdest bi hin rê û rêbazên cuda pêk tê. Serdest an netewe-dewlet her tim sedemekê dibîne ku zimanê xwe bi bindesta bide peyivandin. Carinan bi xweşkirin û pîrozkirina zimanê xwe, carinan bi qedexeyên zagonî û car caran jî bi zextên tund dike.

Darion (1998), dibêje ku serdest ji bo ku zimanên kêmaran an gelên din paş ve bixşîne sedemên wek netêriya zimanên din dixê pêş û wan biçûk dixê. Bi vî awayî divê mirov baş li ser van bawerîyan bisekine û lê binere ka ew bawerî di nav civakê de çi qas berbelav e. Ji xeynî vê divê bê pîrsin ku ew zimanên din di civakê de çawa cih digire û ew bawerî ji aliyê kê û çawa hatiye belavkirin (Vgh. Ayan û Koçbaş, 2009: 14).

Netewe-dewlet çawa ku polîtîkayên xwe yî perwerdehiyê li gor hin armancên xwe saz dike û li ser vî esasê pergalekê diafirîne, her wiha polîtîka û plansaziyên xwe yî zimên jî li gor armancên xwe dike. Ev plansazî ne tenê bi biryarên fermî, pêşniyarên konferansên navneteweyî, îstatîstîkên ezmûnan an jî bi encamên hin projeyên zimên tê kirin; di vî warî de tekoşîneke serdesbûnê jî rolekê digire. Loma

hînkirina zimanekî an perwerdehiya zimanekî bi çi awayî bibe bila bibe, heger ew feraseta rêveberiyê û hesabên serdestiyê neyê fêhmkirin, ev mijar jî baş nayê fêhmkirin. Ji ber vî awayî qasî cihgirtina zimanekî di pergale de, zimanên ku hatine qedexekirin jî bi hesabên serdestan tê diyarkirin (DISA, 2012: 4).

Wek ku tê dîtin têkiliyeke xurt di navbera ziman û perwerdehiyê de heye. Ev têkilî qasî ku bandora xwe li ser serkeftîbûna pergale ku dê bê birêxistin bike xurt e. Ango divê ev her du hêman li gor rastiyên hev bîn pêşxistin.

Saziya perwerdehiyê bi xebat û lêkolînên xwe zimên di bin bandora xwe de dihêle. Bi taybetî jî xebatên ku hunermend û zanyar dikin, bi xebatên xwe zimên xweşiktir û pêşketîtir dikin. Ziman jî bi binyada xwe û bi xweşî û bi nuansê xwe bandorê li perwerdehiyê dike (Gungor, 1998: 84).

Ji bo xweşkirin û watedarkirina vê têkiliya xurt û ji bo serkeftina zarokan a akademîk, ziman û zihnî û perwerdehiyeke zanistî, divê welatên ku ji çand û zimanên dewlemend pêk hatî, dev ji polîtîkayên yekziman ên perwerdehiyê û fikrên wek yekreng û yekçand berdin û girîngiyê bidin perwerdehiya ziman û perwerdehiya bi zimanê zikmakî.

2.1.1. Perwerdehiya Bi Zimanê Zikmakî

Ji aliyê hin kes, platform an jî komxebatan ve carinan têgeha perwerdehiya zimanê zikmakî û perwerdehiya bi zimanê zikmakî şaş, ne di cih de tê yan jî di şûna hev de tê bikaranîn. Ji bo çareserîya pirsgerêkên heyî divê ewilê ev têgeh bi zelalî û bi awayekî rast bê pênasekirin. Çunkî pênaseyeke şaş, bêguman rê li ber nêrîn û rê û rêbazên şaş vedike.

Perwerdehiya bi zimanê zikmakî, ew pergala ku xwendekar di dersên din de jî bi zimanê xwe perwerde dibe ye. Perwerdehiya zimanê zikmakî jî ew pergala ku zarok zimanê xwe yî zikmakî wek dersekê dibine lê dersên din ên wek bîrkarî, zanistî, fîzîk û hwd. jî bi zimanê serdestan dibînin (Ayan û Koçbaş, 2009: 13).

Mafê perwerdehiya bi zimanê zikmakî di çarçoveya ku mirov zimanê xwe perwerdehiyê, rêveberiyê, medyayê û hiquqê de bi kar bîne tê pênasekirin. Lê

netewe-dewletên ku piştî Şoreşa Fransayê ava bûn civakek ku ji kesên cuda qebûl nake û wan nas nake, qedexerina bikaranîna zimanan pêk hatî esas girtin. Li ser vê esasê perwerdehiya bi zimanê zikmakî ku rê nade berjewendiyên netewe-dewletan li gelek welatan bûye sedemên nîqaşên mezin (Mertcan û Şeker, 2014: 140).

Wek celebekê mirov pirzimanîbûna xwe bi dîroka xwe piştras dike. Lê ev rastiya dîrokî ji aliyê hin armancên cuda rastî zirareke mezin tê. Zirara herî mezin ya ku ev rastiya dîrokî lê rast tê jî polîtîkayên zimên û kiryarên perwerdehiyê yên ku bi vê polîtîkayê girêdayî ye. Perwerdehiya zimanê zikmakî jî daxwazeke li hember vê zirarê ye (Yalınkılıç, Delîce û Kaygûsûz, 2014: 157).

Di vê wexta ku cihaneke pirçand û pirziman qebûl kiriye de, 'zimanê fermî', 'yekziman' û gotinên ku li ser perwerdehiya yekzimanî di cihana modern de diguhere biresereke fetişî. Ev bireserên fetişî, ji ber ku rê nade nîqaşên perwerdehiya bi zimanê zikmakî, pirzimanî an jî perwerdehiya bi zimanê zikmakî dibe mijareke rexneyê. Di çandeke pirziman de perwerdehiya bi zimanê zikmakî, ne tenê di dewletên nîjadperest de, her wiha fikrên ku bi awayekî maddî jî nêzîkî vê meseleyê dibin jî li hember vê daxwazê derdikevin (Yalınkılıç û yê din, 2014: 157).

Lê ligel ku dewlet dizanin perwerdehiya bi zimanê zikmakî ne tenê bi zimanê gelên din pêk tê jî, dîsa jî mijarê tevlihev dikin û bi vî awayî dixwazin rê li ber nîqaşên ku di der heqê vê mijarê de bigirin. Ev jî ji ber tirsên netewe-dewletan tê. Netewe-dewlet, qedexekirina xwe yî qestî û plankirî ya perwerdehiya bi zimanê zikmakî û politikayên yekzimanî, bi sedemên wek têkçûna yekitiya neteweyî, perçebûn, xerabûna aborî vedibêjin. An jî hebûna zimanê din di pergala perwerdehiyê de dibe ku rê li ber pirgirêkên têkiliya di navbera kesên di civakê de veke vedibêjin.

Bi rastî ev sedem kombînasyona parastina polîtîkayên yekzimanî ne. Berovajî vêya, bi van polîtîkayan ti kes an ti dewlet nagihîje armanca avakirina civakeke demokratîk. Loma ye ku hem li welatê me hem jî li welatên cihanê bi van polîtîkayan aşitî pêk nehatiye (Surmelî, 2015: 49).

Mijara perwerdehiya bi zimanê zikmakî mijareke tevlihev ku aliyên wê yî civakî, aborî, teknîkî û siyasî hene ye. Loma divê hemû aliyên wê bê fikirîn û li gor wê plansaziyek bê kirin. Hewcadariya vêya jî bi plansazî, strateji û çavkaniyên mirovî heye. Divê ev plansazî û strateji raya giştî baş fêhm bike û vê meseleye baş bi rê ve bibe. Pirsgirêkeke din a perwerdehiya bi zimanê zikmakî têgihîja civakî ye. Gelek kes difikire ku perwerdehiya bi zimanê zikmakî tenê bi zimanekî tê kirin. Li ti deran cihanê ev tune ye û ne mimkun e ku bibe jî. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî ne tenê pwerdehiya zimanê zikmakî ye, ji xeynî zikmakî perwerdehiya zimanî serdest e jî (Kaya û Aydın, 2014: 69-70).

2.1.1.1. Girîngiya Perwerdehiya bi Zimanê Zikmakî

Daxwaza perwerdehiya bi zimanê zikmakî ji aliyê netewe-dewletan ve çî qas bê polîtîzekirin û ji aliyê wan neyê qebûlkirin jî, rastiyek heye ku ev pergal ji bo pêşketina zarokan an jî ji bo pêvajoya perwerdehiya zarokan pir girîng e. Zarokên ku bi zimanê xwe perwerde nabin di vê pêvajoya perwerdehiyê de rastî gelek pirsgrêk û astengiyan tên.

Li gorî Khubchandani (2003) di sedsala bîstî de gelek pedegog zimanê zikmakî ji bo perwerdehiya zarokan nêzîkatiya herî rast dibînin. Khubchandani (2003) raporên di der heqê perwerdehiya bi zimanê zikmakî bi vî awayî daye hev: Di rapora UNESCO ya di sala 1953an de hatiye weşandin de ev nêrîn hatî: Bi awayekî derûnînasî zimanê zikmakî ji bo fêhmkirin û îfadekirinê pergala nîşanên watedar in (Vgh. Gozukuçuk, 2015: 40).

Zarokên ku bi zimanê xwe yî zikmakî perwerdehiyê nabînin bi gelek pirsgrêk û astengiyan rû bi rû dimînin. Ev xwendekar ji aliyê xwendin-nivîsandin, fêhmkirin, têkiliya di navbera heval û mamosteyan de rastî gelek pirsgrêkan tên. Her pirsgrêk bi awayekî cuda xwe dide der.

Xwendevanî ji bo xwenaskirin û xwepêşxistina mirovan hunerên herî girîng in. Pêvajoya ewilî a hinbûna xwendin û nivîsandinê ji bo hunereke xwendin û nivîsandinê ya mayinde û rexneyî a mirovan pir girîng e. Di vê pêvajoyê de xwendin û nivîsandin ji bo kesên ku pirsgrêka zimanê zikmakî dijîn ne tiştekî xweş e,

bîranînên ku ji gelek tiştên xerap pêk hatine ye: Fêhmnekirina zimanekî ku tê peyivîn, fêhm bike jî xwe îfade nekarîbûn, xwendin û nivîsandinê fêhm bike jî pirê caran tiştê ku dixwîne û dinivîse fêhmnekirin (Egitim-Sen, 2014: 114-115).

Serdema ewil a perwerdehiyê hînkirina xwendin û nivîsandina xwendekaran dike armanç. Zûbûna hînbûna xwendin û nivîsandina xwendekaran li gor pêşketina wan î fîzîkî an psikolojîk biguhere jî, bi giştî tê hêvîkirin ku zarok di dawîya pola yekemîn de derbasî xwendinê bibin. Zarokên ku qet tirkî nizanin an jî kêmtirkî zanin beriya ku dest bi nivîsandinê bikin, divê ewilî zimên hîn bibin. Pîrsgirêkên ku ewilî qet nayên fehmkirin paşê piçek be jî tê fêhmkirin lê dîsa jî gelek pîrsgirêkên ku zarok nikarin xwe îfade bikin hene. Ev rewş jî dibe sedema ku kêmkirina serkeftina akademîk a zarokan (Egitim-Sen, 2014: 114).

Xwendin û nivîsandin, di roja me de hunereke tevlihev a ku ji bo serkeftina mirovan e. Du hêmanên pêvajoya xwendin û nivîsandinê hene. Ji hêmanan yek naskirina peyvê û ya din jî fêhmkirina peyva ku tê xwendin e. Zarok tenê bi zimanekî ku xwendin û nivîsandina xwe fêhm dike hîn xwendin û nivîsandinê dibe. Ji bo ku mirov bi awayekî herikbar bixwîne û binivîse divê zarok zimên fêhm bike û hîn bibe ku ew sembolên zimên çawa tê temsîlkirin (Oztunç, 1994, Vgh. Yazici û Temel, 2011: 147).

Heger zarok ew zimanê ku li derdora wî tê peyivîn fêhm bike, ev rê li ber hînbûna wî ya xwendin û nivîsandinê vedike. Zarok, wexta ku tiştêkî dixwîne ewilî sembolan nas dike û paşê bala xwe dide wateya van gotin û sembolan. Ango wexta ku van hunerên xwe bi kar tîne, sûdê ji pêvajoya xwe yî zimên werdigire (Barbour, 1992, Vgh. Yazici û Temel, 2011: 147).

Agahî ji mejiyê mirov derbas dibe û tê veşartin û tê bikaranîn. Mirov tiştê ku hîn dibe, jiyînên xwe bi niha û bi rabirdûyê re têkiliyê datîne. Perwerdehiya zimanê zikmakî pêşketina mejiyê mirov ji xwe re dike armanç. Mirov bi alîkariya zimanê xwe yî zikmakî hunera xwendinê ya bê navber bi dest dixê, çanda xwe dewlementir dike û meraqa agahî û zanînên din dike. Bi xwendina berhemên ku bi zimanê xwe hatiye nivîsin agahiyan lêkolîn û berawird dike û her wiha fikrên nû diafirîne (Namdar, 1996, Vgh. Tulu, 2009: 13-14).

Zarokên ku bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde dibin tenê di zimanên xwe de serkeftî nabin. Ev serkeftin bandora xwe li zimanên din jî dike. Cummins (2001b:15-20) vêya pir xweş rave dike. “ Zarokek di hunerên xwendin û nivîsadrîna Z1ê de çi qas serkeftî bibe, ev serkeftin bandora xwe Z2an jî dike. Bi vî awayî duzîmanîya zêdeker bi awayekî erênî pêş dikeve. Loma ye ku keda ku li Z1ê tê dayîn ji bo tasarûfa hînbûna Z2an jî destkeftîyeke demî dide zarokan.”

Zarokên ku bi zîmanekî din perwerde dibin ne tenê di warê xwednî-nivîsandin û fêhmîkirinê de pîrsgîrêkan dijîn. Ev zarok her wiha ji aliyê hunerên ragihandinê ve jî, têkîliya bi heval û mamosteyan jî rastî pîrsgîrêkan tê. Ango ev zarok di warê hunerên xweîfadekirinê de rastî pîrsgîrêkan tên.

Wexta ku em dibêjin hunerên ragihandinê, em qala du tiştên sereke dikin: guhdarkirin û peyivîn. Hevparîya van her du huneran bi perwerdehiyeke baş a deng re girêdayî ye. Ji bo derxistinê van dengên, ji bo karanîna wan divê perwerdehî bêtendin. Dîsa ji bo ku em xwe îfade bikin ji xeynî peyv û pîvanên rêzîmanî divê di der heqê mijarê de agahiyên me hebin. Ji ber ku zîman heybereke civakî ye, ji bo bikaranîna wê jî hewce ye ku ji bo bikaranîna wê em agahdar bin (Koksal û Pestil, 2012: 213).

Lîtaratura navneteweyî nîşan dide ku zarokên gelên kêmar di destpêka pêvajoya dibistanê de di nav guloka pîrsgîrêkan de ne. Ev zarok aqlên xwe, hestên xwe, fikrên xwe, qerf û henekên xwe nikarin bi heval û mamosteyên xwe re parve bikin. Di ser re jî mamoste pîrsgîrêkên van zarokan bi aqlê wan û bi xebata wan î kêr girê didin. Lê belê li gorî Cummins (2009) zarok di wextê ku li hember zîman, xeyal û hêzên wan î zîmanî helwesteke baş bêtendin de serkeftî dibin (Coşkun û yê din, 2010: 77).

Di dibistana seretayî de mijara ku herî zêde tê îhmalkirin hunerên guhdarkirinê ye. Lê belê guhdarkirin ew hunera ku di xwendinê de herî zêde tê bikaranîn e. Di dibistanên seretayî de ji ber ku her tim mamoste dipeyivin, xwendekar tenê dibin guhdarvan û di polê de gelekî pasîf dimînin (Akyol, 2012: 1, Vgh. Gozukuçuk, 2015: 25). Lê zarokên ku zîmanê wan î zikmakî ji zîmanê

dibistanê cudatir e, ev zarok tiştên ku tê peyivîn fêhm nake û loma ev pasîfbûna van zarokan tê pelçînkirin.

Zarokên ku bi zimanê xwe yî zikmakî perwerde nabin di hevkirina pol, dibistan an jî pîvanên dibistanê de jî pîrsgirêkan dijîn. Ji ber ku li wê cihê ku zarok nû ketiyê, bi zimanekî cuda perwerde tê kirin, zarok xwe di aîtkirina wê de pîrsgirêkan dijî. Ev jî bi tevgerên cuda xwe dide der.

Bûyera herî girîng a ji bo zarokan destpêkirina dibistanê ye. Ev pêdiviya ku zarok hatibe asteke guncav bi xwe re tîne. Ev zarokên ku gihaştine wê astê serkeftî dibin û bandora xwe li serdemên din ê perwerdehiyê jî dike. Zarokên negihaştine vê astê bi dibistan û polê re li hev nakin. Zarok bi tirs nêzîkî dibistanê dibin û ji dibistanê sar dibin. Ev negihaştin bandora xwe li serdemên din ên dibistanê jî dike. Divê mirov baş bala xwe bide vê mijarê ku zarok nekeve vê rewşa xeter (Binbaşioğlu, 2004: 2). Ev piranî di zarokên ku bi zimanê dibistanê nikarin xwe baş îfade bikin derdikeve. Çunkî zarok bi zimanekî din tê dibistanê lê bi zimanekî cuda dest bi perwerdehiyê dike. Ev jî dibe encama ku zarok ji dibistanê sar bibin û pê wê re birevin.

Ziman ne tenê amûreke ragihandinê, divê mirov zimên wek pergaleke ku cihanê ji me re watedartir dike şîrove bike. Loma ne rewşa ye ku mirov zimên ji çanda lê çebûye biqetîne. Mînak em bi alîkariya dengên ku dibihîzin li cihanê nas dikin. Ev îspata têkilî danîna ziman û rastiya xwendekaran e. Loma ye ku xwendekar bi alîkariya zimên têkilî bi jiyan, çand, civak û polê re girê dide û peywendiyên xurt datînin. Ev pêwendî hesta aîdiyeta cihekî bi xwendekaran re çê dike (Darder, 2010: 45). Nexwe di vir de em dikarin bibêjin ew xwendekarên bi zimanekî ku ji bilî zimanê xwe yî zikmakî perwerde dibin, ji ber cudahiya zimên pêwendiyêke xurt danînin û xwe aîti wê pergala ku perwerde pê tê kirin hîs nakin.

Li ser vê esasê divê em li ser barê psîkolojîk ê zarokên ku nikarin li dibistanê bi zimanê xwe bipeyivin jî bisekinin. Guhnedena zimanê zikmakî ya zarokan bi xwe re neheqiyên gelekî mezin tîne yan jî neheqiyên ku hene xeraptir dike. Di vê pêvajoyê de zarokên ku nikarin bi zimanê xwe yî zikmakî bipeyivin xwe kêmtir, bê hêz

û xerîb hîs dîkin. Ev jî ji pola yekem a dibistana seretayî dest pê dike (Degirmencioglu, 2010: 123).

Loma ye ku helwesta hêmanên wek mamoste, rêveberî û xwendekarên din ên dibistanê di xwe aîr hîskirina xwendekaran de cihekî giranbuha digirin. Zarokên ku zimanê wan î zikamkî cuda xwe li gor van helwestan xerîb an jî ji malê hîs dîkin.

Dibistan ew saziyên ku xwendekar cudahî û curbicuriyan nas dike ye. Bi vê naskirinê pêşektina zarokan tê hêvîkirin. Helwesta ku zarok ji bo zimanê xwe yî zikmakî rast tê ji loma ew qas girîng e. Nenasiya zimanê zikmakî rê li ber dûrketina zarok ji dibistanê vedike. Ji bo vê nokteyê mînakeke girîng, zarokên romanên in. Helwesta neyînî a li hemberî muzîkê, zarokên romanên ji dibistanê dûr dixin (Krashen, 1999, Vgh. Degirmencioglu, 2010: 124).

Pirsgirekeke din a zarokên ku ji bilî zimanê xwe yî zikmakî nabînin helwesta wî neyînî ya li hember çand û zimanê xwe ye. Ev zarok bi demê re êdî helwestên neyînî li hember ziman, çand û civaka xwe nîşan didin û her ku diçe ji nirxên neteweya xwe dûr dikevin. Car caran ziman, çand û hêmanên neteweya xwe ji yên din bê qîmet dibîne.

Di vê cihê ku pevçûn lê heye de, mirov ji bo ku biçûk neyê dîtî û paş ve neyê kişandin ji zimanê xwe yî zikmakî dûr dikeve û bi hînbûna zimanê serdest jî ji ziman û çanda xwe re biyan dibe. Ev kesên ku hatine biyanîkirin êdî helwestên gelekî hişk û nexweş nîşanî ziman û çanda xwe dîkin (Egitim-Sen, 2004: 15).

Dibe ku perwerdehiya zimanê zikmakî di çarçoveya maf, çand û humanîzmê de bê parastin. Lê bi taybetî jî divê li ser mafê zarak û ji bo fêydeya zarokan bê parastin. Li ser vê esasê divê zarok ji pêşdibistanê an jî ji dibistana seretayî dest bi perwerdehiyê bibin (Degirmencioglu, 2010c: 127).

2.1.1.2. Di Qada Navnetewî de Mafê Perwerdehiya bi Zimanê Zikmakî

Di der heqê perwerdehiya bi zimanê zikmakî de gelek saziyên navneteweyî fikrên xwe bi belgeyên xwe yî fermî anîne zimên. Piraniya van saziyan di der heqê perwerdehiya zimên û perwerdehiya zimanê zikmakî de fikrên xwe bi nivîskî anîne ziman. Van saziyên navnetewî vî mafê xwezayî û mirovî di hinekên van belgeyan de bi awayekî eşkere lê hin ji wan jî bi awayekî nixumî anîne zimên.

Mafên zimên her çi qas di çarçoveya mafên kêmaran de hatibe zimên jî, hevpariya van belgeyan ew e ku mirovan wek kirdeya mafên zimên dîtine. Ti belgeyên navneteweyî bêyî ku kesên koman referans bidin maf nedane koman (Yıldız, 2004: 15).

a. Belgeyên Neteweyên Yekbûyî

Di Peymana Mafên Zarokan a ku 20ê Mijdara 1989an de di Lijneya Giştî ya NYê qebûl bûye de hin maddeyên di der heqê mafê zimên de cih girtine. Di fikraya d a maddeya 17an de bicihanîn û teşwîqkirina pêdiviyên zimên ên zarokan hatiye diyarkirin. Di maddeya 29an de hewcedariya rêzgirtina ji ziman, çand û ola zarok re hatiye îfadekirin. Di maddeya 30î de jî hatiye diyarkirin ku divê zarok ji karanîna zimanê xwe neyên hiştin (Seçen, 2011: 25).

Belgeyeke din a NYê Danezana Mafên Kêşên Kêmar ên Netewî, Etnîkî, Olî û Zimanî ye ku di 18ê Qanûna 1992an de qebûl bûye. Fikraya 4an a di maddeya 2an de qala mafê kêmaran ê avakirina saziyan tê kirin û her wiha mafê saziyên ku perwerdehiya zimên bidin jî didin wan. Fikraya 3yan a di maddeya 4an de jî “Dewlet ji bo ku kêmar zimanê xwe hîn bibin û bi zimanê xwe perwerde bibin, qasî ku derfet hebe rê li ber wan veke” tê gotin (Seçen, 2011: 23). Di vir de ji gotina “qasî ku derfet hebe” diyar e ku ev biryareke Lijneya NYê ye û ti girêdareke dewletan a hiquqî tune ye (Sürmelî, 2015: 83). Fikraya 4an a di maddeya 4an vê danezanê de “Divê dewlet ji bo kêmarên ku di welatê wan de dijîn ziman, dîrok û kevneşopiyên

wan teşwîq bike. Divê ev kesên ku ji civata kêmar in karibin di der heqê tamam civakê de agahiyê dest bixin.” tê gotin.¹

Belgeyeke din a NYê jî Peymana li Dijî Cudahiya Perwerdehiyê ye. Ev belge di sala 1960î de derketiye. Di maddeya 5an a vê peymanê de mafê karanîn û hînkirina zimên dane kêmaran. Di vir de ev maf, ancax li gor polîtîkayên dewletê tê bikaranîn (Tacar, 1996: 42).

Belgeyeke din a NYê jî Peymana Mafên Siyasî û Medenî ye. Di maddeya 27an ya vê belgeyê de “Mafên jiyina çandê, eşkerekirina olê û karanîna zimên ên kêmarên etnîkî, olî û zimanî nayê astengkirin.” tê gotin (Seçen, 2011: 24). Di vir de qala mafê bikaranîna zimên dike lê bi awayekî eşkere qala perwerdehiya bi zimanê zikmakî nekirine.

Wek ku tê dîtin di belgeyên ku NYê parve kiriye de perwerdehiya zimên an jî perwerdehiya bi zimanê zikmakî bi awayekî eşkere nehatiye gotin. Di yên ku hatine gotin de jî şerdên wek “li gor derfatan” û “têkneçûna serdestiya neteweyî” hatine danîn. Ev şerd an şerh jî mixabin rê li ber çareseriyê girtiye.

b. Belgeyên Saziya Hevkariyê ya Ewlehiya Avrûpayê

Belgeya ewil a ku ev mijar tê de hatiye qebûlkirin Seneda Dawî ya Helsinkî ye. Ev belge di sala 1975an de derketiye. Mafê kêmaran di vê belgeyê de di çarçoveya mafên giştî yên mirovî de hatiye qebûlkirin. Di vir de ji dewletan tê xwestin ku bila ti cudahî di navbera gelên din û kêmaran ji hev tune be. Ev nêzîkatî di Belgeya Girtinê ya Vîyenayê de jî hatiye dîtin (Seçen, 2011: 28).

Belgeya SHEAyê ya ewil a ku mafê perwerdehiya bi zimanê zikmakî bi awayekî eşkere tîne zimên Belgeya Kopenhagê ye. Ev belge di sala 1990î de derketiye. Di maddeya 34an ya vê belgeyê de ji dewletan dixwaze ku kêmar bi

¹ Birleşmiş Milletler Genel Kurulu’nun 20 Aralık 1993 tarihli ve 47/135 sayılı Ulusal veya Etnik, Dinsel veya Dilsel Azınlıklara Mensup Olan Kişilerin Haklarına Dair Bildiri

zimanê xwe yî zikmakî perwerde bibin û zimanê xwe yî zikmakî hîn bibin. Lê di vir de qala “qasî ku mimkun be” tê kirin (Alpkaya, 2010c: 159).

Belheyeke din î girîng a SHEAyê Pêşniyarên Lahayê ên di Der Heqê Mafên Kêmaran ên Mafê Perwerdehiyê de ye. Di vê belgeyê de ev pêşniyar hatine kirin: (Alpkaya, 2010c: 160-161)

- Divê kêmarên netewî karibin saziyên taybet vekin û bi rê ve bibin; ev maf perwerdehiya bi zimanê zikmakî jî dike nav xwe,
- Divê di asta pêşdibistan û dibistana seretayî de perwerdehiya bi zimanê zikmakî bê kirin. Ji bilî vê divê zimanê fermî jî ji aliyê mamosteyên duziman ve bê hînkirin,
- Divê piraniya perwerdehiya dibistana navîn bi zimanê zikmakî bê kirin û dersên ku bi zimanê fermî tê dayîn jî ast bi ast were zêdekirin,
- Heger bixwazin û têra xwe hebin, divê perwerdehiya pîşeyî jî bi zimanê zikmakî bê kirin û divê pergal bi zimanê fermî jî bê piştrastkirin,
- Heger bixwazin û têra xwe hebin, divê ev kes li zanîngehê jî bi zimanê xwe perwerde bibin û sûdê ji saziyên zanîngehê wergirin,
- Her wiha divê dewlet ji bo amadekirina bernamêyên perwerdehiya bi zimanê zikmakî rê vekin.

Ji van agahiyan jî xuya dibe ku maf û girîngiya perwerdehiya bi zimanê zikmakî di belgeyên SHEAyê ciheke girîng girtiye. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî ji kêmaran re bi awayekî eşkere hatiye xwestin.

c. Belgeyên Konseya Avrûpayê

Du belgeyên girîng ên ku KAYê ji bo mafên kêmaran qebûl kiriye hene. Ev Peymana Çarçove ya Parastina Kêmarên Netewî û Şerdê Avrûpayê yê Zimanên Kêmar û Herêmî ne. Wexta ku em li Peymana Çarçoveyê dinêrin fikraya 1em a di maddeya 10an de diyar dike ku mafê kêmaran ê karanîna zimanê xwe di qadên fermî û taybet de heye. Di fikrayên maddeya 14an de jî mafê perwerdehiya zimên û perwerdehiya bi zimanê zikmakî hatiye qalkirin. Di fikraya yekem a maddeya 4an de hînbûna zimanê zikmakî ji kesên kêmaran e hatiye tahutkirin. Di fikraya 2 û 3yan a

heman maddeye de ji dewletan hatine xwestin ku li gor derfetan perwerdehiya bi zimanê zikmakî bidin kesên kêmar (Seçen, 2011: 26).

Di beşa 3yan a Şerdê Avrûpayê yê Zimanên Kêmar û Herêmî de qala perwerdehiya bi zimanê zikmakî tê kirin. Di fikrayên a, b, c, d, e, f a di maddeya 8/1ê de qala perwerdehiya ji pêşdibistanê heta heta perwerdehiya ji mezinan re didome, dike. Mînak di fikraya “b”yê de qala perwerdehiya herî maqûl a kêmaran dike;

- Pêkanîna perwerdehiya dibistana seretayî bi zimanên herêmî û zikmakî,
- Pêkanîna perwerdehiya bi zimanên herîmî û zikmakî di piraniya bernameyê de di dibistanên seretayî de bê kirin,
- Pêkanîna perwerdehiya bi zimanên herîmî û zikmakî di bernameyên sereke de li dibistanên seretayî de bê kirin,
- Ji van her sisêyan ya herî maqûl bê kirin. ²

Divê neyê jibîrkin ku ev belgeyên di der heqê zimanê zikmakî de derketine ne girêdar in, ên ku girêdar in jî çarçoveyên wan qels in. Mixabin wexta ku dewlet biryarên van belgeyan bi cih nînin rastî ti cezayan nayên û her wiha ti sazî tune ne ku kêmar jî nikarin ji bo van mafên xwe serî lê bidin (Orhan, 2012: 81).

Dema ev agahiyên di der heqê zikmakî de bê nirxandin, dê bê dîtin ku nebûna perwerdehiya bi zimanê zikmakî wek cudahiyekê nayê dîtin. Bi kîjan zimanî be jî, heger perwerde hatibe kirin, ev ji bo wekheviya kêmar û kesên din bes tê dîtin. Lê belê hînkirina perwerdehiya zimane zikmakî bi awayekî bi hêz hatiye pêşniyarkirin. Ev pêşniyar jî ji bo parastina çanda kêmaran hatiye stendin. Pêşniyara perwerdehiya bi zimanê zikmakî jî ji bo wekheviya fersend pêk were hatiye kirin. Di aliyê din de jî heger di destpêka dibistanê de perwerdehî bi zimanê zikmakî bê kirin û jê pê ve neyê kirin, ev jî tê wateya ku mafê perwerdehiyê hatiye bînpêkirin (Gul, 2009: 28, Vgh. Ayan&Koçbaş, 2009: 11).

2.1.2. Perwerdehiya Duzimanî

² Şerdê Avrûpayê yê Zimanên Kêmar û Neteweyan, 5ê Mijdarê 1992an

Bi serdestiya welatan a di erdnigariyên cuda û berfireh de, bi globalbûna cihanê re zêdebûna koçberiyê, guherîna sînorên welatan a bi Şerê Cihanê yê yekemîn û duwemîn hema hema di her welatî de ji her çand, ziman, ol û rengî mirov hene (Sîncar, 2015: 32). Ev qewimîn gelek guhertin û pêdiviyên bi xwe re aniye. Êdî gelên ku li van welatan dijîn pirçand û pirziman mezin dibin û jiyana xwe bi vî awayî dewam dikin. Ji ber vê cûrbicûriyê serdest jî pergalên xwe li gor vê rewşê amade dikin. Yek ji wan pêdiviyên girîng jî perwerdehî ye. Ji ber parastina pirzimanîyê û sedemên wek serkeftina zarokan, aşitiya navxweyî, mafên xwezayî û mirovî modelek bi navê perwerdehiya duzimanî derdikeve pêşberî me.

Perwerdehiya duzimanî, ew perwerdehiya ku ji du an jî du zimanan pirtir tê kirin e. Ji bo ku bernameyek bibe duzimanî divê tê de hem zimanê zikmakî Z1 û hem jî zimanê serdest Z2 hebe. Ev jî mîna dersên wek Matematîk, Dîrok, Erdnîgarî hem di Z1ê û hem jî Z2an bê kirin e. Perwerdehiya zimanê kurdî nabe perwerdehiya duzimanî yan jî perwerdehiya bi zimanê zikmakî. Loma qesta perwerdehiya duzimanî ne hînkirina zimên e, di wî zimanî kirina dersên din e jî.

Piştî çarîka duwemîn a sedsala 20î ber bi welatên demokratîk koçberî çê bûye, ev bûyer bandora xwe li bernameya pergala perwerdehiyê kiriye. Di dawiya vê koçberiyê de gelek ziman û etnîkên cuda neçar mane ku bi hev re bijîn. Welatên wek DYA û Kanada yên ku her tim rastî koçberiyê tînin, Almanya ku ji welatê Deryaya Spî koçberan qebûl dike û welatên wek Fransa û Swêdê modelên perwerdehiyê yên duzimanî û pirçandî ava kirine (Ozdemîr, 1988).

Dîroka perwerdehiya duzimanî bi sedsala 20î ne sînorkiriye. DYA di vê mijarê de welatê herî balkêş e. Perwerdehiya duzimanî li vir di salên 60î de dest pê dike, li Gallerê di 1939an de, li Kanadayê di 1965an de dest pê kiriye (Baker, 1997; Casanova, 1991; Vgh. Tulu, 2009: 79).

Zimanzan Veogelîn ne li ser zimanekî, li ser giringiya herêmeke erdnîgarî disekine. Li gor wê jî dêvla ku mirov li ser zimanekî bixebite, divê li ser zimanê wê herêmê tevan bisekine. Di heman demê de divê plansazî ne li gor zimanekî, divê li gor her zimanê ku li herêmê heye bê kirin (Kaplan û Baldauf, 1997; Vgh. Ayan û Koçbaş, 2009: 19). Em dikarin bêjin di vir de qesta perwerdehiya duzimanî tê kirin.

Ango divê pergala perwerdehiyê ne li gor zimanekî, li gor zimanên din ên herêmê jî bê kirin.

Êdî em dibînin ku pewerdehiya yekzimanî di sedsala 21ê de kêr dimîne û pêdiviya her civakî bi perwerdehiya duzimanî heye. Nêrîna me yê li hember perwerdehiya duzimanî wek dara banyanê tevlihev e; Hem dihêle ku bi her alî ve mezin bibe, hem jî xwe dispêre rastiyan civakî ên ku tê de cih digire. Çawa ku duzimanî fersenda bijartinê dide mirovan, perwerdehiya duzimanî jî pirtir fersendan dide mirovan çunkî xwedî gelek alternatîf e (Garcia, 2009: 17-18, Vgh. Gozukuçuk, 2015: 45).

Li ser perwerdehiya duzimanî xebatên herî girîng jî Jim Cummins û Nancy Hornberger in. Ev her du pedagog li ser duzimanîyê teoriyan pêş xistine û nêrîneke nû anînen li ser vê mijarê. Teoriya Jim Cummins “pêwendiyên zimanan” û “vegühestina di navbera zimanan de” ji aliyê Nancy Hornberger hatiye pêşxistin û teoriya bi navê “Di Du Zimanan de Xwendevanî” pêş xistiye. Em dikarin bêjin ku xebatên van her du teorîsyenan rê li ber xebatên perwerdehiya duzimanî vekirine. Her wiha Cummins û Hornberger ji bo perwerdehiya duzimanî rêberên baş in (Ayan û Koçbaş, 2009: 18).

Taybetiyeke din a perwerdehiya duzimanî jî felsefeya perwerdehiyê û armancên bernamaya perwerdehiyê ye. Bi bernamaya duzimanîyê duzimanîbûna zarok an yekzimanîkirina zarok tê armançkirin? Ango zêdekirina zimanan an kêmkirina zimanan tê armançkirin? Di vî warî de perwerdehiya duzimanî li gelek welatan bûye nîqaşeke sosyo-polîtîk. Li gorî lêkolînên hatine kirin perwerdehiya duzimanî kêrê zarokên ku ji zimanekî din tevli pergale bûye hatiye (Cummins, 1991, Vgh. Kaya û Aydın, 2014: 54).

2.1.3. Çend Modelên Serekê yên Perwerdehiya Duzimanî

Modelên perwerdehiya duzimanî li gor welatan diguhere. Li her welatî heman model nayê bikaranîn. Ev li gor rewşa polîtîk, çandî, siyasî û zimanî ya welatan diguhere. Her welat van cudahiyan dide ber çavan û li gor nêrînen xwe yê cihanê modelekê derdixin holê.

Ji ber vêya gelek modelên cuda yê perwerdehiya duzimanî yan jî pîrzimaniyê hene. Di van modelan de carinan zimanê zikmakî ji bo derbasbûna perwerdehiya zimanê din tê bikaranîn, di modelên din de jî bi her du zimanan perwerdehî tê kirin. Modelên derbasîyê di bin navê entegrasyonê bişaftinê tê armançkirin û di modelên din de jî parastina zimanê din hatiye armançkirin. Ji bo sepandinê û encamên van modelan li gelek aliyên cihanê lêkolîna cûrbicûr hatine kirin. Van lêkolînan îhtîmal û rojevên modelan bi me daye nîşandan. Her wiha bi saya van xebatan encamên ku hatine armançkirin bi awayekî zelal derketiye holê (DISA, 2011: 4).

Em ê di vir de li ser çar modelên perwerdehiya duzimanî tê kirin bisekinin. Ew model jî ev in; modela derbasîyê, modela parastinê, modela dewlemendkirî û modela duzimanîkirinê.

2.1.3.1. Modela Derbasîyê

Di vê modelê de perwerdehî bi Z1ê yan jî bi zimanê zikmakî dest pê dike û dû re bi zimanê serdest dewam dike. Di modelê de bi demê re dibe ku dev ji zimanê zikmakî bê berdane an jî dibe ku di pêvajoya perwerdehiyê de dewam bike (Yalinkiliç û yê din, 2014: 163).

Bi îfadeyeke din jî ji bo derbasbûna Z2yê ya zarokên ku ji Z1ê hatiye tê bikaranîn. Ev model ji salekê heta sê salan jî dibe ku dewam bike. Xwendekar hinek bernameyan bi zimanê xwe û hinekên din jî bi Z2yê dibine. Piştî vê serdemê êdî temamî dest bi perwerdehiya bi Z2yê dibe. Ev model modela herî lawaz a perwerdehiya duzimanî tê qebûlkirin. Armanç ew e ku zarok zimanê xwe hîn bike û dû re bi temamî derbasî Z2ê kirin. Mirov vê modelê herî zêde li DYAyê rast tê. Bi taybetî jî ji bo zarokên latînî hatiye bikaranîn. Di vir de perwerdehiya îspanî û dû re jî entegrasyona wan li DYAyê tê armançkirin (Hornberger, 2008, Vgh. Kaya&Aydın, 2014: 59-60).

Li gorî hin lêkolîneran armanca vê modelê, di bin navê entegrasyonê de zûkirina bişaftinê ye. Çunkî xwendevanî zû pêk were jî newekheviya perwerdehiyê û

cudahî ji holê ranabe, hînbûn û parastina zimanê zikmakî pêk nayê û di hînbûna zimanê serdest de jî pirsgrêk dewam dikin (DISA, 2011: 4).

2.1.3.2. Modela Parastinê (Parastin)

Mimkun e ku mirov bêjê ev modela perwerdehiyê bi hêztir e. Di vê modelê de piraniya perwerdehiya bingeîn an jî herî zêde ji sedî 50yê dersan bi zimanê zikmakî çê dibe. Loma di vir de rêjeya zimanê serdest di binê ji sedî 50 re ye. Ji ber ku piraniya perwerdehiyê bi zimanê zikmakî tê kirin, di vir de serkeftina akademîk a zarokan tê armançkirin. Dîsa di vir de herî kêr 4 salan perwerdehiya zimanê zikmakî tê armançkirin. Hînkirina galceyî ya li Îngîltereyê, hînkirina katalanî ya li Îspanyayê û hînkirina fransî ya li Kanadayê ji modela parastinê re mînakên herî baş in. (Kaya û Aydın, 2014: 61).

Di vir de esas armanç pêşxistina zimanê zikmakî yê kêmaran e. Zimanê serdest ewilî wek darsa hînkirina dersê tê dayîn û dû re jî dibe zimanê dersên bingeîn. Bi vê modelê ew derfeta ku her du ziman pêş keve ji bo xwendekaran tê dayîn (Yalinkiliç û yêrî, 2014: 163). Li gorî lêkolînên ku hatine kirin, modela parastinê ji modela derbasîyê baştir e û encamên gelekî baştir derketine holê (DISA, 2011: 5).

2.1.3.3. Modela Dewlemendkirî

Di vê modelê de wek modela parastinê, ne tenê parastin û dewamkirina zimanê zikmakî, her wiha belavkirina wî zimanê kêmar a li civakê ye jî (Hornberger, 2005, Vgh. Kaya û Aydın, 2014: 62). Mînak modelek ku kesek bixwaze zimanê kêmaran hîn bibe tê amadekirin. Di vê modelê de qebûlkirina cudahiyê jî esas tê girtin. Bi vê modelê newekheviyên perwerdehî û civakî jî tê kêmkirin û wendabûna çandên cuda jî tên astengkirin (Kaya û Aydın, 2014: 62).

Ji bo kesên ku zimanê xwe yî zikmakî nizanin, bernameyên wekî din tê hazîrkirin û bi saya vêya zarok zimanê xwe jî baştir hîn dibe (Mertcan û Şeker, 2014: 141).

2.1.3.4. Modela Duzimanîkirinê (Dakirinê)

Ev modela ku bi navê xwe yî îngîlîzî “immersion” e, piranî ji aliyê malbatên çîna navîn tê tercîhkirin. Çi ji aliyê qalîteya perwerdehiyê, çi pêşketina pîrzimaniyê gelek encamên baş daye. Di vê modelê de her du ziman jî xwedî girîngiyekê ne û ev ziman ji aliyê civakê jî tê piştgirîkirin. Mirov ne tenê bi zimanê xwe, di zimanê duwemîn de jî perwerde dibin, mamoste duziman in û li hember zimanê zikmakî yê zarokan rêzdar in. Mînakê herî baş a vê modelê duzimanîkirina(fransîzî&îngîlîzî) Kanadayê ye. Ji aliyê din ku ev model li herêmek ku cudahiya zimanê fermî û zimanê kêmaran hebe de bê sepandin, dê bişibe modela yekzimanîkirinê. Ango dê zimanê zikmakî yê kêmaran bê îhmalkirin û ev ziman her ku biçe dê bê jibîrkirin (DISA, 2011: 5).

Bê guman ev modelên ku li jor hatine vegotin, bêtir ku mirov baş li ser bifikire nayê sepandin. Her wiha nêzîkatiya ku li her herêmê dê yek bê bikaranîn jî şaş e. Dêvla vêya mirov dikare ji bo herêmekê qala modelên ji hev cudatir bike. Xala ku divê bal li ser hebe ev e ku divê ew cihê ku dê perwerde lê çê bibe baş bê nasîn û amadekarî li gor wê bê kirin. Nayê wê maneyê ku modelek piştî ku carekê hat sepandin û pê re her tim wek xwe bimîne. Li gor pêdiviyên dibe ku bê guhertin û heta dibe ku derbasî modelek din jî bibe (DISA, 2011: 6).

Bi taybetî jî divê li cihê ku dê model bê sepandin li gor modelê amûr û materyal hebin. Ji bo amadekirina van amûr û materyalan jî divê pispor û tîra xwe jî çavkaniyên madî hebin (Demîrlar, 2007).

2.1.4. Modelên Duzimaniyê yê Çend Welatan

Her welatên cihanê pergala xwe yî perwerdehiyê bi awayekî cuda pêk tînin. Ev pêkanîn li gor polîtîka, îdeolojî, armanç, felsefe an jî li gor rastiya welatan çê dibe. Ango li her welatên cihanê pergalek tenê ya perwerdehiyê pêk nayê. Piştî ku ew feraseta pîrrengî, pîrzimanî an jî pîrçandî ji aliyê welatan ve tê mehandin, ev welat dest bi perwerdehiya duzimanî dikin û bi vî awayî nahêlin ku zimanên kêmaran an jî neteweyên din wenda bibin.

Em ê di vê beşê de modela perwerdehiyê ya çend welatan bidin nasîn. Ev welatên ku em ê modela wan a perwerdehiyê bidin nasîn, modela duzimaniyê û li

hinek welatan jî ya pirzimaniyê disepînin. Ji bo vê lêkolînê welatên çend welatên Awrûpa, Amerîka, Çîn, Îsrâîl û Qraliyeta Yekbûyî hat bijartin. Her yek ji wan li gor şert û mercên xwe modelek li dar xistine.

2.1.4.1. Îspanya

Li Îspanyaya ku gelek ziman û çandên cuda di xwe vedihewîne de ji bo nasnameyên cuda gelek guhertinên bingeîn pêk hatiye. Francoyê ku ji sala 1939an heta 1975an rêveberiya welêt di destê wî de ye, welêt kiriye serdemekî tarî ku hemû mafên demokratîk hatine qedexekirin. Di vê serdemê de hemû nasnameyên ji bilî îspanyolan hatine qedexekirin û rastî zextên tund hatine (Egitim-Sen, 2010a: 119).

Piştî mirina Franco li Îspanyayê di sala 1978an de makezagonê nû hatiye çêkirin û bi vê makezagonê hin mafên kêmaran hatine parastin. Lê belê zimanê fermî jî wek îspanyolî di makezagonê de hatiye destnîşankirin (Sîguan, 1992, Vgh. Kaya û Aydin, 2014: 80).

Heta sala 1980yî jî li Îspanyayê zimanê perwerdehiyê tenê îspanyolî ye, lê bi biryara ku di sala 1982an de hatiye stendin, welat bi pergaleke nû ya îdarî herem û herem ji hev veqataye. Bi pergala ku hatiye guhertin re Katalonya, Bask û Galîçya bûne heremên xweser (Barrett û Malley, 1995, Vgh. Kaya û Aydin, 2014: 82).

Li Katalanyayê di sala 1983an de zagona bi navê “Zagona Normalkirina Zimanê Katalanî” hatiye derxistin. Di vê zagonê de perwerdehî xwe dispêre du krîterên bingeîn . Ya ewilî azadiya bijartina zimanê perwerdehiyê û ya duyan jî rêgirtina li ber cudahiyên zimên e. Di vê pergalê de mamoste neçar in ku bi her du zimanan jî zanibin, dê xwendekar jî di bijartina zimanê perwerdehiyê de azad bin. Lê zarok îspanyolî bibijêrin dê katalanî û katalanî bibijêrin dê îspanyolî jî wek derseke mecbûrî bistînin. Ji bilî vana, dê hînbûna ji fransîzî yan jî îngîlîzî yek jê bê teşwîqkirin (Egitim-Sen, 2014: 21-22).

Li Herêma Baskê jî wek heremên din hem xwedî dibistanên dewletê hem jî yên taybet in. Li dibistanên Baskê bi statuya dibistanên taybet dest bi perwerdehiyê kirine û zimanê xwe yî zikmakî baskî esas girtine. Lê belê ev dibistanên taybet bi dibistanên dewletê re entegre bûne. Li vir jî wek Katalonya ji bo her dibistanê

perwerdehiya duzimanî esas hatiye girtin. Li gor vê pergalê zimanên herêma heftê herî kêr 3-5 ders ketiye plansaziyê. Lê ev pergal ew qas bi hêsanî nehatiye meşandin, ji ber kêmbûna mamosteyên basqîxê, ev pergal rasti astengiyan hatine (Cenoz û Gorter, 2006; Gorter û Cenoz, 2004, Vgh. Kaya û Aydin, 2014: 83-84).

Li Galîçyayê jî di salên ewilî yê dibistana seretayî de îspanyolî tê bikaranîn, bi zimanên din ên herêma jî xebatên ji bo xwendin-nivîsandinê pêş bixe tê kirin. Xwendekar ji bo ku galîçyayî hîn bibin, di serdemên dawî yê dibistana seretayî de dersa hînkirina galîçyayî wek du dersan neçarî distînin. Di dibistana amadekiriye de ev ders dibe sê saet û dersên wek Zanist, Dîrok û Erdnîgariyê jî bi vî zimanî tê dayîn. Her dibistanên vê derê axaftina galîçyayî ya li her deverê jiyane ji xwe re kirine armanç (Kaya û Aydin, 2014: 83).

2.1.4.2. Îsraîl

Piraniya serhejmara Îsraîlê ji mûseviyan pêk tê, rêjeya axaftina bi zimanê îbranî jî ji sedî 82 ye. Li Îsraîlê ji sedî 18yê Îsraîlê bi ereb hene û bi erebî dipeyivin. Li vê dere zimanê erebî xwedî statuyeke taybet e (Egitim-Sen, 2010a: 17).

Li dibistanên ereban zimanê esas erebî ye, lê îbranî wek zimanê duwemîn û îngîlîzî jî wek zimanê sêyemîn tê hînkirin. Li dibistanên mûseviyan jî zimanê perwerdehiyê îbranî ye lê zarok ji biçûktiya xwe ve îngîlîzî hîn dibin. Li vê derê gelek girîngiyê didin hînkirina îngîlîzî. Ji sedî 50yên xwendekarên mûsevî jî qasî sê salan dersên erebî distînin. Ji bilî van zimanan fransîzî, rûsî û yîdîşî jî li dibistanan tê hînkirin. Dibistanê Ji aliyê mûfredat û amûran ve baş in çunkî bi alîkariya zanîngehan ev pergal tê meşandin. Çi mûfredat, çi amûrên dersê her tim wek xwe namîne, ev li gor rewşê û li gor polîtîkayên perwerdehiyê tê guherîn. Ji bo materyal û hînkirina dersên din jî ji tecrubeyên heremî jî sûde werdigirin (DISA, 2012: 10).

2.1.4.3. Qraliyeta Yekbûyî

Qraliyeta Yekbûyî ya ku ji îrlandayî, îskoçî û galleriyan pêk hatî ji dîrokê ve xwedî pir çand û pir ziman e. Ligel ku duzimanî rastiya jiyana rojane ye jî derbasbûna ji bo perwerdehiya duzimanî bi dijarî pêk hatiye. Hegemonyaya îngîlîzî û bişaftina van

koman di nav çanda îngîlîzan de perwerdehiya duzimanî diwartir kiriye (Kaya û Aydın, 2014: 70).

Tekoşîna gelên ku nehatine nasîn u nayê dîtin van polîtîkayên kraliyetê yên çand û zimên guherandiye. Îro li çar heremên Qraliyetê perwerdehiya duzimanî tê kirin û bijartina zimanê perwerdehiyê jî ji xwendekar û malbatê re hatiye hiştin (Egitim-Sen, 2014: 120).

Wexta ku bi giştî li Qraliyetê tê nêrîn, li her çar hereman jî perwerdehiya duzimanî tê kirin û modelên vir jî li gor daxwaz û pêdiviyên civakê tê guhertin û li gorî herêman cudahî hene. Perwerdehiya duzimanî li Qraliyetê ji bo oryantasyona zarokên koçber tê kirin lê li Îskoçya, Îrlanda û Îrlandaya Bakur jî ji bo parastina çand û nasnameyê tê kirin. Îngîlîzî li her derê Qraliyetê wek zimanê yekemîn û zimanên heremî jî wek zimanê duwemîn tê qebûlkirin. Li Îskoçya, Îrlanda û Îrlandaya Bakur perwerdehiya duzimanî gelekî girîng e û ligel vêya di saziyên din yên dewletê de jî zimanên din hatine bikaranîn û di makezagonan de jî hatine parastin. Perwerdehî ji rêveberiyên heremî re hatine hiştin û ew li gor daxwazan bi rê ve dibin (Kaya û Aydın, 2014: 77).

2.1.4.4. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê

Li DYAyê di serdemên ewil ên mêtîngêriyê de perwerdehî bi zimanên ji bilî îngîlîzî dihat kirin. Di destpêka 1694an de DYAYiyên ku bi almanî dipeyivîn, bi almanî perwerdehî didîtin. Piştî pêşketina welêt êdî perwerdehiya duzimanî li gelek aliyên welêt bela bû. Eyaleta ewil a ku zagona perwerdehiya duzimanî derxistiye Ohîo ye. Pişt re eyaletên din jî belavkirina perwerdehiya duzimanî ji xwe re kirine armanc. Di salên 1800î de piraniyên welêt zimanên wek almanî, çekî, norveçî, fransîzî û îspanyolî dihat bikaranîn. Zimanê fermî yê DYAYê tune ye û ji mêj ve perwerdehiya duzimanî tê sepandin (Uscis, 2010, Vgh. Kaya û Aydın, 2014: 66).

Bernameyên perwerdehiya duzimanî li her eyaleta cuda ne. Ji dîroka welêt ve eyaletên wek Texas, Kalîfornîa, Connecticut, Illînoîs, Îndîana, New York, New Jersey û Washington perwerdehiya duzimanî ferz kirine. Niha jî tenê li eyaletên wek

Texas, Illînoîs, New Jersey û New Yorkê ferz e (Chrîstîne, 2009, Vgh Kaya û Aydin, 2014: 68).

Bernameya herî zêde ku li New Yorkê tê sepandin Modela Derbasiyê ye Di vir de zarokên ku hînî îngîlîzî dibin û piçekî jî îngîlîzî zanin hem îngîlîzî hem jî bi zimanê xwe yî zikmakî perwerde dibin. Di vir de armanç di salên ewilî de perwerdekirina zarokên ku zimanê wan î zikmakî nizanin e. Di heman wextî de xwendekar hînî îngîlîzî jî dibin lê armanca esas xwendevaniya bi zimanê zikmakî ye û pê re veguheştina îngîlîzî ye (Kaya û Aydin, 2014: 68-69).

Bernameya din a ku li New Yorkê tê sepandin Modela Du Alî ye. Di vir de hem zarokên ku îngîlîzî zanin, hem yên ku kêman zanin û hem jî yên ku hînî îngîlîzî dibin bi du zimanan perwerde dibin. Di pêşdibistanê û dibistana seretayî de perwerdehî ji sedî 90ê wê bi zimanê zikmakî yê xwendekar çê dibe. Îngîlîzî sal bi sal zêdetir dibe û dip ola pêncan de her du ziman jî qasî hev tê dayîn (New York State Education Department, 2001, Vgh Kaya û Aydin, 2014: 68-69).

Dibistana Serbixwe Texas La Porte a Heremî ji bo fêhmkirina asta perwerdehiya duzimanî a DYAYê mîna keke baş e. Li vê dibistanê jî xwendekar, mamoste û malabatan re perwerdehiyeke lêkolînê tê pêşkêşkirin. Di vir de du bername hene; ya ewil bernameya perwerdehiya duzimanî û ya din jî îngîlîzî tê de zimanê duwemîn e (Kaya û Aydin, 2014: 68-69).

2.1.4.5. Çîn

Li vî welatî gelek komên etnîkî hene û qasî 140 zimanî tê axaftin. Di sala 1984an de zagona “Xweseriya Heremên Kêmarên Netewî” derketiye. Bi vê zagonê hatiye diyarkirin ku hewce ye ku heremên xweser û zimanên heremî bên parastin û pêşxistin. Polîtîka û pergala perwerdehiyê ji aliyê heremenên xweser tê diyarkirin û sepandin (Egitim-Sen, 2010a: 15).

Li vê derê hem zimanê mandarînî ê ku serhejmara wan ji sedî 90ê Çînê pêk tîne mandarînî, hem jî hemû zimanên kêmaran wek zimanê fermî tê qebûlkirin. Di pergala perwerdehiyê ya ku niha tê sepandin de mafê parastina çand û zimên tê qebûlkirin. Dibistanên vê dere wek “dibistanên etnîkî” û dibistanên normal tê

binavkirin. Zarokên ku dixwazin di dibistanên normal de perwerde bibin hewce ye ku mandarînê hîn bibin û pê re jî îngîlîzî û zimanên din hîn dibin. Zarokên ku bixwazin di dibistanên etnîkî de perwerde bibin, dê bi zimanê heremî perwerde bibin û her wiha mandarînê jî dê bibe zimanê wan î duwemîn. Hin dibistanên etnîkî zimanê sêyem jî tevî pergala xwe dikin (Aydin, 2013:145).

2.1.4.6. Almanya

Di makezagona Almanyayê de ti madeyeke ku zimanê welêt diyar bike tune ye. Biryara zimanên ku di qada fermî û perwerdehiyê de tê bikaranîn ji aliyê rêveberiya heremî ve tê dayîn. Bernameya bikaranîna mafên çand û zimên ên kêmaran ji rêveberiya heremî re hatine hiştin. Mînak li gorî Makezagona Eyaleta Branderburgê : Mafên çand û zimên ên gele sorb di bin berpirsiyariya rêveberiya heremî de ne (Federal Mînistêr of the Interior, 2010, Vgh. Kaya û Aydin, 2014: 89).

Ew fikra ku ji bo zarok almanî hîn bibin, divê ji zimanê xwe dûr kevin ji holê rabûye. Û pê rev li welêt nêzîkatiya bi navê “Plana Lihevkirina Netewî” hatiye qebûlkirin. Bi vê armancê di dibistana navîn de modelên “ perwerdehiya zimên a berawirdikirî” hatiye pêşxistin û ceribandin (Egitim-Sen, 2010a: 14).

Almanya ji 16 eyaletan pêk tê û eyalet pergala xwe li gor xwe pêş dixin ev revaya wan heye. Li Bremenê perwerdehî bi duzimanan tê kirin lê wexta ku pîrsgirêka demî hebe, hin ders ji mufredatê derdixin. Li Ren-Vestfalyaya Bakur dip ola 5emîn û 6emîn de du zimanê biyanî tê hînkirin, dip ola 7 û 8emîn de derseke din li bernameyê zêde dikin (TEL2L, 2012, Vgh. Kaya û Aydin, 2014: 89). Li Almanyayê hejmara dibistanên ku perwerdehiya duzimanî dikin 600 e. 150 jê dibistana seretayî ne (Hollunder, 2011, Vgh. Kaya û Aydin, 2014: 90).

2.2. Modela Perwerdehiya Yekzimanî Li Tirkiyeyê

Bîrdoziya serdest, ku li Tirkiyeyê di salên 1920î de di avakirina netewe-dewleta tirk de şeweya xwe girt, bû hêmana netewperestî ya ku rê li ber dewleta tirk vedike. Bi avabûna komarê ya bi bîrdoziya netewe-dewletê û polîtîkayên li ser zimên bandora xwe li ser perwerdehiya bi zimanê zikmakî ya kêmar û gelên din jî kiriye.

Di xala 42an a makezagonê de mafê giştî yê perwerdehiyê hatiye diyarkirin. Lê belê dîse li gorî vê xalê “ji bilî tirkî, ti zimanekî din li saziyên perwerdehiyê ji hemwelatîyê tirk re nadin xwendin û hînkirin.” Di berdewamîya heman xalê de hatiye diyarkirin ku “esasên xwendinkirina zimanên biyanî û dibistanên ku bi zimanê din perwerdehiyê dîkin bi zagonan bê sererastkirin. Hukmên peymanên navnetewî veşartî ne.” Li gor vê xalê karanîna zimanên din, di rewşên ku dikeve çarçov peymanên navnetewî de mimkun e. Tenê du peyman hene ku vê rewşê li Tirkîyeyê ferz dike: Peymana Aştiyê ya Lozanê û Peymana Dostaniyê ya ku di navbera Bulgarîstan û Tirkîyeyê hatiye çêkirin (Terzioğlu, 2007: 184).

Mafên kêmarên li Tirkîyeyê li gorî Peymana Lozanê hatine diyarkirin. Di Peymana Lozanê kêmar li gor olê hatine pênasêkirin û wek “gayrîmuslîm” hatine binavkirin. Ji ber vê jî Tirkîye tenê rûm, ermenî û mûseviyan wek kêmar qebûl dike. Loma ye ku kurd ji aliyê mafê perwerdehiyê ne wek tirkên û ne jî wek kêmaran nebûne xwedî mafekî (Kaya û Aydın, 2014: 112)

Bi kurtasî îro Tirkîye ji bilî kes an kêmarên ku di Peymana Lozanê û Peymana Dostaniyê ya bi Bûlgarîstanê de hatine sînorkirin nas nake. Ev jî hemwelatîyên tirk ên wek rûm, ermenî, mûsevî û bûlgar in. Loma ji bilî van kêmaran ti kêmar ne xwediyê mafê perwerdehiya bi zimanê zikmakî ne û kesên din nikarin vî mafê xwe bi kar bînin (Coşkun û yê din, 2010: 36).

Me di mijara xwe de jî anîbû zimên gelek belgeyên navnetewî hene ku rasterast nebe jî qala perwerdehiya zimên û perwerdehiya bi zimanê zikmakî dihat kirin. Lê belê Tirkîye yan nebûye alîgirên van belgeyan an jî bi şerh van belgeyan qebûl kiriye. Di van belgeyan de pêşniyara perwerdehiya bi zimanê zikmakî tê kirin û li hember cudahiya karanîna mafê zimên disekine. Peymana Mafên Zarokan yek ji van belgeyan e. Tirkîyeyê ev peyman li gor makezagona xwe û li gor rihê Lozanê qebûl kiriye (Coşkun û yê din, 2010: 36).

Di belgeyên NYyê de jî ti gotinek ku rasterast mafê perwerdehiya bi zimanê zikmakî bide tune ye, lê hin mafên ji bo kêmaran hatine xwestin hene. Yek ji wan belgeyan Peymana Navnetewî ya Mafên Siyasî û Medenî ye. Tirkîyeyê carek din li gor makezagona xwe û Peymana Lozanê şert daniye ber madeya 27an a vê peymanê. Her

wiha Tirkiye nebûye alîgirê Peymana Li Dijî Cudahiya Perwerdehiyê ya NYyê û Şertê Avrûpayê yê Zimanên Herêmi û Kêmaran û Peymana Çaroçove ya Parastina Mafên Kêmarên Netewî (Surmeli, 2015: 119).

Piştî sala 2002an bi pêvajoya endambûna YAyê ya Tirkiyeyê ji aliyê helwesta mafên kurdî ve hin guhertin çê bûn. Ev guhertin bi xwe re di nava vê pêvajoya berfireh de guhertinên zagonî jî anî. Ev guhertin ne ji bo perwerdehiya bi zimanê zikmakî, piranî li ser hînkirina kurdî bûn.

Di sala 2002an de maddeya yekem û duwem a Zagona Hînkirina Zimanê Biyanî a 2923an hate guhertin û bû Zagona Hînkirin û Hînbûna Zimanê Biyanî û Zarava û Zimanên Cuda a Hemwelatîyên Tirk. Bi vê guhertinê bi şertê “îhlalnekirina yekbûna welêt” rê li ber qursên taybet ên zimanên biyanî hate vekirin û di Tîrmeha 2003an de êdî ji bo vekirina van qursan destûr hate dayîn (Orhan, 2012: 139).

Di sala 2012an de ji aliyê Wezareta Netewî ya Perwerdehiyê bi navê “Dersên Bijarte” genelgeyêk hat weşandin. Li gor vê genelgeyê zarok di dibistanên navîn de karîbûn 8 dersên bijarte bixwazin. Di vê genelgeyê de dersa kurdî rasterast nehatiye qalkirin lê di bin navê Zarava û Zimanên Zindî de zarok dikarin kurmancî û zazakî hîn bibin (Kaya û Aydın, 2014: 123).

Ji bo mamosteyên ku dersê bidin hin hewldan hat kirin. Zanîngeha Artûklûyê û ya Bingolê bernameyên lisansa bilind vekirin. Zanîngeha Bingolê piranî li ser Ziman û Çanda Zazakî û Zanîngeha Artûklûyê jî li ser Ziman û Çanda Kurdî dixebitîn. Piştî van zanîngehan li Zanîngeha Alparslanê beşa lîsansê a Ziman û Çanda Kurdî hat vekirin û pê re Zanîngeha Dicleyê dest bi stendina xwedekarên lisansa bilind kir (Kaya û Aydın, 2014: 123).


Digel van guherînên makzagonî û her çiqas mijara perwerdehiya bi zimanê zikmakî bi her awayî di rojê de gel û saziyên cihanê de ye, li Tirkiyê perwerde bi giştî yek zimanî ye. Lê divê neyê ji bîr kirin ku Tirkiye welatekî pir çand û pir ziman e û mafê perwerdeya bi zimanê zikmakî ji aliyê kurdan û hin kêmteweyan tê xwestin. Loma ye ku divê Tirkiye pergala xwe ya perwerdehiyê li gor vê rastiya xwe ava bike.



BEŞA SÊYEMÎN


NÛVEYÊN LÊKOLÎNÊ

Di vê beşê de analîza daneyan hatine kirin. Ev analîz li gorî bersiva mamosteyan hatine kirin. Di lêkolînê de 4 mijarên sereke hene; Pirsgerîek xwendekaran ên zimên, pirsgerîek xwendekaran ên ragihandinê, pirsgerîek xwendkeran ên lihevkerina pol û dibistanê û fikr û tecrubeyên mamosteyan. Di bin van mijaran de li gorî bersivên mamosteyan tespîtên sereke hatine kirin. Ev tespît li gorî mijarên xwe hatine dabeşandin û di binê van binbeşan de me cih daye bersiv û şîroveyan mamosteyan.



Grafîk 1: Hejmara Zimanê Zikmakî yê Mamosteyan

Ji bo vê lêkolînê bi 24 mamosteyan re hevdîtin hatine kirin. Hejmara zimanê zikmakî yê van mamosteyan li jêr di tabloyan de hatiye nîşandan. Her zimanê zikmakî yê van mamosteyan jî ji hev cudatir e. Ji van 24 mamosteyan 12 jê zimanê wan î zikmakî tirkî, 11 jê kurdî û 1 jê erebî ye.



Grafîk 2: Hejmara Zimanê Zikmakî ya Zarokan

Mamosteyên ku ji bo vê lêkolînê hatine axaftin çavdêriyên xwe li gor duzimaniya zarokan û bi taybetî jî li gor zimanê zikmakî yê zarokan anîne zimên. Cihê ku lêkolîn lê çê bûye piranî ji kurdan pêk tê lê ji ber çûyîn hatina hin kes an kêmarên din ji gelên din jî kes hene. Hejmara zimanê xwendekarên mamosteyên ku hevdîtî bi wan re hatine kirin 526 e. Ji wan 2 jê zimanê wan î zikmakî tirkî, 2 jê erebî û 522 jê jî kurdî ye.

3.1. Pirsgirêkên Xwendekaran ên Hunerên Zimên

Ji bo tespîtîkirina hunerên zimên ên xwendekaran di vê beşê de sê binbeş hat amadekirin. Ev binbeş wek ‘Hunerên Xwendinê’, ‘Hunerên Nivîsandinê’ û ‘Hunerên Fêhmîkirinê’ hat binavkirin. Di van binbeşan de ji mamosteyan re bi giştî 8 pirs hat pirsîn û bersivên mamosteyan hat rêzkirin û nirxandin. Li gor bersivên mamosteyan 8 tespîtên sereke hat kirin. Tespîtên ku hatine kirin bi bersivên mamosteyan û bi alîkariya tasvîrê hatiye piştrastkirin.

‘Zarok zimanê dibistanê bi kar nîne.’

Bi vê xebatê derket holê ku zimanê zikmakî girîngiya xwe li dibistanê jî dide der. Gelek mamoste ji ber cudabûna zimanê zikmakî yê xwendekaran anîn zimên ku

xwendekar piranî zimanê xwe yî zikmakî bi kar tînin, heta ku neçar nemînin qet tirkî napeyin.

Di navbera xwe de her tim bi kurdî dipeyivin. Ji bo ku tirkî bipeyivin ez pirsan ji wan dipirsin lê dîsa jî bi tirkî napeyivin. Êdî gelek caran ez wan ji bo ku tirkî bipeyivin hişyar dikim. (T04DM)

Zarok derveyî dersê jî tenê bi kurdî dipeyivin. Jixwe bi hevalên xwe re her tim bi kurdî dipeyivin. Carinan ji bo li mamosteyan rast neyên û bi wan re tirkî nepeyivin dûr dikevin. (K13DM)

Çend mamoste anîn zimên ku car caran bi zarokan re dixeyidin da ku zarok êdî hîn tirkî bibe û bi wan re tirkî bipeyive. Li ser vê tespîtê K12DJ van gotinan dibêje: “Pirê caran bi wan dixeyidim da ku di polê de kurdî nepeyivin. Ez wan serbest berdim ez zanim ku ti carî di polê de an jî li derve dê tirkî nepeyivin.” Heman tiştî T14DM jî tecrube dike û pê tê “Wexta ku ez hebim heta ku ji destê min tê nahêlim ku bi kurdî dipeyivin, lê çi bikim jî ji %95 bi dîsa bi zimanê xwe yî zikmakî dipeyivin.

‘Bi 3-4 peyvan tirkî dipeyive.’

Gelek xwendekar nikarin bi hest û fikrên xwe bi tirkî bînin zimên, li gorî hin mamosteyan yên ku tirkî dipeyivin jî bi kurtasî u bi çend peyvan dipeyivin.

Zarok di parvekirina hest û fikrên xwe de gelek pirsgerêkan dijî. Wexta ku dipeyive nizane ku dê kîjn peyvê bi kar bîne, wexta ku tîne zimên jî bi peyvên hêsan hest û fikrên xwe tîne ziman. Jixwe carinan peyvekê şûna peyveke dîne bi kar tînin. (T19DM)

Bi giştî 700 hestên mirov hene lê ev zarok ji ber ku zimanê dibistanê pir baş nizanin tenê hestên sereke ên wek hêrsbûn, kêfxweşî, kêmbûn û netêrî bi kar tîne. Wexta ku hestên xwe yî din jî nikare bi kar bîne xwe ne baş hîs dike. (K23DJ)

Hin mamoste diyar kirin ku wexta ku zarok nikaribe xwe îfade bike, dest bi zimanê zwe yî zikmakî dîkin an jî tirkî dipeyivin lê peyvên kurdî dîkin nav axaftina xwe. Hin xwendekar jî ji bo ku bê fêhmîkirin jest û mîmîkan bi kar tîne.

Zarok di zimanê dibistanê de nizane ku wê kîjan peyvê bi kar bîne. Wexta ku dixetî dest bi kurdî dike. Fêhm dike ku ez bi kurdî nizamîm êdî bêdeng dibe û napeyîve jixwe ev jî rê li ber kêmasiya xwebaweriyê vedike. (T04DM)
Carinan êdî neçar dimîne ku tirkî dipeyîve dest bi jest û mîmîkan dike û êdî zarok bi destan dipeyîve û dixwaze bê gotin bi vî awayî xwe bi min bide fêhmîkirin. (T06DJ)

Zarok dixwaze tiştin bêje lê nikare çunkî zimên nizane. Ez car caran wan jî liv û tevgerên wan fêhm dikim. Wexta ku dipeyîve dikeve tev û nizane ku dê çi bike, em bi çend peyvên li hev dikin ancax. (K10DM)

K11DM da zanîn ku naskirina zimanekî din a van zarokan ew dikin nîvziman û êdî nikarin bi ti awayî xwe îfade bikin û pê hat “Di îfadekirinê de pîrsgirêka herî mezin dijîn çunkî ev zarok hîn zimanê xwe yî zikmakî baş nizanin lê li dibistanê rastî zimanekî din tên. Bi vî awayî zarok her du zimanan tevlihev dike û di encamê de jî mixabin dibin nîv ziman. Carinan dixwaze tiştekî beje lê ji ber ku nikare beje hevalê xwe dişîne cem min da ku derde wî ji min re bêje.”

‘Ji ber ku tirkî nizane bêdeng dimîne.’

Gelek mamoste anîn zimên ku zarok ji ber ku tirkî nizanin bêdeng dimînin û xwe kêm hîs dikin loma ji cihê xwe tev nalivin.

Zarok ji bilî zimaê xwe yî zikmakî nikare hest û fikrên xwe bîne ziman. Ji ber hebûna vê pîrsgirêkê bi min re napeyîvin û wexta ez pîrsekê jî ji wan re dikim wek robota dişekînin û wisa li min dinêrin. (K15DM)

Hin xwendekarên min hene, ez baş zanim ku bi kurdî wek bilbila dipeyîvin lê ji ber ku tirkî nizanin qet napeyîvin. Heger ez wî nas nekim, ez ê bejim ev xwendekar ker û lal e û loma napeyîve. (K24DM)

Çend xwendekarên min hene ku ji ber ku nikarin hest û fikrên xwe bînin zimên, bêdeng dimînin û loma xemgîn dibin. Dibînim ku ew napeyîvin êdî ez diçim cem û hewl didim ku 2-3 gotin be jî bi wî bidim kirin. (T18DJ)

Çend mamosteyan anîn ziman ku car caran xwendekar ji ber ku nikarin xwe îfade bikin ditirsin û bêdeng dimînin. T14DM da zanîn ku “Xwendekareke min hebû û bavê wê mamoste bû. Carinan pîr dixwest ku tiştekî bêje û tilîka xwe radikir lê dû re ditirsiya ku nikaribe xwe îfade bike û tilîka xwe datanî dîsa. Xwe kêm didît û ev kêmdîtî lê dibû tirs.” Heman tirsê K21DM jî dibîne û dibêje “Di wextên ewilî de ji ber ku peyvên baş nizanin pîrsgirêkan dijîn. Wexta ku çend peyvên hîn dibe jî ji tîrsa hevalên xwe napeyîve çunkî difikire ku dê hevalên wî li wî bikene. Ji ber van tiştan êdî bawerîya wî bi xwe namîne û bi tîrs tev digere.”

Çend mamosteyên din anîn zimên ku hin xwendekarên wan ji ber ku napeyive û bipeyive jî nizane ku wê çi bêje, hevalên xwe ji xwe re dike tercüman û bi vî awayî xwe îfade dike.

Ji ber ku tirkî baş nizanin min fêhm nakin û ev jî ji wan re dibe derd. Carinan ji bo kum in fêhm bikin hevalên xwe ji xwe re dikin tercüman. Ji bo ku xwe îfade bike û tiştên ku ez dibêjim fêhm bike em tercumanan bi kar tînin. (T07DJ)

Pirê caran ew xwendekarên min î ku tirkî zanin ji yê nizanin re dibib tercüman. Ji ber ku kêr peyvan dizanin ew bi xwe napeyivin. Carinan tiştêkî ji wan dipirsim ku bipeyivin lê dîsa jî bang li hevalên xwe dikin û bi wî awayî bersivê didin. (A01DM)

‘Peyvan hêdî û şaş dixwînin.’

Çend mamoste da zanîn ku zarok ji ber ku di tirkî de qels e û tenê bi çend peyvan dizane, hêdî dixwîne û yek carna tîpan şaş derdixin. Di vir de jî dixuye ku zimanê zikmakî bandoreke mezin li ser xwendina xwendekaran dike.

Pirsgirêka mezin ev e ku zarok dengên baş dernaxe. Divê ewilî tirkî zanibin ku wan dengên baş û zelal derxin. Lomaa ye ku di kêtekirinan wan de pirsgirêk heye. Ango bi giştî em dikarin bêjin ku tirkî ji zarok re zimanekî nû ye û ji ber vê nûbûnê hunerên xwendinê qels dimîne. (T07DJ)

Ji ber ku zimanê zikmakî yê zarok cuda ye adaptasyona wan jî diwartir dibe çunkî zarok ji bo ku dengên nû nas bike û serê xwe pê diêşîne û ev jî adaptasyona wan xerap dike. Xwendin di perwerdehiyê de karekî girîng e û zarok hem zimên hîn dibe hem jî hînî xwendina wê dibe. Wexta ku ev her du kar bi hev re tên kirin zarok hêdî dixwîne û car caran şaş dixwîne. (T18DJ)

Dîsa çend mamoste anî zimên ku zarok êdî dengên nas bike jî, ji ber ku li derve pir bi kar nîne ji bîr dike û em jî her car lê vedigerin. Ango ji ber ku cihekî dengên ku nas dike di jiyana xwendekêr de tune ye tê jibîrkirin.

Di naskirina tîpan de pirsgirêkeke girîng tune ye. Lê ev jî heye ku zarok jiber dixwîne çunkî kêr caran li van peyvan rast tên. Carinan hefteyek li ser hînkirina me yî tîpekê derbas dibe û ez lê dinêrim zarok ji bîr kiriye. Ne neheq e çunkî tenê di vê polê de dibine van peyv û tîpan. (T04DM)

Zarokên ku tirkî zanibe xwendin jê re nabe pirsgirêk lê ji wan zarokên ku tirkî pir baş nizanin re pirsgirêk e. Carinan ez tîpekê an jî kêteyekê hînî wan dikim û hefteyek jî di ser re derbas nabe ji bîr dikin. Yê ku li derve jî tirkî dipeyivin ji bîr nakin lên yê din ji bîr dikin. Ev jî ji bo xwendina zarok astengek e. (K17DJ)

‘Dereng dest bi xwendinê dikan.’

Gelek mamoste anîn zimên ku zarok li gor mufredatê dereng dest bi xwendinê dikan û hin xwendekar heta dawiya salê jî bi xwendinê re mujil in. Hin mamoste gilî û gazine xwe dikan ku kare wan tenê bûye hînkirina xwendinê.

Ji aliyê demê ve em li rastî pirsgirêkan tên. Ango li gorî mufredatê zarok mehek an du mehan dereng dest bi xwendinê dikan çunkî zarok her tim bi zimanê zwe yî zikmakî dipeyve. Fêhmkirin û têgihiştana wî yî tirkî dereng dikeve loma xwendina wî jî dereng dikeve. (T03DJ)

Destpêkirina wî yî xwendinê li gor zarokên ku tirkî baş zanin du an sê mehan dereng dikeve. Ji ber ku zarok li mala xwe jî yan jî li derve jî tirkî napeyve ev bandora xwe li xwendina wî yî tirkî jî dike. Em pêşî tirkî hînî wan dikan û pê re ancax em dest bi xwendinê dikan. (T07DJ)

Pir dereng dest bi xwendinê dikan. Zarokên rojavayê welêt di dawiya serdema yekem de dest bi xwendinê dikan lê yên li vir di dawiya serdema dudan de. Em dikarin bêjin zarokên li vê derê serdemekê li pey hevalên xwe dimînin. Bê guman sedema vê ya herî mezin jî cudabûna zimanê zikmakî ya zarokan e. (K13DM)

‘Dixwîne lê fêhm nake.’

Em dikarin bêjin hemû mamosteyên ku me hevdîtin bi wan re pêk anî gilî gazine xwe herî zêde li fêhmkirina zarok dikarin. Li gor van mamosteyan zarok ji demekê şûn de çî qas xweş jî bixwîne qet jê fêhm nake û ev karê mamosteyan diwarti dike. Dikare bê gotin ku ew hunerên fêhmkirinê ya metnan ji ber sedemên zimên pêk nayê.

Hunerên wan î tiştên bixwîne fêhm bike pir qels e. Tiştê herî zêde min dibetilîne ev mijar e. Ez hewl didim ku bi metnên hêsan û pirsên van metnan rê li ber fêhmkirina wan vekim lê ez çî bikim jî wek min nabe. Zarok dangan an jî peyvan nas nake, zarokên kup eyvan nizanibe dê çawa fêhm bike. Jixwe ferheng ji destê min nakeve. Her carê peyvên ku wateya wê nizanin dipirsin û ez ji wan dibersivînim û heta ku zarok hînî wateya peyvê dibe, fêhmkirina metne tê jibîrkirin. (T05DK)

Wexta ku em dikevin mijarên fêhmkirinê ez jî û zarok jî dikevin tev çunkî zarok di tirkî de kêr peyvan dizane û loma ye ku tiştên ku dixwîne fêhm nake. Wexta kup eyvan nizanibe hêdi jî dixwîne û wexta ku hêdi jî dixwîne pir fêhm nake. (T07DK)

Pirsgirêka herî mezin ya zarokan fêhmkirina wan e. Wexta ku zarokên ku zimanê wan î zikmakî tirkî ye jî e fêhm nekin, dê ev zarok çawa fêhm bikin.

Em ji zarokên ku hîn nikare xwe îfade bike hêviya fêhmkirinê dikin, jixwe vê neheqiyê em li wan dikin. (K10DE)

Zarok ji bo ku fêhm bike pêşî hewl dide ku di mejiyê xwe de resm bike û paşê em peyvan bi wan didin hînkirin. Wexta ku ev pêvajo temam dibe hîn nû zarok dest bi fêhmkirinê dike ango têkiliyekê di navbera peyv û fêhmkirinê datîne jixwe ev jî zû naqewime û di wexteke dereng de çê dibe. Carinan di nava metnê de peyvên ku zarok nizane xêz dikim û ewilî wateyê wan peyvan dibêjim û piştî wî dihêlim ku bixwînin da ku fêhm bikin. (T20DE)

Li gorî T03DK zarokên ku du zimanan jî qasî ku xwe îfade bike zanibin xweştir û zûtir fêhm dikin û dibêje: “Bi rastî ev meseleya fêhmkirinê li gorî xwendekaran diguhere. Zarokên ku her du zimanan jî piçek zanibe metnan zû fêhm dikin lê zarokên ku zimanê xwe yî zikmakî û tirkî tenê bi çend peyvan zanibin fêhm nakin. Çend xwendekarên hene ku li malê jî car caran bi kurdî dipeyivin û li vir tiştan jî yên din baştir fêhm dikin. Lê rewşa zarokên ku li malê tenê bi kurdî dipeyivin ne pir baş e.”

Dîsa li gorî hin mamosteyan bandora pêşdibistanê jî li ser fêhmkirina zarokan heye. K24DE diyar kir ku zarokên ku diçin pêşdibistanê ji yên naçin baştir in û dibêje “ Di pola min de ev pirsgerêk bi giştî heye çunkî zimanê zikmakî ya tevan bi kurdî ye loma di tirkî de kêm peyvan zanin. Çend xwendekarên min hene çûne pêşdibistanê jî, ev xwendekar jî aliyê fêhmkirinê ji yên neçûne baştir in. Dîsa ew tiştên ku em ji wan hêvî dikin pêk nayê lê gelek caran hinek be jî fêhm dikin. Bi xwe ez bi zimanekî hêsan bi wan re dipeyivim, heger ez li gor xwendekarên ku zimanê wan î zikmakî tirkî ye bipeyivim, bawerim dê yên ku çûne pêşdibistanê jî min fêhm nekin.”

Hin mamoste jî anîn zimên ku ji bo ku xwendekarên wan î tirkî pir baş nizanin ji xwendina xwe fêhm bikin, piranî wêneyan bi kar tînin û dixwazin zarok bi şîrovekirina wêneyan fêhm bikin.

Hunerên fêhmkirinê ya zarokan pir qels e. Ancax li wêneyan dinêre û tiştin fêhm bike ango di metnekê de wêne tune be bawer nakim ku zarok fêhm bike. Carinan wexta ku ez metnek ku wêne tê de tune ye didim wan fêhm nakim û ez bi xwe çend wêneyan xêz dikim ku fêhm bike. Heger ev nebe jixwe di pola min de fêhmkirin dê çê nebe. (T06DK)

Zarok beranberî peyvan nizane ku fêhm bike. Di mejiyê zarok de wêneyek ku vê peyvê temsil bike tune ye. Xwendekrekî min heye, tirkî jî hinekî dizane û zû jî dixwîne lê ji xwendina xwe fêhm nake. Loma ez jî berî dayina her metnê

peyvên ku nizanin bi wêneyan nîşanî wan didim û paşê hinekî fêhm dikin.
(T09DE)

K23DK anî ziman ku tu pîrsgirêkeke van xwendekaran a ku fêhmnekirinê tune ye, esas pîrsgirêk zimanê dibistanê ye û pê re dibêje “Zarok piranî fêhm nake û heger fêhm bike jî dereng fêhm dike. Zarok tişteke ku di sê çar mehan de fêhm bike, ji ber astengiyan zimên ev dibe heft an heşt meh. Ango zimanê dibistanê wek astengiyekê xwe xistiye pêşiya zarok çunkî carinan tiştê ku ez dixwazim bêjim bi kurdî ji zarok re dibêjim û zarok fêhm dike. Heger ev bariyer ji holê rabe, bawerim dê fêhm bikin. Zarok gelek peyvan zanibe jî, wexta ku di jiyana xwe de bi kar nîne bê wate dimîne.

‘Ji bo nivîsandineke serbest wexteke zêde divê.’

Gelek mamoste anîn ziman ku zarok di hunerên nivîsandinê de jî qels in. Xwendekar tiştê ku dibine dinivîse lê tiştên ku dibihîse nikare binivîse, şaş an jî kêr dinivîse.

Di hunerên nivîsandinê de zarok tiştên ku dibine dinivîse le tiştê ku em jê re dibêjin nikare binivîse. Bi taybetî di nivîsandina tîpa “ğ”yê de pîrsgirêk heye. Bawerim ev tîp di kurdî de tune ye loma zarok şaş dinivîse. Carinan jî zarok tiştên ku em dibêjin li gor zimanê xwe fêhm dike û dinivîse. Mîna ku ez ji wan re dibêjim “eli ağrıyor” lê zarok wek “elisi ahırıyor” dinivîse. Çunkî zarok ji van deng û peyvan re xerîb e û di mejiyê xwe wergerê dike loma şaş dinivîse. (T08DK)

Di polê piranî di nivîsandinê rastî pîrsgirêkan tîm. Tiştên ku ji wan re dibêjim nikarin binivîsin çunkî zarok hîn nû van peyvan dibihîse û jixwe wateya wê jî nîzane loma şaş dinivîse û carinan jî kêr dinivîse. Carinan ji bo ku zarok fêhm bikin ez peyvê dubare dikim û zarok jî bi gotina min re dubare dinivîse. (K12DK)

Zarok ji ber cudabûna zimanê xwe yî zikmakî di nivîsandinê de gelek pîrsgirêkan tê çunkî van peyvan li vir dibîne û dinivîse. Heger ez tiştê ku ew pê zanin bibêjim dê xweş binivîsin. Lê xwendekarên min wexta ku dinivîse bala min li ser e ku tîpên dengdêr nanivîsin. Mîna ku ez ji wan re dibêjim “bisiklet” lê ew wek “bsklet dinivîsin. (T14DE)

Çend mamoste anîn ziman ku zarok tiştê dinivîse jî nikare bixwîne çunkî tiştên ku em jê re dibêjin ew li gor xwe resm dike an watedar dike loma nîzane ku çi nivîsandiye.

Bi min xwendin û nivîsandin bi hev re diçin, ez bi vî awayî dikim. Lê carinan em giraniya xwe didin xwendinê loma nivîs jî qels dimîne. Hin xwendekar wexta ku dinivîse kêr dinivîse, şaş dinivîse û ev jî ji ber cudabûna zimên e çunkî zarok kurdî difikire lê tirkî dinivîse. Ez carinan dixwazim ku tiştên ku wan nivîsandî ji min re bixwînin lê zarok hingê jî nikare bixwîne û wisa bêdeng dimîne. (T02DK)

Di nivîsandinê de pirsgirêkeke zêde tune ye lê tiştên ku dibihîse nikare binivîse çunki wan peyvan nizane û hîn nû dibihîse û dinivîse. Carinan ji bo ku fêhm bikin ez kurdî ji wan re vedibêjim lê hingê jî zarok dêvla ku tirkî binivîse li gor zimanê xwe yî zikmakî kurdî dinivîse. Jixwe gelek caran tîpên dengdêr nanivîsin û wexta ku ez dixwazim ew ji min re bixwînin nikarin çunkî ji ber ku kêr nivîsandine, kêr dixwînin jî. (K11DE)

Gelek mamosteyan anîn ziman ku ev xwendekarên ku zimanê wan î zikmakî ji zimanê dibistanê cudatir in dereng dest bi nivîsandinê dikin û li gor mufredatê ev huner dereng dikeve.

Ji bo ku bi awayekî serbest û xweş binivîse wexteke berfireh divê ji xwendekaran re. Jixwe xwendin û nivîsandin bi hev re diçin û ji ber ku zarok dest bi xwendinê dikin, nivîsandin jî dereng dikeve. Her carê jixwe şaş û kêr dinivîsin û ev jî dibe sedemeke dereng nivîsandinê. Ez sedema vêya baş nizanîm lê dibe ku ji zimanê dibistanê be. (T04DE)

Zarok dereng dest bi nivîsandinê dike çunkî şaş dinivîse jê dibe û dîsa dinivîse... Heta ku hînê vê hunerê dibe jixwe wext ji min jî û ji wî jî diçe. Carinan tîpa ku wê binivîse ji bîr dike, carinan peyvê dubare dixwaze û carinan jî ew aciz dibe û dev ji nivîsandinê ber dide. Jixwe hînkirina min î tîpa “ğ” çû mehekê. Loma ji ber van sedeman zarok li gor mufredatê herî kêr du mehan dereng dest bi nivîsandinê dike. (K11DE)

Dereng dest bi xwendinê dike. Di her tiştê zarok de pirsgirêk heye. Di xwendina wî, nivîsandina wî, fêhmkirina wî de pirsgirêk heye. Ez li ser pola xwe yî a niha didim xwendinkirin bêjim, heta dawiya salê jî ez bi van tiştan dişexilîm. (K15DE)

‘Dinivîse lê nizane ku çî nivîsandiye.’

Gelek mamoste diyar kirin ku xwendekar dest bi nivîsandinê bike jî û serbest binivîsin jî nizanin bê ka çî dinivîsin û ji nivîsên xwe fêhm nakin. Girîngiya zimên li vir jî xwe dide der û ti fêde nivîsandinê ji fêhmkirina xwendekar re tune ye.

Zarok ji nivîsên xwe fêhm nake. Ku ez jê re bêjim te çî nivîsand ji min re vebêje dê nikaribe vebêje. Peyv her ku ji zarok re xerîptir dibin, fêhmkirina wan diwartir dibin. Ez jî ji bo zarok ji nivîsên xwe fêhm bikin peyvên ku ew zanin û hêsan bi wan didim nivîsandin. (T03DE)

Wek ku min li ser xwendinê jî got, xwendin û nivîsandin du karên yek in bi rastî. Zarok tiştên ku dixwîne fêhm nake, tiştên ku dinivîse dê çawa fêhm

bike? Ji bo zarok fêhm bike, divê wateya wan peyvên ku dinivîse zanibe. Erê çend xwendekarên min hene xweş dinivîsin û şaş jî nanivîsin lê fêhm nake ku çi nivîsandine. (K23DK)

Xwendekarên min piranî tiştên ku dinivîsin fêhm nakin jixwe. Tenê wek ji xwe re bi tîpan wêneyekî xêz bikin dinivîsin. Jixwe nivîsandinê jî bi awayekî baş pêk nînin, ew pîrsgirêkeke din e lê çend xwendekarên min hene ku xweş jî dinivîsin lê dîsa jî fêhm nakin. (T20DE)

Hin mamoste anîn ziman ku xwendekar qasî ku ji nivîsên xwe fêhm dikin, ji xwendinên xwe fêhm nakin.

Zarok erê dinivîse lê ji xwendinên xwe fêhm nake. Bi min zarok nivîsên xwe ji xwendinên xwe pirtir fêhm dike çunkî kêr zêde zanin ku çi dinivîsin. Tiştên ku ez jê re vedibêjim fêhm dike û li gor wê fêhmkirina xwe dinivîse. Ez metnekê bidim wan û bêjim ku we çi jê fêhm kir, bawerim ji sê an çar xwendekaran pê ve dê kesê fêhm nekiribe çunkî ji tîpan pê ve tiştêkî îfade nake ji bo wan ew nivîs. (K10DE)

Bi min zarok nivîsên xwe ji xwendinên xwe xweştir fêhm dike, qe nebe zarok dikare tiştên ku nivîsandiye telafus bike û dê zanibe ku çi ye û çi nivîsandiye. Erê dîsa ne pir baş e fêhmkirina wan lê ji xwendinê çêtir e. (K12DK)

Zarok ji ber ku tîp an jî peyvan baş telafus nake şaş dinivîse û wexta ku şaş dinivîse jî jixwe fêhm nake çunkî şaş dinivîse û nikare bixwîne. Lê heger peyvên ku nivîsandine zanibin û rast telafus bikin, dibe fêhmkirina wan î nivîsandinê ji xwendinê baştir be. (T07DK)

3.2. Pîrsgirêkên Xwendekaran ên Ragihandinê

Ev beş ji bo tespîtîkirina pîrsgirêkên xwendekaran a ji aliyê ragihandinê ve tê jiyîn hat amadekirin. Ji bo tespîtîkirinê ji mamosteyan re 3 pîrs hat pîrsîn, bersivên tevahiya mamosteyan hat rêzkirin û nirxandin. Li gor bersivên tevahiya mamosteyan 4 tespîtên sereke hat kirin. Her tespîtek li gor bersivên mamosteyên curbicur hat tasvîrkirin û piştrastkirin.

‘Ji hevalên xwe re bilbil, ji mamoste re lal e.’

Gelek mamoste anî ziman ku têkiliya xwendekaran a ji aliye ragihandinê ve pir baş e lê bi wan re ne ew qas baş e û her wiha da zanîn ku di ragihandinê de pîrsgirêk ne di me ne jî di xwendekaran de ye, pîrgirêk di zimanê zimanê de ye.

Zarok bi hevalên xwe re di ragihandinê de rastî ti pîrsgirêkan nayê, wexta ku bi min re dikeve têkiliyê pîrsgirêk dest pê dike. Xwendekarên min î herî

bêdeng jî bi hevalên xwe re pir xweş dipeyive lê wexta ez pê re dibim muhattap qet deng nake. Wexta ku ez bi dê û bavê wan re dipeyivim, ji min re dibêjin ku pirsgirêk ziman e. (T03DK)

Zarok bi hevalên xwe têkiliyêke pir xweş datîne. Jixwe hemû bi hev re kurdî dipeyivin, ya xerîb dibe ez çunkî ew di navbera xwe de civatên gelekî xweş datînin. (A01DK)

Ji ber ku bi hev du re zimanê xwe yî zikmakî dipeyivin, ti pirsgirêk rû nadin, Carinan bala xwe didim wan ku zarok êdî wextekê şûn de bi her du zimanan jî ji bo ragiandina xwe bi kar tînin. Duzimanîbûna wan piştî demekê kêrî têkiliya wan jî tê. (K13DE)

Ez bawer nakim ku bi hevalên xwe re rastî pirsgirêkeke ragihandinê werin ango ez qet bawer nakim ku ji ber zimên ev pirsgirêk rû bide çunkî jixwe her kes zimanê xwe yî zikmakî zanin û qasî ji hev fêhm bikin tirkî jî zanin. Lê heger hûn bêjin bi te re ti pirsgirêkeke wan î ragihandinê hene, erê heta ku hûn bêjin hene çunkî gotinên wan ji min re zêr in. (T08DK)

T18DK anî ziman ku xwendekarekî wê heye ji Sûrîyê ye û ev xwendekar car caran bi hevalên xwe re di ragihandinê de pirsgirêkan dijî û fikrên xwe bi awayî tîne ziman: “Xwendekarên min di mijara ragihandinê de pir baş in. Lê heger zimanê wan î zikmakî ji hev cuda be ev pirsgirêk rû dide. Mînak xwendekareke min heye ku ji Sûrîyê hatiye û zimanê wê yî zikmakî erebî ye. Ev xwendekara min pire caran bi hevalên xwe re pirsgirêkên ragihandinê dijiya lê piştî demekê hînî zimanê wan bû û ev pirsgirêk ji holê rabû.”

Çend mamoste anî ziman ku zarok bi hevalên xwe re xweş dipeyive lê wexta ku bi wan re dipeyive ji tirsê ku nikaribin hest û fikrên xwe bînin ziman deve wan li hev digere û difafîkin.

Zarok nikare xwe li min îfade bike û jixwe ev jî ji nezanbûna wî yî peyvan e. Wexta ku dest bi axaftinê dike disekine, deve wî li hev digere çunkî difikire û nizane ku wê çi bêje. Carinan pir zorê dide xwe, pirsê “ez ê çi bêjim, divê çi bêjim” li xwe dike. Carinan jî berovajî tiştên ku min jê pirsî dipeyive, kurdî difikire û tiştên tevlihev dibêje. (K10DE)

Carinan dixwazim ku bi wan re dipeyivim û tiştin ji wan re bipirsim lê zarok dikeve tev û difafîke, kelocanî dibe û nizane ku wê çi bike. Ez dikarim bêjim ku cihek hebe wê bireve. Wexta ku bersiveke şaş dide, li ber xwe dikeve. (T08DK)

Xwendekarekî min hebû, hem min fêhm nedikir û hem jî wexta ku dipeyivî deve wî li hev digeriya û difafîkî. Ez dibêjim heger ev zarok hînî tirkî bibe ev zarok dê êdî nefafîke. (T09DE)

Çend mamoste jî anîn ziman ku wexta ku zarok nikaribin xwe ji mamoste re îfade bikin, carinan hêrs dibin û xwe sûçdar hîs dikin. Ji vir jî diyar dibe ku pirsgirêka zimên bandora xwe li derûniya xwendekaran jî dike.

Piraniyên xwendekarên min nikarin xwe bi zimanê îfade bikin. Wexta ku nikaribe xwe îfade bike dinixume, li ber xwe dikeve û qet napeyive. Carinan ji ber ku zarok nikare bi min re bipeyive, derde xwe ji malbata xwe re dibêje û malbat jî tê bi min re parve dike. Jixwe heta ku zarok digihîne malê û ew jî digihîne min wext di ser re diçe û pirsgirêk wek xwe dimîne û zarok pê diêşe. Ev rûdan min jî diêşîne û wexta ku nikaribim ji wan re bibim derman ez jî diqhehim. Çawa be jî bi awayekî xwe digihînim wî û çareser dikim. (T03DK)

Zarok nikarin xwe ji min re îfade bikin. Carekê min spartek dan xwendekaran û xwendekarekî min sparteka xwe çê nekiribû. Min jê pirsî ku te çima çê nekiriye, dest bi girî kir. Paşê min fêhm kir ku zarok sparteka xwe çê nekiriye lê nikare sedema xwe ji min re bêje loma giriyaye. Carinan jî piştî bûyerên bi vî rengî zarok ji dibistanê jî sar dibe û naxwaze were. (K11DE)

Zarok gelek kêman caran bi min re dipeyive û jixwe carinan dixwaze mijar bê jibîrkirin da ku ez jê dûr bikevim. Carinan wexta ku nikaribe xwe îfade bike hêrs dibe û xwe sûçdar hîs dike. Xwendekarekî min hebû ji ber ku nikaribû derde xwe ji min re bêje çibû cihê xwe û lênûska xwe çirandibû û paşê min bang wî kir û ez bi kurdî pê re peyivîm zarok bi ser xwe ve hat. (K12DK)

T06DK anî ziman ku wexta ku zarok bi min re dipeyivin asê dibin û tiştên heşê xwe de dişibîne tiştên wekî din. Ango zarok tiştên ku fêhm nakin li gor zimanê xwe yî zikmakî şîrove dikin û dibêje “Xwendekar din ava rojê de kêman caran bi min re dipeyivin. Wexta ku bi min re dipeyivin jî serî li şibandinê dide. Peyvên ku bir tirkî nizanin dişibînin tiştên ku zanin û bi awayî em ji hev fêhm dikin. Zarok baş dizane ku wê çi bibêje lê mixabin tirkîya wê nizane, ez jî ji bo bi wan re bipeyivim her carê li hêviya şibandineke wan dimînim.”

‘Xwendekar rastî şiddeta hevalên xwe tê!’

Li gorî mamosteyan anî ziman ku pirsgirêkeke din ya ku zarokên duziman dijîn şiddet e. Xwendekarên ku zimanê dibistanê baş bi kar nînin rastî şiddetê tên. Ev şidet carinan bi peyvan, car caran bi henekpêkirinê û car caran jî fîzîkî pêk tê.

Zarok bi zimanê dibistanê nikare xwe îfade bike û pêşketina wan î zimên jî dereng diçe. Carinan xwendekar xwe tije dike ku rabe ser xwe bipeyive lê hevalên wî tirkî ji wî baştir dipeyivin bi wî dikenin û di polê ciddiyet namîne jixwe û pê re her kes dikene. Wexta ku rastî vê şiddeta psikolojîk jî tê li ber

xwe dikeve û qudumê wî dişkê, xwe kêmi hevalên xwe dibîne û êdî xwe ne bawer e. (T04DK)

Zarok bi hevalên xwe kêfxweş e çunkî bi heman zimanî dipeyivin. Lê li cem min xwendekarek heye ku zimanê wî yê zikmakî tirkî ye. Ev xwendekar ji ber ku tirkî ji hevalên xwe yê din xweştir dipeyivî henekê xwe bi hevalên xwe dikir û bi wan dikeniya û carinan jî xwe nêzîkî min dikir ku ez qîmetê bidim wî. Ji ber liv û tevgerên vî xwendekarî, xwendekarên din xwe kêmi û qels didîtin û li ber xwe diketin. (K11DE)

Zarok bi hevalên xwe xweşik dipeyive çunkî jixwe zimanê wan kurdî ye lê ez jê re asteng im. Carinan dixwaze ku tiştekî ji min re bivêje lê nikare bibêje. Wexta ku nikare bibêje ji hevalên xwe alîkarî dixwaze ku gotina xwe temam bike lê hingê jî hin hevalên wî ku tirkî baş zanin pê dikenin. Ji ber vê henekpêkirinê zarok li ber xwe dikeve û hêrs dibe, êdî careke din napeyive. (T20DE)

Zarok wexta ku nû tê, rastî zimanekî din tê û jixwe şoq dibe û ev carinan dibe pîrsgirêk çunkî hewl dide ku tirkî bipeyive lê nikare û li xwe digêrîne. Ji ber ku zimên baş nizane jest û mîmîkan bi kar tîne û car caran jî bêdeng dimîne. Carinan dîsa xwendekar dixwaze ku bi tirkî dipeyive lê rastî şiddeta hevalên xwe tê û li wir ragihandin qut dibe û ji ber ku zarok li ber xwe dikeve êdî tirkî kêmi dipeyive. Ev kêmi peyivîn jî dibe sedema ku zarok vî zimanî dereng hîn bibe. (K21DE)

Zarok nikare hest û bestên xwe bi min re parve bike, ne tenê di polê de jî li baxçe jî ev bûyer diqewime. Carinan ji bo ku ji wan fêhm bikim dubare dixwazim ku dîsa bipeyivin. Carinan wexta ku min zor didan wan ku bipeyivin, peyvên kurdî dikirin nav axaftina xwe û jixwe min jî kurdî zanîbû bi awayekî me li hev dikir. Hin caran xwendekarê min nikarîbûn xwe îfade bikirina, hevalên din bi wan re dikeniya û piştî vê bûyerê yên zanîbûn jî ditirsiyan ku bipeyivin. (K22DE)

‘Ji zimanê xwe fedî dike.’

Çend mamoste anîn ziman ku zarok ji ber ku nikare xwe bi zimanê dibistanê bîne ziman, ji demekê şûn de ji zimanê xwe dûr dikeve û êdî ji zimanê fedî dike. Ev jî bi me dide fêhmkirin ku ev rewş bandoreke ne baş li ser derûniya xwendekaran dike.

Ji pîrsgirêkên herî mezin yên zarokên duziman jî ragihandin e jixwe. Ji bo ku zarok li dibistanê rehet be, divê ragihandineke xurt hebe. Divê ragihandineke kêrhatî hebe ku zarok karibe bi awayekî xweşik û eşkere xwe îfade bike. Ji ber ku zarok zimanê dibistanê baş nizane jixwe rehet nabe û pîrsgirêk ji vir û pê de dest pê dike. Ji ber ku zimanê dibistanê baş nizane li dibistanê aciz dibe û dinixume. Zarokên bi vî rengî ewilî serî li hevalên xwe didin lê heger hevalên wî nikaribe bibe alîkar êdî zarok bi zimanê xwe re şer dike û zimanê xwe bê qîmet dibîne. Carinan dibînim zarok li derve jî tirkî xeber didin û qet nêzîkî zimanê xwe nabin. (K23DK)

Nayê bîra min ku ez min bi xwendekarên xwe re tirkî civat daniye û qala tiştekî kiriye. Jixwe car caran aciz dibûm çunkî tenê hînkirina zimên û xwendin û

nivîsandinê heye. Wê baweriyê didim wan ku carinan bipeyivin lê dîsa jî napeyivin çunkî zimanê wî li ti ciyên dibistanê nayê bi kar anîn û sedem jî tune ku zarok bi zimanê dibistanê bipeyive. Lê çend xwendekarên min hene ku piştî demekê êdî ne tirkî û ne jî kurdî dipeyivî, bawerim êdî ji zimanê xwe fedî dikir an jî zimanê xwe biçûk didît. (K24DE)

‘Guhdar dike lê fêhm nake.’

Gelek mamoste tîne ziman ku di hunerên guhdarîkirinê yên zarokên ku zimanê dibistanê baş nizanin jî de pirsgrêk hene. Ango zarok guhdar dikan lê nizanin ku çi guhdar kirine.

Zarok min pir xweş guhdar dikan lê nizanin ku ez çi dibêjim çunkî piştî ku ez dipeyivim tiştan ji wan dipirsim lê zarok an bersiva min nade yan jî tiştekî ku elaqeya wê bi min gotina min tune ye dibêje. Jixwe ez tiştekî tenê bi gotinê ji wan naxwazim, wexta ku ez tiştekî dixwazim bi wêneyan an jî bi nîşandanê ji wan dixwazim. (T06DK)

Wexta ku ez ji xwendekaran re tiştekî dipirsim, zû bi zû bersivê nagirim çunkî zimên nizane û çend peyvên ku ew pê nizanin min jê re gotibe guhdarkirin qut dibe. Jixwe guhdarkirin qut bûbe, ne mimkun e ku zarok bersivên min bidin min û jixwe hingê jî ew peyvên min tev belasibeb diçin. (T02DK)

Di guhdarkirina xwendekarên min de pirsgrêk hene. Xwendekarekî min hebû ku tirkî kêrzanîbû, carinan min jê re digot ku rabe ser xwe da ku tiştekî ji te bipirsim lê zarok ji ber kum in fêhm nedikir ranedibû. Min jî ji van xwendekarên ku tirkî nizanin re carinan bi zimanê wan tiştek dixwest. (K11DE)

Ji ber fêhmnekirina xwendekaran pirê caran diketim tev ku ez ê qala çi ji wan re bikim û ez ê çi vebêjim. Jixwe ez tiştekî ji wan naxwazim çunkî ez tiştekî ji wan bixwazim jî kêrzanîbû caran daxwaza min bi awayekî rast bi cih tînin. Jixwe zarok zimên nizane, ew ê çawa daxwazên min bi cih bîne. (T08DK)

Çend mamoste anî ziman ku fêhmnekirina xwendekaran dibe sedema ku hîndarî û mufredat dereng bê hînkirin û gelek caran zarok ji gelek destkeftiyan dimîne. Her wiha ev zarok ji hevalên xwe yî ku bi zimanê xwe perwerde dibin jî kêrzanîbû ev bandora xwe li paşerojên zarokan jî dike.

Xwendekar ji % 10ê ku ez jê re dibêjim fêhm nake. Bi min ev fêhmnekirin qasî ku ji min re dibe asteng ji wan re nabe asteng çunkî ez nikarim bi dile di polê de hîndariyan çê bikim. Ez hîndariyekê didim wan û riya bersivandinê li ber wan dixim lê zarok ji ber ku ji min fêhm nake yan çê nake yan jî şaş çê dike. Piştî ku dîsa şaş çê dikan veka ez kurdî ji wan dibêjim. Ev jî demê bi xwe dike pirsgrêk çunkî wexta ku hîndarî neyên çê kirin zarok ji mufredatê

dimînin û ez jî bernameya xwe pêk nînim an jî bi derengî pêk tînim. (K17DK)

Zarok di hîndariyên hêsan de pirsgirêkan nayên li wexta ku hinekî diwartir dibe zarok jî ez jî em li xwe diheyirin. Ew derfetên ku em hîndariyên xweş çê bikin li cem me zû biz û çê nabin. Ez dikarim bêjim heta dawiya salê jî ez peyvan nişanî wan didim, êdî min mûfredat daniye aliyekî û min dest bi zimên û fêhmkirina wan kiriye. (T03DK)

Nayê bîra min ku min di dersekê de mijarekê di wextê xwe de qedandiye. Nêviyê xwendekarên min li pey mufredate dimînin. Jixwe pirsgirêka herî mezin jî di dera tirkî de ye. Heta dawiya salê ancax nêviyê mijaran xelas dikim û mixabin yê din dimînin sala şîpêr. (K15DE)

Çend mamoste gilî û gazine xwe ji aliyê spartekan ve anîn ziman. Mamosteyan da zanîn ku xwendekar spartekên xwe gelek caran kêr an jî şaş tînin çunkî wexta ku em spartekan didin wan ji me fêhm nakin.

Zarok min guhdar dike lê wek ku tenê li deve min dinêre ango nizane çî ji deve min derdikeve. Vê ya jî herî zêde ji spartekan fêhm dikim. Çunkî ez carinan tenê devkî ji wan re dibêjim lê roja piştî wê mixabin gelek ji wan spartekên xwe nînin an jî şaş tînin. Pîrê caran rûpela ku min spartek daye wan nişan dikim, diqermeçînim an jî car bi car dubare dubare dikim zarok ji min fêhm bike. (T04DE)

Zarok ji min fêhm nakim. Ez jî ku bixwazim zarok ji min fêhm bikin, ji derdrora wan mînakên didim an jî bi wêneyan tiştan bi wan didim fêhmkirin. Jixwe ez qala spartekan nakim çunkî gelek caran kêr tînin an jî li gorî ku wan fêhm kirine ji min re tînin. (T07DK)

Zarok min guhdar dike, ne ku nake lê ji min fêhm nake. Ez pîrê caran ditirsim ku spartekan bidim wan çunkî lîmin şaş vedigerin. Zarok jixwe tirkî nizanin û biçûk in jî neçar dimînim ku spartekan bidim wan lê ji ber ku guhên xwe baş nadin ser min ez sê çar caran ji wan re dibêjim. Ligel ku ez ew qas dubare jî dikim zarok spartekên xwe şaş an jî kêr tînin. Ez jî bi nivîskî didim wan ku malbat malê li malê bixwînin û bi kurdî bi wan bidim fêhmkirin. (T09DE)

Ez carinan di hundirê polê de xwendekan bi peywîr dikim û tiştan ji wan dixwazim. Ez peyv bi peyv ji wan dibêjim û taûderzî dikim û ji wan re dipirsim ku we ji min fêhm kir an na, hemû jî dibêjin erê mamoste me ji te fêhm kir. Wext di ser re diçe lê dinêrim ku zarok fêhm nekiriye û loma jî ew tişte kum in jê xwestiye kem çê kiriye. Ev tişt di spartekan de jî diqewime çunkî spartekan didim wan û dibêjin me fêhm kir lê belê ew spartek jî mîna peywîra kum in dabû wan şaş û kêr tê. (T20DE)

3.3. Pirsgirêkên Xwendekaran Ên Hevkirina Dibistan û Polê

Ev beş ji bo tespîtkirina pirsgirêkên xwendekaran a lihevkirina wan î bi pol, dibistan, mamoste û xwendekaran re hat amadekirin. Ji bo vê beşê ji mamosteyan re

3 pirs hat pirsîn û her mamoste li gor çavdêrî û tecrubeyên xwe fikrên xwe anîn zimên. Bersivên tevahiya mamosteyan hat rêzkirin û nirxandin. Li gor bersivên mamosteyan 4 tespîtên sereke hat kirin. Ev tespît li gor bersivên mamosteyan hat tasvîrkirin û her wiha hat piştrastkirin.

‘Xwendekar û mamoste ne li hev in.’

Gelek mamoste anîn ziman ku xwendekar û ew ne li hev in. Ji ber ku zarok ji zimanê mamosteyan fêhm nake, li mamosteyan jî germ nabin û wek xerîban nêzîkî wan dibin. Diyar dibe ku ziman bandora xwe li ser xerîbiya xwendekaran a bi cih re jî dike. Ango zarok ji ber cudabûna zimanê dibistanê, xwe li dibistanê xerîb dibîne.

Em û zarok li hev nakin çunkî ragihandin pêk nayê û heger ragihandin pêk neyê zarok serî li şidetê dide. Zarok vê şidetê yan li hevalên xwe yan jî li me dike û jixwe ji vir û pê ve lihevnekirin dest pê dike. (K23DJ)

Zarok li derve jî di polê de jî bi hevalên xwe re li hev dikin lê bi min re li hev nakin çunkî ew bi zimanê hev di nav têkiliyê de ne lê ez bi zimanê wan nikarim bi wan re sohbetê bikim. (T06DJ)

Wexta ku nû dest bi dibistanê dikin matmayî ne zarok. Hem mekan cuda ye û hem jî mamosteyê wan her tim bi wan re bi zimanekî din dipeyive. Wexta ku di polê de mamoste her tim bi zimanekî din dipeyive jixwe zarok li me jî û li polê jî germ nabe. Carinan ji ber van pirsgirêkan zarok digirî û ez jî bang li malbatê dikim û zarok ji nû ve hinekî bi ser xwe ve tê. (K13DM)

Zarokên ku di hunerên sereke yên wek xwendin, nivîsandin û axaftinê de ne baş be jixwe bi me re jî li hev nake. Jixwe mekan cuda ye û bit irs nêzîkî mekanê dibin û di ser re jî zimanekî din lê tê axaftin loma zarok demeke dirêj weke xerîban nêzîkî me dibe. (T18DJ)

Çend mamoste anîn ziman ku xwendekar, bi mamosteyên ku bi kurdî zanin li hev dikin û pirtir li wan germ in. Li vê derê derdikeve holê ku zarok li gor zimanê xwe yî zikmakî ji dil nêzîkî mamosteyan dibe.

Zarok ne bi me re ne jî bi dibistanê re ne li hev in lê ev jî heye ku zarok bi ew mamosteyên kurdî zanin re xweştir li hev dikin. Ez çend caran bû şêhad ku xwendekarên van mamosteyan zûtir derbasî xwendin û nivîsandinê dibin û ew zarok zûtir adapteyi dibistanê bûn. Mixabin ez zimanê wan nizanîm û rewşa xwendekarên min hîn xerab e. Wexta ku zarok bi wan mamosteyan re dipeyivin dikenin û demeke dirêj sohbetê dikin lê l imin bûye hesret ku ez bi wan re xweş sohbet bikim. (A01DJ)

Xwendekarên min bi dibistanê re ne li hev in lê ev jî heye ku ji ber ku ez piçek be kurdî zanîm, ev rehetiyekê dide xwendekaran û xwendekarên min li gorî yên din zûtir hînî vê mekanê û min bûn. (K23DJ)

Di mehên ewilî de ji bo zarok hîn zimanê dibistanê bibin, min kurdî qedexê kiribû. Min dît ku zarok ji min û ji dibistanê sar dibin û êdî mine ew serbest berdan. Çawa ku min kurdî serbest kir û xwendekaran jî fêhm kir ku ez bi kurdî zanim hîn dibistanê bûn û êdî li derve jî ji dû min nediqetiyân. (K12DJ)

Di demên ewilî de ji ber ku mamoste bi zimanê xwendekar re napeyive, zarok nizane ku wê çi bike. Lê piştî demekê wan fêhm kir kur ez bi kurdî zanim û êdî hêdî hêdî li me germ bûn û ji xwe hevalên wan jî tev bi kurdî zanin. (K10DM)

T04DM jî anî ziman ku xwendekar li derve jî piranî xwe bi mamosteyên ku bi zimanî wî zanin digirin. Carinan li derve di navberê de pirsgirêkek rû dide û ew mamosteyên ku bi kurdî zanin pirsgirêkê çareser dikin û dibêje: “Xwendekar di navberê de jî bi mamosteyan re li hev nake çunkî pirsgirêkek rû dide û zarok nikare derde xwe ji wan re bibêje. Heger mamosteyê ku li derve nobedar bin bi kurdî zanibin pirsgirêk çareser dibe. Lê wexta ku mamosteyên wek min nobedar bin hinekî dûv dirêj dibe, hingê yan zarok yan jî mamosteyên din tên alîkariya min.” Heman tecrubeyê T18DJ jî bi vî awayî vedibêje: “Wexta ku di navberê de tiştek diqewime û em bang li zarok dikin, nikare xwe bi me bide fêhmkirin. Ditirse ku nikaribe xwe îfade bike çunkî ji bo ku derdê xwe ji min re bêje divê pêşî zimanê min zanibe lê mixabin nizane. Lê ev zarok li derve bi mamosteyên ku ji vir in re li hev in.”

K23DJ anî ziman ku hin mamosteyên din carinan axaftina kurdî qedexê dike û zarok pirtir ji dibistanê dûr dikeve:

Carinan hin mamoste ji bo ku xwendekar hîn dibistanê bibe zimanê zarok qedexê dike û ev di navberê de jî çê dibe. Ev jî şidet e jixwe û piştî vê şidetê ne mîmkun e ku zarok ji dibistanê û ji mamosteyê xwe hez bike û naxwaze ku li wir bimîne. (K23DJ)

‘Zarok naxweze here dibistanê.’

Li gor hin mamosteyan pirsgirêkeke din a zarokên duziman dîrketina ji dibistanê ye. Mamosteyan anîn ziman ku zarok ji ber ku li me û dibistanê germ nabe, ji me û ji dibistanê direvin.

Dikim nakim hin zarok li dibistanê germ nabe. Çend xwendekarên min hebûn, tirkî pir hindik zanîbûn û ev xwendekar her tim ji dibistanê direviyan. Xwendekarekî min hebû, piştî meha mijdarê êdî nehat dibistanê. Ez çûm cem

malbata wî û min got ku zarok çima nayê, ji min re gotin ku zarok dibêje ez tişkî ji wan fêhm nakim, ez ê herim çî bikim. (K11DM)

Di rojên ewilî yên dibistanê de starî nayê xwendekaran, hingê aciz dibin nizanin ku wê çî bikin. Naxwazin werin dibistanê, ez ji wan tiştan dikirim û wan bi xelat dikim baş dibin lê piştî demekê dîsa wek xwe dibin çunkî di dersê de ji min fêhm nake. Ev zarok carinan jî bi zora malbatê tî dibistanê û carinan jî zarok li cem rûdinîn heta ku li me germ bibe. (T14DM)

Hin xwendekarên min jixwe ne min û ne jî dibistanê qebûl dike, her tiştî red dike. Zarok naxwaze were dibistanê û wexta ku tê dibistanê jî naxwaze ku navber xelas bibe çunkî li derve bi hevalên xwe re dilîze û ji hev fêhm jî dikin. Dibêje dêvla ku ez ji mamoste fêhm nakim, ez ê li derve bim baştir e. Piştî hindik be jî tirkî hîn dibe, tê dibistanê û ji me hez dike. (K12DJ)

T04DJ û K21DM jî beroavajî van mamosteyan anîn ziman ku sedema nehatine dibistanê a zarokan ne ji ber zimên e, ji ber ku zarok biçûk in naxwazin werin.

Zarok di wextên ewilî yên dibistanê de li xwe diheyire, ji vir direve çunkî cara ewil e ku ji malbata xwe vediqete. Ev rewş li cem her zarokî heye ango li cem zarokên ku zimanê wan î zikmakî tirkî ye jî heye. Ez bawer nakim ku ev zarok ji ber fêhmnikirina tirkî ji me dûr dikevin. (T04DJ)

Dibistan ji bo zarokan cihê civakbûnê ye, di heftiyên ewilî de li xwe digerin û naxwaze were lê dû re baş dibin. Heger nikaribin xwe îfade bikin, alîkarî ji hevalên xwe dixwazin û bi vî awayî li dibistanê germ dibin. Jixwe tiştê ku bi zimên hîn nabin jî, bi alîkariya hevalên xwe hîn dibin. (K21DM)

‘Li gorî pîvanan tev nagere.’

Li gor çavdêriya mamosteyan diyar dibe kuz iman bandora xwe li ser dîsîplîna pol û dibistanê jî dike. Gelek mamoste anîn ziman ku car caran ji ber fêhmnikirina zimanê zikmakî ya zarokan, dîsîplîna polê xera dibe û nikarin pîvanan bi wan bidin qebûlkin.

Em dikin nakin nikarin zarokan di bin zevta xwe bikin. Di heftiyên ewilî de em hin pîvanan ji bo polê rêz dikin lê xwendekar ne ji zimanê min fêhm dike ne jî zane pîvan çî ye. Ji ber van nezanîna wan pire caran ders nedihat kirin. Pişt re min dît ku nabe êdî min jî van pîvanan bi wêneyan nîşanî wan dida. (K17DM)

Carinan ji ber ku zarok ji min fêhm nedikirin ez jî hêrs dibûm, ez hêrs dibûm şûnde zarok jî hêrs dibû. Jixwe piştî hêrsbûnê ez li pêş çavên zarokan reş dibim û ew jî êdî li gor xwe tevdiageriyan. Ji bo ku ew dîsîplîn xerab nebe, min jî diçû pîvanên hêsan bi wan dida nivîsandin. Jixwe wan pîvanên ku min

çê fikir jî kêr nedihatî lê êdî min bi wan baş dida fêhmîkirin û dida îmzekirin. (T20DJ)

Zarok ne zane pîvan çî ye û ne jî dizane ku çî bike çunkî pîvanên me bi tirkî ne lê zarok jî ji vêya baş fêhm nake jixwe. Zarok li mala xwe an jî pîvanên mala xwe bi zimanê xwe hîn bûye lê li vir ne mala wî ye û ne jî zimanê wî lê heye. Jixwe carinan ji ber van pîvanan û fêhmnekirina wan pola min dibû ku ji rê derdiket. Erê zarok bandora biçûktiya wan jî heye lê bandora herî zêde ziman lê dike. (T09DM)

K11DM anî ziman ku ji ber pîvanên ku tên danîn zarok xwe aîdî dibistanê nabîne û wek xerîbekî dibistanê an polê tevdigere û dibêje “Wexta ku ez dikim ji bo polê pîvanekê dînim zarok aciz dibe. Ez ji wan re dibêjim ku wexta ku ez dersê didim nepeyivîn û zarok dipeyive. Wexta ku dubare min fêhm nake ez jî dixeyidim û zarok li cem xwe dibêje ez ne aîdî vir im û divê ez ne li vir bim.” Heman gilî gazin ji aliyê K23DJ jî tên kirin û dewam dike: “Wexta ku zarok li gor pîvanan nayê, ne tenê ji aliyê mamoste, ji aliyê hêmanên din yê dibistanê jî tê redkirin çunkî dibêjin ev zarok tevî çanda dibistanê nabe û pê re ew kesên din jî wan zarokan red dikin. Jixwe ji ber van sedeman zarok xwe aîdî dibistanê hîs nake û dixwaze ji van deran dûr bikeve. Yê ku dûr nakevin jî pîvan û dibistan ne xema wan e çunkî dibêjin ez ne ji vir im û ez çî bikim dikarim bikim. Çunkî em ji wan re dibêjin dibistan jî mala we ye lê em bi zimanê malbatê bi wan re napeyivîn.”

‘Xwendekar tevî dersê nabe.’

Mamosteyan da zanîn ku pîrsgirêkeke din a xwendekaran tevî nebûna dersê ye. Van mamosteyan anîn ziman ku ji ber ku zarok ji me baş fêhm nakin carinan ti xwendekar di dersê de napeyivîn û em bi serê xwe dimînin.

Ez di dersê de tiştekî hînî wan dikim lê ji ber ku zarok baş ji min fêhm nake tevî dersê nabe. Tiştê ku ez dipirsim fêhm nake, hîndariyan baş nikarin çê bikin û carinan li hevalên xwe dinêrin û çê dikin. Gelek caran ji bo zarokan tevî dersê bikim, dixwazim ew hevalên wî ku ji min fêhm dikin ji wî re bibe alîkar da ku zarok tevî dersê bibe. Ji bo ku karibin xwe baş îfade bikin jî, wan ji bo tirkî teşwîk dikim. (T07DJ)

Zarok jixwe ji min fêhm nake û wexta fêhm neke jî jixwe tevî dersê jî nabe. Wexta ku fêhm neke ew daxwaza tevîbûna dersê jî kêr dibe û dip ole aciz dibe. Ji ber ku nikare xwe îfade bike baweriya wî bi xwe jî her ku diçe kêr dibe. (T08DJ)

Xwendekarên min zêde tevî dersê nabin. Ez dixwazim bala wan bidim gotinên xwe û dersê, carinan zorê didim wan ku tevî dersê bibin lê zarok

fêhm nake. Wek ku ev zarok li televîzyonê temaşe dikin û bi vî awayî bêdeng li me dinêrin. (K15DE)

Hin mamoste diyar kirin ku gelek caran xwendekar bersivên pirsên ku em dikin zanin lê ji ber ku nikare xwe baş îfade bikin deng nakin û ji cihê xwe ranabin.

Ji ber ku zimanê xwendekaran cuda ye, tevlihbûna wan î dersê jî kêmtir dibe. Ji ber ku nikare xwe bi peyve bêdeng dimîne. Carinan zarok bersivên pirsan jî zanin lê dîsa jî bêdeng dimînin. Ez jî ji bo ku wan bi peyivînim, wan bi xelat dikim û bi vî awayî çawa be jî dipeyivin. Ev xwendekar di darsa matematîkê de baştir in çunkî di vî dersê de hewce nake ku xwendekar pir bi peyve, xwendekar bersiva xwe bi peyvekê an bi du peyvyan dike û rûdine. Çend xwendekarên min hene, ligel ku xwendin û nivîsandina wan ne baş e jî, di matematîkê de baş in. (T04DM)

Ji pirsgerêkê herî mezin ên zarokên ku zimanê wan î zikmakî jî zimanê dibistanê cudatir in tevlihbûna dersê ye. Xwendekar pirsên ku ez dikim fêhm nake. Dixwaze tiştekî bêje lê ji ber ku nikare bêdeng dimîne. Wek ku zarok bi bêdengiyê xwe ceza dike. Bi rastî pirsgerêk ez im çunkî zarok bersivên xwe bi kurdî jî hevalên xwe re dibêje. Wexta ku bêdeng dimîne jî, dixwaze ku hevalên wî bersivê bidin û bi awayî xwe rehet bikin. (T05DJ)

Ji ber cudabûna zimên bîvênevê tevlihbûn kêmtir dibe. Di dersên ku zêde axatin hewce nake de baş in lê di dersên din de tevlihbûn heta ku tu bibêjî kêmtir e. Çend xwendekarên min hebû, ji ber ku tirkî baş nizanibû, bersiva pirsan zanibûna jî deng nedikirin. Ev zarok di darsa matematîkê de baş bûn çunkî hewce nake ku pir bi peyve, bersiva xwe dide û karê wî xelas dibe. (K21DM)

Çend mamoste anîn ziman ku ne ji ziman be yan jî zarok karîban xwe îfade bikirana wê ev zarok her tim tevli dersê bibûna. Dîsa mamosteyan diyar kirin ku ji ber zimên ders bi awayekî yekawaz derbas dibe.

Ji ber ku zarok zimên baş nizan, bi awayekî xwezayî rêjeya tevlihbûna zarokan a dersê jî kêmtir dibe. Ji bilî nezanîna wî yî zimên, fêhmnekirin jî heye jixwe û ev jî rêjeyê dixê. Jixwe niha di pola min de yekawazî heye ango ji min pê ve kes tevli dersê nabe. (K10DM)

Nezanîna zarokan a tirkî tevlihbûna wan î dersê kêmtir dike. Ez bawerim heger perwerdehî bi zimanê zikmakî çê bibûya wê ev zarok gelekî zêdetir tevli dersê bibûna lê mixabin ew jî tune ye û zarok zimên jî pir nizan, ev pêk nayê. (K16DJ)

Wexta ku zarok nikaribe bi vî bi peyve bi guman nêzikî pirsan dibe û ev jî tevlihbûna dersê kêmtir dike. Ev jî heye, ji ber ku baweriya wî bi wî tune ye nafikire ku bi peyve jî. Bi min heger ev pirsgerêka zimên jî holê rabe wê zarok her carê tevli dersê bibin. (T18DJ)

3.4. Fikr û Tecrubeyên Mamosteyan

Ev beş ji fikr û tecrubeyên mamosteyan re hat hiştin. Me xwest ku bi pirsên vê beşê fikrên mamosteyan ên di der heqê ziman, duzimanî, perwerdehiya duzimanî de fêhm bikin. Ji bo vê beşê ji mamosteyan re 4 pirs hat pirsîn û bersivên mamosteyan hat rêzîkirin. Li gorî bersivên tevahiya mamosteyan 4 tespît hat kirin û ev tespît bi bersivên mamosteyan hat tasvîrkirin.

‘Ev pergal kêrî zarokan nayê.’

Gelek mamoste anîn ziman ku ji ber ku zimanê xwendekaran ji hev cuda ne ev pergal kêrî wan nayê. Mamosteyan dan zanîn ku bi vê pergala ku ziman dibe asteng re xwendekar nayên perwerdekirin.

Bi min ev pergal ne li gor van xwendekaran e. Ev pergal li gorî asta zarokên yekziman ên ku zimanê wan î zikmakî tirkî ye. Çunkî em ji hînkirina zimên pê ve tiştekî din nakin. Sala min bi hînkirina tirkî derbas bû. Min filmên karton ji wan re vedikir, pire caran tenê min bi wan sohbet dikir da ku hîni zimên bibin. (A01DJ)

Ev pergal teqez ji van zarokan re zerar e çunkî zarok hîn zimanê xwe baş nizane, hîn beranberên tegehên zimanê xwe nizane lê em bi zimanekî cuda wan perwerde dikin. (K11DM)

Ev pergal ji van zarokan re nabe çunkî ev zarok xwe ji pola yekemîn û heta polên din jî nikarin bi vî zimanî xwe îfade bikin. Zimanê zarok ji pergalê cudatir e jixwe û zimanê cihê ku lê dijî jî ji zimanê pergalê cudatir e loma ev cudahî nahêle ku pergal kêrî van zarokan were. Dîsa ev zarok li vir dixwînin, heger li cihê ku zimanê axaftinê tirkî buna, dibe ku her tim rastî şidetê jî bihatana. (K13DM)

Ev pergal ji van zarokan re qels dimîne çunkî zarokên vir û li bajarê rojavayê di heman pergalê de perwerde dibin lê ev zarok duziman û yên rojava yekziman in. Divê ewilî ev zarok perwerehiyeke baş ji bo tirkî bibinin û dû re tevî pergalê bibin. (T18DJ)

Piraniya mamosteyan ji aliyê materyalan gilî û gazinên xwe ji vê pergalê kirin. Li gor van mamosteyan dijwar e ku bi van materyalan ev zarok bê perwerdekirin.

Ez vê pergalê ji van zarokan re qet baş û kêrhatî nabînim çunkî her materyal li gor zarokên ku tirkî zanin hatine amadekirin. Divê ev materyal hinekî din jî hêsan be, bi min divê wêne zêdetir be ku zarok zanibe ku hîn çi dibe. (T05DJ)

Ev pergal û materyal li gor zarokên ku tirkî baş zanin hatiye amadekirin loma ye ku bi min ev pergal ji van zarokan re pir dijwar e. Divê materyalên dersê û mufredat hinekî din jî hêsantir bibe. (K10DM)

Ev materyalên ku a niha li ber desten min ji van zarokan re nabe. Sedema herî sereke jî ev e ku zimanê van zarokan kurdî lê materyal hemû bi tirkî ne. Jixwe ez gelek caran li van materyalan nanêrim jî, diçim yê hêsantir tînim û bi wan re dersa xwe dikim. (K12DJ)

Ne ev pergal ne ev mufredat û ne jî ev materyal ne li gor van zarokan e. Ziman cuda ye, heger ziman cuda be, em ê bi van materyalan çawa van zarokan perwerde bikin. Bi min divê li gor her herêmê pergaleke cuda bê meşandin. Divê pergala Mêrdînê û Stenbolê ne yek be û heta divê ezmûn jî ji hev cuda bê kirin. (K15DM)

Ez tiştekî vê pergalê ji bo vê derê baş nabînim. Ne materyal, ne mamoste, ne dibistan ne li gor duzimanîya zarokan e. Divê di her materyalê de peyv hem bi kurdî û hem jî bi kurdî hebe ku zarok tirkî baştir hîn bibe. Mamoste jî her wiha, divê her mamoste kurdî zanibin û werin vê derê çunkî em zimanê van zarokan nizanin, em ê çawa nêzîkî wan bibib û tiştan hînî wan bikin. (T19DM)

Bi min esas pirsgerêk di materyalan de ye çunkî zarok tirkî baş nizane lê hemû materyal bi tirkî ne. Gelek caran xwendekarên min hîndariyên ku div an materyakan de cih digirin çê nakin. (K22DM)

Gelek mamoste anîn ziman ku ev pergal kêrî van zarokan nayê, her wiha gelek mamoste jî pêşniyarên xwe yî cuda jî rêz kirin. Hin mamoste pêşniyara pêşdibistanê û hin jî wan perwerdehiya duzimanî kirin.

Bi min ev pergal nameşe êdî, divê li her derê pêşdibistan vebin û taybetî jî zarokên van deran herin pêşdibistanê. Divê di wextê pêşdibistanê de jî bername li ser hînkirina tirkî be. (T04DM)

Ji ber ku pergal bi her awayî bi tirkî ye divê zarok pêşî ji pergalê re were amadekirin û dû re dest bi pola yekemîn bikin. Ev jî divê bi alîkariya malbatan û zêdekirina pêşdibistanê bê kirin. Heger bi awayî be, bawerim wê ev pirsgerêk ji holê rabe. (T07DJ)

Ev pergal ji ti kesî re ne baş e lê herî zêde jî ji van zarokên duziman re. Bi min perwerdehiya bi zimanê zikmakî hebûya wê baştir bûya yan jî zarok divê qasî zarokên tirk tirkî zanibe. (T08DJ)

Ev pergal ji serî heta binî kêrnehatî ye. Divê ji aliyên xwe ve bê sererastkirin ev pergal. Wek ku perwerdehiya duzimanî bibûya wê baştir bibûya, qet nebû wê zarok xweşik bixwenda û fêhm bikira. (T09DM)

Divê ev pergal bê guhertin. Bi min divê yan pêşdibistan were zêdekirin û ev zarok bêtir pêşdibistan neyên dibistanê yan jî divê her mamoste hînî zimanê van zarokan bibin. (K11DM)

Heger her kes biçûya pêşdibistanê, bawer nakim ku wê ev pirsgerêk rû bidin. Divê materyal jî teqez bi du zimanan were amadekirin û ev duzimanî ne tenê ji bo dibistanê dive^{li} her qadên jiyanê her du ziman jî hebin. (K21DM)

‘Duzimanî awantaj e.’

Piraniya mamosteyan duzimaniyê wek avantajekê da nasîn. Çend mamoste jî anîn ziman ku duzimanî ji bo fikirîna zarokan a piralî û ji aliyê têgihiştineke baş avantaj e.

Li gorî min duzimanî ji bo van zarokan fersendek e çunkî ev zarok hîn afirîner in. Ev jî heye, zarok zimanê xwe çi qas pir zanibe, ew qas pir alî û xweştir difikire. Ez wexta ku li gund dixebitîm li vêya rast hatim çunkî zarok li gund xweştir dipeyive loma carinan bandora xwe li zimanê dibistanê jî dike. (K11DM)

Bi min duzimanî tiştekî kêrhatî ye lê ev jî şerdê ku zarok her du zimanan baş zanibe. Zarokên duziman tiştan zûtir fêhm dikin û hem li gorî zimanê xwe û hem jî li gorî zimanê dibistanê difikire. (K12DJ)

Bi min heye çunkî min ferq kir ku zarok wexta ku zimên baş zanibe xweştir û baştir fêhm dikin. Ango ji aliyê pêşketina zihni ve duzimanî baş e. (T14DM)

Zarok li hemberî tiştekî li xwe naheyire çunkî li gor du zimanan li bûyeran dinêre. Çunkî her zimanek çandekê temsîl dike û zarok vêya bi vê biçûktiya xwe jî bi kar tîne. (K15DM)

Teqez duzimanî tiştekî pir baş e. Zarok peyvên her du zimanan bi hev girê dide û bê guman mejiyê xwe pirtir dixebitîne. Ji bo ku fêhm bikin serê pirtir pê dieşînin. Her tim wê du fikrên kesên duziman hebe çunkî her du zimanan zane û her zimanek fikrek e. (T20DM)

Duzimanî baş e lê divê zarok bi her du zimanan din ava aşitiyekê de be û qîmeta her du zimaman jî hebe. Heger ev pêk hat wê hingê zarok dualî bifikire û heta karibe wê di nav zimanan de veguhestinê bike. Ez bawer dikim kesên duziman li gorî yekzimanan wê xweşbînîtir bin jî. (K23DJ)

Çend mamosteyan anî ziman ku duzimanî ji bo tekiliya mirovan jî avantajek e. Li gorî van mamosteyan kesên duziman kengî bixwazin zimanekî bi kar tînin û carinan ew fersenda tercumaniyê jî didin wan.

Mirovek zimanek e. Mirov çi qas ziman zanibe ew qas baş e. Çi qas ziman zanibin wê bi ew qas însanî re têkilî dînin. Wê ji gelek zimanan gelek mirovan nas bikin. (T02DJ)

Çi qas ziman zanibin ew qas baş e. Zarok dikarin ji zimanê xwe veguhestinê ji zimanê din re bike û min vêya li cem xwendekarên xwe dîtin jî. Heger bixwazin dikarin tercumaniyê jî bikin. Carinan xwendekarên min î her du zimanan zanin ji yê tirkî baş nizanin re dibin tercüman. (T03DJ)

Bi min duzimanî herî zêde ji aliyê ragaihandina di navbera mirovan de pir kêrhatî ye çunkî zarok bixwaze li gor civakê zimanê ku dixwaze bipeyive. (K10DM)

Dibe ku a niha ji aliyê xwendevaniyê em feda wê nabînin lê ev zarok ji hest û fikrên xwe re tercumaniyê dike. Bi zimanekî nikaribe xwe îfade bike, ji zimanê xwe wergerê dike û xwe xweştir tîne ziman. (K15DM)

Çend mamoste anîn ziman ku duzimanî ji bo hînbûna zimanê sisêyan jî avantaj e. Li gor van mamosteyan zarokên duziman mantixa zimên fêhm kirine û hêsantir zimanekî din dibin.

Bi min zarokên duziman li hember zimanên din helwesteke baş nişan didin. Ev zarok di dersên îngîlîzî de pirtir û xweştir mamosteyan guhdar dikin û bala xwe didin dersê. (T06DJ)

A nina ev duzimanî zêde kêr nayê lê di demên pêş de ev wê gelekî kêrî zarokan bê. Bi min zarok îngîlîzî xweştir fêhm dikin çunkî zarok tirkî hîn bûye û ev hînbûna wî yî zimanekî din hêz û qawetê dide hînbûna wî yî îngîlîzî. Lê mixabin a niha ev avantaja van zarokan di vê pergalê de bûye dezavantaj. (K21DM)

Li gorî min zarokên duziman ji pirzimanîyê potansiyel in çunkî zarok tîrsa xwe yî zimên têk bîriye. Zarok êdî bi xwe bawer e ku zimanekî din jî hîn bibe. Mamosteyeke me yî îngîlîzî hebû, wî bi xwe digot ku ev zarok pir xweş ji min fêhm dikin. (K24DM)

Zarokên duziman bi min serkeftîtir in. Ev zarok di dersên din de ji ber cudahiya zimên dibe ku ne baş bin lê di dîrsa îngîlîzî de baştir in. Zarokên duziman ji aliyê hînbûna zimanekî din ve wê baştir bin. (T18DJ)

A01DJ, T04DM û T05DJ anîn ziman ku heger zarok her du zimanan jî zanibin duzimanî baş e lê heger di her du zimanan de jî ne pir baş bin kêrî wan nayê.

Duzimanî bi her awayî baş e lê dikarim bêjim ku heta niha ti xêra wê li vir nedît. Ji serê salê heta dawîya salê jî min û xwendekaran ji hev baş fêhm nedikir. Ez bawerim sedema vêya jî ev e ku zarok zimanê xwe yî zikmakî jî baş nizane. Bi min heger zimanê xwe zanibe û hînî zimanê dibistanê jî bibe, wê duzimanî kêrî wan were. (A01DJ)

Helbest aliyên pir baş yê duzimanîyê hene lê min li vir nedît çunkî zarok ji aliyê zimên ve di nava aloziyekê de ne. Di salên pêş de heger zarok her du zimanan jî zanibe baş e hekena ez bawer nakim kêrî wan were. Ango di şerdê niha yê Tirkîyeyê de ev duzimanî ji wan re ne baş e. Bi taybetî ji bo xwendekarên me yî pola yekemîn. (T04DM)

Gelekî kêrhatî ye duzimanî lê ji ber ku zarok tirkî qasî zimanê xwe nizane û ev zarok bi tirkî perwerde dibin êdî duzimanî ne başî lê zerarê dide wan. (T05DJ)

Duzimanî pir pir baş e lê mixabin ji ber ku ev zarok her du zimaman jî pir baş nizanin, rêjeya wan î serkeftinê roj bi roj kêm dibe. Loma ye ku piştî ku li rewşa van zarokan dinêrim, nikarim bêjim baş e an na. (T08DJ)

Ez ji xwe zanim ku duzimanî baş e lê ji ber ku ev zarok her du zimanan jî pir baş nizanin loma min feda wê li van zarokan nedît. (K12DJ)

‘Zarok gavekê ji paş ve tên.’

Li gorî gelek mamosteyan ev xwendekarên ku zimanê wan î zikmakî ji zimanê dibistanê cudatir in her tim li gor zarokên ku zimanê wan û zimanê dibistanê yek in, gavekê ji paş ve tên. Ev ji paşvehatin avantaj van zarokan dike dezavantaj.

Ev zarok li gor zarokên rojavaayê gelekî ji paş ve tên. Xwe kêr û bê çare dibîne. Ev xwendekar di her mijarên dersê de qels dimînin û gelek mijar hene ku nabînin jî. (T06DJ)

Ev zarok bi dibistanê re li hev nakin. Zarokên ku zimanê wan î zikmakî tirkî ye zû li vir germ dibin lê ev ne wisa ne. Ev zarok ne karin hîndariya çê bikin û ne jî dikarin spartekên xwe çê kin. Wexta ku nikaribin van her duyan çê bikin, li pey mufrdatê dimînin. Wek ku ev zarok salekê dereng dimînin. (T07DJ)

Di vê pergale de rêjeya serkeftina van zarokan kêr e çunkî fêhmîkirin tune ye û li gorî zarokên ku tirkî zanin derengtir dest bi xwendin û nivîsandinê dikin. Ev zarok gavek an du gavan ji paş ve tên. Jixwe hûn dibînin, li rojavaayê perwerdehî cuda û li rojhilatê cuda ye. (T08DJ)

Carekê ev zarok ti carî nabin wek zarokên rojavaayê çunkî ev zarok ji ber cudabûna zimanê xwe bêdeng dimîne, rastî zextan tên û bi mamosteyên xwe re nikare bi dilê û bi saetan bipêyve. Dereng hîn dibe. Karê me yî vir ev e ku em tênê abc hîn van zarokan dikin. (K11DM)

Neheqîyeke mezin li van zarokên duziman çê dibe çunkî zarokên tirk bi zimanê xwe perwerde dibin lê ev zarok hem hîn zimanekî nû hîn dibin û hem jî bi wî zimanê ku nû hîn bûne perwerde dibin. Ev zarok du karên dijwar bi hev re dikin loma zarok du sê gavan ji paş ve tên. (K13DM)

Zarokên li vir li gorî zarokên ku zimanê wan î zikmakî tirkî ye pir kêr in. Ji aliyê demê ve her tim rastî astengiyan tên. Her tiştî dereng hîn dibin. Gavekê ji paş ve tên û hin ji wan pênc gavan ji paş ve tên. (T18DK)

Li vê derê derket holê ku perwerdehiya duzimanî yan jî perwerdehiya bi zimanê zikmakî mafekî mirovî ye. Li gorî çend mamosteyan ev zarok nikarin mafê xwe yî mirovî yê perwerdehiyê bi kar bînin û li gor danezana mafên zarokan mafê maf van zarokan tên bînpêkirin.

Bi min li vê derê neheqîyeke mezin heye. Pergal bi tirkî ye lê her kesên ku zimanê wan cuda tevlî vê pergale dibin. Yên li Kayseriyê jî, yên li Mêrdînê jî bi zimanekî perwerde dibin û neheqîya mezin ev e. Loma ne mimkun e ku ev zarok wek yên din bin. (T19DM)

Ev zarokên duziman perwerdehiya xwe kêr dibîne çunkî di zimanê wî de materyal tune ye, di zimanê wî de hişyarker tune ye. Mijareke din jî ev zarok ji mafê xwe yî perwerdehiyê dimîne çunkî li gor danezana neteweyên yekbûyî divê ev zarok bi zimanê xwe perwerde bibin. Ji ber van sedeman ev zarok li

gorî zarokên ku zimanê wan î zikmakî tirkî ye ji aliyê mafê xwe jî gavekê ji paş ve tê. (K23DJ)

Dezavantaja van zarokan a herî berbiçav mafê perwerdehiyê ye. Li welatên avrûpayê her zarok bi zimanê xwe perwerde dibin û li gor dile xwe tiştan hîn dibin û ji dibistanên xwe hez dikin. Ligel ku zimanê van zarokan cuda ye jî, neçar tên hiştin ku ev zarok bi zimanekî din perwerde bibin. Jixwe kesek bi zimanekî din dest bi perwerdehiyê bike, em dikarin çî qasî tiştên baş ji wan hêvî bikin. (K24DM)

‘Perwerdehiya Duzimanî’

Mamosteyên ku me hevdîtin bi wan re pêk anî li ser perwerdehiya duzimanî fikrên xwe yî cur bi cur bi me re parve kirin. Piraniya mamosteyan anîn ziman ku wê perwerdehiya duzimanî baş be lê ew tirsê ku ev pergala neyê meşandin li cem mamosteyan heye. Em ê niha fikrên piraniya mamosteyan li jêr rêz bikin.

Gelek mamosteyan anî ziman ku perwerdehiya duzimanî wê ji bo pêşketina akademîk a zarokan gelekî baş be.

Bi min perwerdehiya duzimanî çê bibe wê pirbaş bibe. Bi zimanê xwe perwerde bibe ew ê karibe çanda xwe jî dewam bike û bigihîne nîşên nû. Dîsa heger ev pergala pêk were, wê zûtir û baştir derbasî xwendin û nivîsandinê bibe. Ew ê bi zimanê tirkî xwe baş pêş bixe. (A01DJ)

Ew ê ji bo zarokên duziman fersendeke baş be û ew ê erênî be. Lê divê amadekariyeke baş bê kirin ku êdî pergala ku bê meşandin ji vê pergala ne xeraptir be. (T02DJ)

Heger perwerdehiya duzimanî baş bê plankirin ez bawerim wê pir bibe. Ez bawer nakim li Tirkiyeya îro ev pêk were lê heger pêk were jî wê pir baş be. Wê xwendekar xwe xweştir bîne ziman, ew ê bi xwe bawer be çûnkî di ve pergala de zarok xwe bê qîmet dibîne. (T04DM)

Bi rastî heger perwerdehiya duzimanî çê bibe wê tiştêkî xweş be çûnkî wê zarok her du zimanan jî baş zanibe û jixwe mamoste jî her du zimanan zanibe wê xweştir be. Zarok kîjan zimanî bixwaze wê bi awayekî xweş bipreye û ew ê bi xwe bawer be. (T05DJ)

Bi min divê zarok di pêşdibistanê de bi zimanê xwe perwerde bibe û di salên pêş de jî divê dersên bingehîn bi kurdî û yê din bi tirkî bin da ku zarok her tiştî xweştir fêhm bike. (K11DM)

Bi min perwerdehiya zimanî çê bibe ew ê ji aliyê pêşketina zarokan a zihnî pir baş bibe, ew ê zarok bi awayekî xwebawer xwe bîne ziman. Êdî zarok bi fêhmkirina tiştêkî mijul nabe, ew ê fikrên wî hebe. Heger mamoste jî duziman bin ew ê baştir bibe û ew ê zarok xwe aîdî dibistanê jî bibîne. (K12DJ)

Ji ber ku heta niha me pergaleke bi vî nedîtiye ez nizanim ew ê çawa be lê difikirim ku ew ê gelek aliyên wê yî erênî hebe. (T14DM)

Hebûna perwerdehiya duzimanî ew ê gelekî erênî be. Lê heta niha li welatê me çê nebûye, heger çê bibe wê çawa be ez nizanim. Lê ez gelek sal in

dixebitim û rewşa van xwendekaran dilê min dişewitîne û bi taybetî xwendekarên pola yekemîn. Ew ê perwerdehiya duzimanî ji an zarokan re bibe derman. (K15DM)

Perwerdehiya duzimanî ew ê ji bo vî welatî dewlemendî be, her zarok ew ê bi çanda xwe bi zimanê xwe perwerde bibe ew ê pir baş be û her kes wê xweşbînî li hev binêre. (K16DJ)

Ez bawer nakim ku zirareke perwerdehiya duzimanî hebe çunkî wê zarok her du zimanan jî baş zanibe. Ango bi min ev pergal wê bi temamî erênî be. Ew ê zarok xwendinê û nivîsandinê hîn zû hîn bibe. Tabî divê di pergalê de mamoste jî her du zimanan zanibe, ew ê çawa be ez nizanîm. (T19DM)

Di van şerdan de hinekî dijwar e lê bawer dikim ku ew ê pir baş be. Ev ne tenê ji bo zarokan, ji bo mamosteyan jî baş e çunkî em jî di hînkirina tirkî de pir dibetilin. Heger ev pergal were, ew ê barê me jî siviktir bibe bawer dikim. (K22DM)

Çend mamosteyan jî berovajî avantajên duzimanîyê bi awayekî neyînî li pergala perwerdehiya duzimanî nêrîn û bi sedemên curbicur fikrên xwe anîn ziman. Tiştê bala me kişand jî ev e ku ev mamosteyên ku li hember perwerdehiya duzimanî derketin tev ji wan yekziman in û zimanê wan î zikmakî jî tirkî ye.

Heger perwerdehiya duzimanî çê bibe, ew ê zarok tevlihev bike. Dîsa di pergala duzimanî de ew ê xwendekar û mamoste jî ji hev baş fêhm nekin. Bi taybetî jî ev ji bo zarokên pola yekemîn nabe çunkî hîn biçûk in û nikarin perwerdehiya du zimanan ragirin. (T07DJ)

Bi min perwerdehiya zimanekî din tiştêkî kêyfi ye, divê zimanekî vî welatî hebe û armancek hebe. Heger bi her zimanî perwerde çê bibe, ew ê mirov ji hev dûr bikevin û dibe ku perçe jî bibin. (T09DE)

Bi min ew ê zarok tirkî derengtir hîn bibe. Divê em bi zarokan bidin hîskirin ku zimanê wan bi qedr û qîmet e lê divê perwerdehî bi tirkî be (T19DJ)

Serdemeke kritik ya zarokan heye. Heger zarok bi zimanê xwe yî zikmakî perwerde bibin, dibe ku êdî zimanê fermî yê vî welatî hîn nebin. Erê heger perwerdehiya duzimanî çê bibe ew ê baş be lê zimanê fermî tirkî ye, divê zarok jî bi vî zimanî perwerde bibin. (T20DE)

3.2. NÎQAŞEK GIŞTÎ DER BARÊ NÛVEYAN DE

Bersivên mamosteyan li gor pirsan hat dabeşandin û nirxandin bi vî awayî hat kirin. Di bersivên mamosteyan de 4 tespîtên sereke hat dîtin. Ev tespît li gor temayên ku hatibû diyarkirin hat kirin.

Tespîta ewilî ya girîng pirsgirêkên zarokên duziman ên hunerên zimên in. Tevahiya mamosteyan dan zanîn ku cudabûna zimanê perwerdehiyê ji zimanê zarok,

rê li ber pîrsgirêkên zimên vedike. Ji bersiv û nirxandinên mamosteyan derdikeve holê ku zarokên duziman ên ku bi zimanê xwe yî duwemîn perwerde dibin dereng dest bi xwendin û nivîsandinê dikin. Li gorî piraniya mamosteyan ev derengî teqabulî mehekê dike. Ev zarokên ku dereng dest bi xwendinê dikin ji xwendina xwe fêhm nakin û ew tîp, deng an peyvên ku hîn dibin jî ji semboleke bê wate pêve kêrî tiştekî nayê ku zarok dest bi xwendinê bikin jî, ji xwendina xwe fêhm nakin. Piraniya mamosteyan dan zanîn ku sedema vî tîrî cudabûna zimanê zikmakî yê zarok e. Her wiha mamosteyan gilî û gazine xwe ne ji xwendekaran re, ji pergale re kirin. Çend mamosteyan anîn ziman ku heger ev zarok bi zimanê xwe perwerde bidîta, dê baştir û zûtir dest bi xwendin û nivîsandinê bibana. Her wiha mamosteyan dan zanîn ku ev derengî dibe sedema negihaştina bernameya ku hatiye amadekirin. Ev tespît jî lêkolîn û tespîta ku ji aliyê Hansegard (1975) ku dibêje “zarokên nîvziman di pênc aliyên zimên de zêfîndar in; ev zarok xwedî kêmtir peyv in, xwedî rêzimanekê şaş in, ji bo ku bipeyivin pir difikirin, di her du zimanan de jî ji xwezayîbûn û afirîneriyê dûr in û di îfadekirina her du zimanan de jî zehmetiyên mezin dikşînin” piştrast dike.

Tespîta din a girîng jî ev e ku zarokên ku bi zimanê xwe perwerde nabin di ragihandinê de û bi têkiliya mamoste re rastî gelek probleman tên. Tevahiya mamosteyan dan zanîn ku ji ber ku zarok zimanê perwerdehiyê pir baş nizanin, xwe ji mamoste û hevalên xwe nikarin îfade bikin û ji ber ku di parvekirina hest û fikrên xwe kêmtir dibînin bêdeng dibînin û ev jî rê li ber liberxweketina wan vedike. Her wiha piraniya mamosteyan anî ziman ku ev xwendekarên ku zimanê wan î zikmakî ji zimanê perwerdehiyê cudatir in car caran rastî şidetê bi xwe û hevalên xwe tên û hevalên wan henekên xwe bi wan dikin. Bê guman ev şidet û ev rewş bandoreke ne baş li ser derûniya zarokan dike û zarok carinan ji ber van sedeman ji dibistanê dûr dikevin. Lêkolîna ku ji aliyê Gozukuçuk (2015) ve tê kirin û dibêje “Di dibistanên seretayî de ji ber ku her tim mamoste dipeyivin, xwendekar tenê dibin guhdarvan û di polê de gelekî pasîf dimînin” jî vê tespîta me piştrast dike.

Çend mamosteyên ku zimanê wan î zikmakî kurdî ye dan zanîn ku zarok bi zimanê xwe yî zikmakî, xwe pir xweş û baş îfade dikin. Mamosteyan anîn ziman ku wexta ku ew bi zarokan re bi zimanê wan ango bi kurdî dipeyivin, zarok bê fedî û rawestan xwe îfade dikin û zarok bi vî awayî kêfxweştir dibin.

Tespîta din a vê lêkolînê jî pirsgirêka lihevkirina zarokan a bi dibistan û mamoste re ye. Ango piraniya mamosteyan da zanîn ku ji ber ku ev xwendekar li dibistanê rastî zimanekî din, zimanê ku pir baş nizane, tên û zimanê xwe yî zikmakî li derveyî dibistanê dihêlin û ev jî dibe sebeba ku zarok û mamoste li hev nekin. Ango ji ber ku zarok tê cihek ku bi zimanekî din perwerde lê tê kirin, xwe xerîbê wê derê dibînin. Ev jî ji bo lihevkirina wan î dibistanê astengeke berbiçav e. Gelek mamosteyan da zanîn ku ji ber zimanê perwerdehiyê hin zarok ji dibistanê dûr dikevin û xwe wek perçeyek dibistanê nabînin. Ev jî dema hînbûna wan î dibistanê dirêj dike. Ev dirêjbûn bandora xwe li serkeftina zarokan a ji gelek alî ve dike. Her wiha lêkolîna Beltekîn(2014) kiriye ku dibêje “Zarokên ku zimanê wan î zikmakî cuda, di dibistana ku zimanê wê cuda de matmayî ne” jî ev tespîta me yan jî fikrên mamosteyan piştrast dike.

Piraniya mamosteyên ku zimanê wan î zikmakî kurdî ye anîn ziman ku navbera wan û xwendekaran ji mamosteyên din baştir e. Van mamosteyan anîn ziman ku ji ber ku ew bi kurdî zanin, zarok pirtir xwe nêzîkî wan hîs dikin û wexta ku pirsgirêkek derdikeve holê, çareseriyê ji van mamosteyan dixwazin.

Çend mamosteyan di der heqê vê tespîtê de dan zanîn ku yek ji sedema bêdewamiya zarokan jî cudabûna zimanê zarok û perwerdehiyê ye. Ev zarok ji ber cudabûna zimanê mamosteyên xwe naxwazin herin dibistanê û xemgîniya xwe tînin ziman.

Temaya dawî ya hevdîtina me fikr û ramanên mamosteyan bû. Di vê beşê de ji mamosteyan fikrên wan î duzimanîyê û perwerdehiya duzimanî hat xwestin. Di der heqên van her du mijaran de ji aliyê mamosteyan bersivên cuda hat dayîn.

Piraniya mamosteyan duzimanîyê wek tişteke baş û kêrhatî binavkirin. Piraniya mamosteyên ku zimanê wan î zikmakî tirkî ne, xweziya xwe bi xwendekarên xwe yî duziman anîn û her wiha dan zanîn ku duzimanî ji bo zarokan fersendeke bêhempa ye. Her wiha tevahiya mamosteyan anîn ziman ku ji ber ku xwendekarên wan her du zimanan jî baş nizanin, wan fêydeya duzimanîyê li ser xwendekarên xwe pir nedîtine. Mamosteyek hebû ku duzimanîyê wek tişteke asayî û ne kêrhatî bi nav kir. Zimanê zikmakî yê ev mamosteyê ku duzimanîyê wek tişteke

ne kêrhatî bi nav kir tirkî ye û ev mamoste yekziman e. Diyar dibe ku mamoste ji ber fikrên xwe yî siyasî bersîveke bi vî rengî daye.

Gelek mamosteyan anî ziman ku xwendekarên wan î duziman ji aliyê pêşketinên zihnî û ji aliyê hînbûna zimanê sêyemîn baş in. Van mamosteyan diyar kirin ku ev xwendekar gelek caran di navbera xwendekar û mamosteyan de wergereke baş û zû dîkin û ev jî diyar dike ku ev zarok ji aliyê serkeftinên zihnî ve baş in. Heman tişt ji aliyê Baker(2011: 33-34)) jî dihat gotin loma em dikarin bêjin ku fikrên van mamosteyan ên der heqê hêsanîya hînbûna zimanê sêyemîn de tîr piştrastkirin.

Mamosteyan di der heqê perwerdehiya duzimanî de fikrên cur bir cur anîn ziman. Lê li vê derê ji bersivên mamosteyan jî diyar dibe ku mamosteyên ku zimanê wan î zikmakî tirkî û yên zimanê wan î zikmakî kurdî bi awayên cuda nîrxandin. Mamosteyên ku zimanê wan î zimanê wan î zikmakî kurdî ye, rasterast perwerdehiya duzimanî wek tişteke baş nişan kirin. Mamosteyên ku zimanê wan î zikmakî tirkî ye jî perwerdehiya duzimanî wek tişteke baş û xweş bi nav kirin lê ji ber şerdên Tirkiyeyê û xerabbûna pergalekê wek tişteke ne pêkan bi nav kirin.

Du mamosteyan ji van mamosteyan cudatir fikirîn. Yek mamosteyê ku zimanê wî yî zikmakî kurdî ye, li hember perwerdehiya duzimanî derket û da zanîn ku duzimanî dê serê zarokan tevlihev bike. Mamoste anî ziman ku zimanê zikmakî yê zarok kîjan be, divê perwerde jî bi wî zimanî bê kirin. Her wiha mamosteyek ku zimanê wî yî zikmakî tirkî ye jî li hember perwerdehiya duzimanî derket. Ev mamoste jî da zanîn ku ziman ji bo yekitiya welêt tişteki ferz e loma da zanîn ku ji bo di navbera bajar û neteweyan de cudahî çê nebe, divê perwerdehî bi zimanê tirkî çê bibe.

Ji hevdiîna 24 mamosteyên ku zayend û zimanê wan î zikmakî ji hev cuda ne diyar dibe ku ev lêkolîn ji aliyê teoriyê rast e. Tevahiya mamosteyan pîrsgirêkên zarokên duziman ên ku di dibistanên yekziman de perwerde dibin bi awayekî zelal anîn ziman. Tevahiya mamosteyan dan zanîn ku ev xwendekarên duziman li gor xwendekarên ku zimanê wan î zikmakî tirkî ne dezavantajî ne û pê wan re ne. Her

wiha ji fikrên mamosteyan jî diyar dibe ku fikra perwerdehiya duzimanî ya ku bi vê lêkolînê tê parastin fikreke rast e.



ENCAM

Ziman ne tenê ew amûr e ku mirov hest û fikrên xwe tîne ziman, her wiha renga xwezayê ye ku bi rengê xwe û bi xezîneya ku di dilê xwe de dihevine re cihanê û jiyane xweştir dike. Ev xweşî jî ji aliyê kes, civak an neteweyan ve bi alîkariya zimanê zikmakî tê jiyîn û her wiha dide jiyandin. Ziman çawa ku di her qadên civakê de xwedî ciheke giranbûya ye, di perwerdehiyê de jî girîng û bi qîmet e. Çunkî perwerdehî ew pêvajoya ku amadekirina mirovan ji pêdiviyên civakê re ye. Helbet hewce ye ku ev pêvajoyê bi nîrxên civakê pêk were. Ziman jî yek ji nîrxên herî bi qîmet ên civakê ye.

Bi vê lêkolînê jî derket holê ku ji ber perwerdehiya yekzimanî, li Tirkiyeyê zarokên duzimanî rûbirû gelek pîrsgirêkan dimînin. Bi gotinek din zarokên duziman ku bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde nabin rastî gelek pîrsgirêkan tên. Agahiyên ji hevdîtinên bi mamosteyan re hatin bi destxistinê yekê piştrast dikin. Pîraniya mamosteyan dan zanîn ku ev zarokên duziman ku bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde nabin di xwendin û nivîsandinê de, pîrsgirêkan mezin dijîn. Ev zarok dereng dixwînin û ku bixwînin jî fêhm nakin. Bi têkiliya mamosteyan û lihevkerina heval û mamosteyan re rastî pîrsgirêkan mezin tên. Ev zarok fikr û hestên xwe baş nikarin bin ziman û ev carinan wek şiddet jî dide der. Dîsa ev zarok ji ber ku bi zimanê xwe zikmakî perwerde nabin, xwe li dibistanê xerîb dibînin û car caran dixwazin ji dibistanê dûr bikevin. Her wiha mamosteyan di derheqê perwerdehiya duzimanî de jî fikrên xwe bi xweşbînî anîn ziman û wan jî hewcedarî bi perwerdehiya duzimanî dîtin.

Li aliye din avantajên duzimanîyê di vê pergalê de ji bo zarokên duziman ên ku bi zimanê xwe perwerde nabin bûye dezavantaj. Lê divê mamoste ji bîr nekin ku qedirdayina zimanê zikmakî yê zarokan jî bandoreke baş li pêvajoya perwerdehiya zarokan dike. Divê mamosteyên van zarokan, qîmeta zimanê wan î zikmakî bi van zarokan bide hîskirin û her wiha ji bo derûniya zarokan jî ji nêzikatiyên cezakirin, biçûkxistin û nebaqil dûr bikevin.

Lê divê dê û bavên van zarokan jî ji bîr nekin ku têkiliyeke xurt di navbera zimanan de heye. Ji bo veguherîna dezavantaja van zarokan, dêvîla ku dev ji zimanê

zîkmakî berdîn divê zêdetir giraniyê bidin zîmanê zîkmakî. Dê û bav divê pê bawer bin ku zîmanê zîkmakî çi qas xurt be, zîmanê duwemîn jî ew qas xweş û kêrhatî dibe. Ango zarok dikare serkeftinên zîmanê xwe yî zîkmakî veguhezîne zîmanên din jî.

Her weha li Tîrkiyeyê ev demeke dirêj e ku li ser vê mijarê nîqaşên berfireh çê dibin lê mixabin ti pêşketineke şênber derneketiye holê. Ji bo cudahiya navbera zarokên ku bi zîmanê xwe perwerde dibin û nabin ji holê rabe, ji bo ku zarok bi zîmanê xwe perwerde bibin û serkeftîtir bibin pergaleke nû ya perwerdehiyê hewce ye. Ji bo pergaleke nû divê mînakên welatên ku perwerdehiya duzîmanî lê çê dibin baş bê lêkolînkirin û modeleke ku ji Tîrkiyeyê re dibe têkeve pratîkê.



Çavkanî

- Aksan, D. (2015). *Her Yonuyle Dil*. Ankara: Turk Dil Kurumu.
- Alpay, N. (2010). “Anadili, Yabancı Dil ve Eksiltici İkidillik.”, *Egitim-Sen* , di hundirê *Anadilde Egitim Sempozyumu-1*. Egitim-Sen. 28-29 Haziran 2003 Ankara, ss. 83-90
- Alpkaya, G. (2010). Avrupa Konseyi ve AGİT Çerçevesinde Anadilde Egitim. di hundirê *Anadilde Egitim Sempozyumu-2* de (s. 157-171). Ankara: Egitim-Sen.
- Ayan, M., & Koçbaş, D. (2009). *Çiftkillik ve Egitim*. İstanbul: Sabancı Üniversitesi.
- Ayan, M., & Koçbaş, D. (2011). *Goç ve Çokkillik Baglamında Okullarda Okuryazarlık Edinimi*. İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi.
- Aydin, H. (2013). *Dunyada ve Turkiye’de Çokkulturlu Egitim Tartışmaları ve Uygulamaları*. Ankara: Nobel Akademik.
- Aydın, H., & Kaya, İ. (2014). *Çoğulculuk Çokkültürlü ve Çokdilli Eğitim*. Ankara: Anı.
- Baker, C. (2001). *Foundations of Bilingual Edication and Bilingualism* (Thir Edition b.). ABD: Multilingual Matters.
- Baker, C. (2011). *İkidilli Egitim* (1. Baskı b.). (S. GÜVENER, Çev.) İstanbul: heyamola.
- Balçık, M. (2009). “Milliyetçilik ve Dil Politikaları” (Editor Tanıl Bora ve Murat Gültekingil) *Modern Turkiye’de Siyasi Düşünce* Cilt: 4, rr. 778-799 İstanbul: İletişim.
- Banks, J. (2013). *Çokkulturlu Egitime Giriş*. (H. AYDIN, Çev.) Ankara: Anı.
- Beltekin, N. (2014). *Okul ve Oteki Yurttaşlar- Kurt Politik Aktorlerin Egitimsel Deneyimleri*. İstanbul: Vate.
- Bican, G. (2017). *Danimarka’da Türkçe-Danca Konuşan Öğrencilerin Dil Görünümlerinin İkidillilik Temelinde İncelenmesi*, Yayınlanmamış Doktora Tezi.
- Binbaşıoglu, C. (2004). *İlk okuma ve yazma öğretimi* (1 b.). Ankara: Nobel.
- Cagaptay, S. (2006). *Turkiye’de İslâm, Laiklik ve Milliyetçilik: Turk Kimdir?..* (O. Bircan, Çev.) İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.
- Celep, C. (2005). *Eğitimle İlgili Temel Kavramlar*. Ankara: Anı.

- Chomsky, N. (2012). *Doğa ve Dil Üzerine* (2. Baskı b.). (A. B. KARADAĞ, Çev.) İstanbul: Sözcükler.
- Coşkun, V., Derince, M. Ş., & Uçarlar, N. (2010). *Dil Yarası-Türkiye'de Anadilinin Kullanılmaması Sorunu ve Kürt Öğrencilerin Deneyimleri*. Diyarbakır: Disa.
- Crystal, D. (2013). *Dillerin Katli* (3. Baskı b.). (G. CANSIZ, Çev.) İstanbul: Profil.
- Cummins, J. (2001a). *Language, Power and Pedagogy*. Canada: Multilingual Matters.
- Cummins, J. (2001b). Bilingual Children's Mother Tongue: Why is it important for education? *Sprogforum*(19), 15-20.
- Çagaptay, S. (2009). Otuzlarda Türk Milliyetçiliğinde Irk, Dil ve Etnisite. *di hundirê Modern Türkiye'de Siyasi Düşünce* de (s. 245-262). içinde İstanbul: İletişim.
- Çiçek, C. (2007). Duzimanî, Mirina Zimanan û Rewşa kurdî li Tirkiyeyê. *Zend*, 36-50.
- Darder, A. (2010). Dil, Pedagoji ve İktidar: Dilsel Soykırıma Karşı Çıkma. Eğitim-Sen içinde, *Anadilde Eğitim Sempozyumu-2* (s. 34-50). Ankara: Eğitim-Sen.
- Degirmencioglu, S. (2010c). Anadilinin Gelişimsel ve Toplumsal İşlevleri. Eğitim-Sen içinde, *Anadil Sempozyumu-2* (s. 105-128). Ankara: Eğitim-Sen.
- Demirler, D. (2007). *Eğitime Erişimin ve Eğitim Kalitesinin Artırılmasında Anadil Etmeni*. İstanbul: Yayınlanmamış Taslak Rapor, Eğitim Reform Girişimi.
- DİSA. (2011). *Dil Eğitim Modelleri ve Ülke Örnekleri*. Diyarbakır: DİSA.
- Eğitim-Sen. (2004). 4. *Demokratik Eğitim Kurultayı-Çok Dilli, Çok Kültürlü Toplumlarda Eğitim*. Ankara: Eğitim- Sen.
- Eğitim-Sen. (2010). *Anadilinin Önemi Anadilinde Eğitim*. Ankara: Eğitim-Sen.
- Eğitim-Sen. (2014). Eğitimde Resmi Dil Politikaları, Anadilinde ve Çok Dilli Eğitim. di 5. *Demokratik Eğitim Kurultayı* de ss. 103-127. Ankara: Eğitim-Sen.
- Gozukuçuk, M. (2014). *Anadili Türkçe Olmayan İlkokul Öğrencilerine İlkokuma-Yazma Öğretiminde Karşılaşılan Sorunlar ve Çözüm Önerileri*. Denizli: Yayınlanmamış Doktora Tezi.
- Guleryuz, H. (2004). *Türkçe İlkokuma Yazma Öğretimi Kuram ve Uygulamaları*. Ankara: Pegem.

- Güneş, F. (2007). *Ses Temelli Cumle Yontemi ve Zihinsel Yapılandırma*. Ankara: Pegem.
- Gungor, N. (1988). *Fındıkoğlu'nun Eğitim, Dil ve Kültür Üzerindeki Görüş ve Önerileri*. Ankara: Yayınlanmamış Doktora Tezi.
- Jiyan, A. (2015). *Hêwisîn*. Ankara: j&j.
- Kaplan, İ. (2009). MİLLİ Eğitim İdeolojisi. di hundirê *Modern Türkiye'de Siyasi Düşünce* de (s. 788-799). İstanbul: İletişim.
- Karadaş, R. (2017). *Anadili Türkçe Olmayan Öğrencilerin Bulunduğu Sınıflarda Okuma Yazma Öğretirken Öğretmenlerin Yaşadığı Sorunlar ve Bu Sorunların Giderilmesine Yönelik Çalışma Önerileri*. Burdur Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi. Mehmet Akif Ersoy Üniversitesi
- Koksal, D., & Pestîl, A. D. (2012). *Yabancı dil olarak Türkçe öğretimi* (2 b.). Ankara: Pegem Akademi.
- Mergen, F. (2010). *İkidiilli Bireylerin Anadilinde ve İkinci Dilde Anlambilimsel İşlemlerinin Nörodilbilimsel Açısından İncelenmesi*. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi İzmir: Dokuz Eylül Üniversitesi.
- Mertcan, H., & Şeker, M. (2014). Anadil Tartışmaları ve Arapçaya Yönelik Resmi Politikalar. Eğitim-Sen, di hundirê 5. *Demokratik Eğitim Kurultayı* ss. 140-151. Ankara: Eğitim-Sen.
- Nişanyan, S. (2011). *Hayali Coğrafya*. İstanbul: Tesev.
- Nohl, A. M. (2014). *Kültürlerarası Pedagoji* (2 b.). (R. SOMEL, Çev.) İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi.
- Opengin, E. (2011). *Rewşa Kurdî ya Sosyolenguîstîk li Tirkîyeyê*. İstanbul: Avesta.
- Oran, B. (2003). Ulusal Egemenlik Kavramının Dönüşümü, Azınlıklar ve Türkiye. *Anayasa Yargısı*, 48-91.
- Orhan, S. (2012). *Dil Politikaları, Dil Hakları ve Türkiye'de Uygulamaları*. Ankara: Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi.
- Oruç, Ş. (2016). Ana Dili, İkinci Dil, İki Dillilik, Yabancı Dil. *The Journal of Academic Social Sciens Studies*, 270-290.
- Ozdemir, M. Ç. (1988). *Federal Almanya'daki Türk İşçi Çocuklarının Eğitim Sorunları Açısından İki Dillilik ve İki Kültürlülük İle İlgili Eğitim Modelleri*.

Gazi Üniversitesi Sosyal Bilimler Üniversitesi: Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi.

Ozdogru, M., & DİLMAN, H. (2014). *Anadil Edinimi ve Yabancı Dil Öğretim Kuralları*. Ankara: Anı.

Pulat, T., & Tacar, P. (1996). *Kültürel Haklar Dünyadaki Uygulamalar ve Türkiye İçin Bir Model Onerisi*. Ankara: Gundogan.

Seçen, S. (2011). *Anadilde Eğitim ve Türkiye Uygulaması*. Ankara: Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi. Gazî Üniversitesi

Sinan, A. T. (2006). Ana Dili Eğitimi Üzerine Bazı Düşünceler. *Fırat Üniversitesi Doğu Anadolu Bölgesi Araştırmaları Dergisi*, 4(2), ss. 75-78.

Sincar, F. (2015). *Anadili Eğitim Dilinden Farklı Olan Öğrencilerin Karşılaştıkları Sorunlara İlişkin Bir Araştırma*. Gaziantep: Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi. Zirve Üniversitesi

Surmeli, H. (2015). *Anadilinde Eğitim Hakkı*. Ankara: Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi. Ankara Üniversitesi

Terzioğlu, S. (2007). *Uluslar Arası Hukukta Azınlıklar ve Anadilde Eğitim Hakkı*. Ankara: Alp.

Tulu, Y. (2009). *Ana Dili Türkçe Olan ve Ana Dili Türkçe Olmayan(İki Dilli) 4-7 Yaş Çocukların Dil Düzeylerine Etki Eden Faktörlerin İncelenmesi*. Konya: Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi. Selçuk Üniversitesi

Uluslararası Azınlık Hakları Grubu (2007). *Bir Eşitlik Arayışı: Türkiye'de Azınlıklar..*

Vendryes, J. (2001). *Dil ve Düşünce*. İstanbul: Multilingual.

)

Yalinkiliç, K., Delice, E., & Kaygusuz, C. (2014). Anadillilik Problemi ve Çiftdilli-Çokdilli Eğitim Modelleri. Eğitim-Sen içinde, 5. *Demokratik Eğitim Kurultayı* ss. 152-166, Ankara: Eğitim-Sen.

Yazıcı, Z., & Genç, B. (2008). Okul Öncesi Dönemdeki İki Dilli/ Çok Dilli Çocukların Dil Kazanma Süreci. *Dil Araştırmaları Dergisi*, ss. 47-61.

Yazici, Z., & Temel, F. (2011). İkidilli ve Tek Dilli Çocuklarda Dil Gelişimi ve Okuma Olgunluğu Gelişimi. *Mehmet Akif Ersoy Dergisi Eğitim Fakültesi Dergisi*, ss. 145-158.

Yegen, M. (2003). *Devlet Söyleminde Kürt Sorunu*. İstanbul: İletişim.

Yildiz, K. (2004). *Kürtlerin Kültürel ve Dilsel Hakları*. İstanbul: Belge.

Yildiz, K., & Duzgoren, K. (2002). *Bir Dilin İnkarı: Türkiye' de Kürtçe Dil Hakkı*. Londra: Kurdish Human Rights Project.



Çavkaniyên Dijîtal

- Cengiz, A. K. (2006). *Dil-Kültür Açısından Hatay'da İki Dillilik*. Hatay: Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi. <https://tez.yok.gov.tr/UlusalTezMerkezi/tezSorguSonucYeni.jsp> (tarîxa xwe gihandinê: 6 25, 2018)
- UNİCEF,(?) *Çocuk Haklarına Dair Sözleşme*. www.unicef.org: https://www.unicef.org/turkey/crc/_cr23c.html (TAR8 22, 2018an)
- Derince, Ş. (2012). *Tek Dilliliği Yeniden Düşünmek Ve Çok Dilliliğin Geleceği*. Diyarbakır:DİSA. http://disa.org.tr/calismalarimiz&q=3&k=25&e=47&ln=tr_TR&b=1&sq=1&b=3&sq=1 (tarîxa xwe gihandinê: 6 22, 2018)
- DİSA. (2012). *Ülkelerin Dil Planlaması ve Politikaları:Egitinde Çokdillilik*. Diyarbakır, <http://www.disa.org.tr/onceanadili4.pdf> (tarîxa xwe gihandinê: 7 1, 2018)
- KONDA. (2006). *Biz kimiz? Toplumsal Yapı Araştırması*. <http://www.konda.com.tr/tr/raporlar.php> (tarîxa xwe gihandinê: 6 21, 2018)
- Yagmur, K. (2007). Eşik Kuramı. *Ankara Üniversitesi Dil Dergisi*(135), 60-76. http://dergiler.ankara.edu.tr/detail.php?id=27&sayi_id=760 (tarîxa xwe gihandinê: 6 /17/2018)

PÊVEK

Pêvek I: Forma Hevdîtînê

GÖRÜŞME FORMU

AÇIKLAMA

Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında yüksek lisans öğrencisiyim. 1. sınıfa giden ikidilli (Kürtçe-Türkçe) çocukların okuma-yazma, konuşma, okul ve sınıfa uyum ve iletişim becerilerinde yaşadıkları sorunları anlamaya yönelik bir araştırma yapmaktayım. Bundan dolayı sizlerin fikirlerinizi almak istiyorum. Görüşmede elde edilen veriler araştırma için kullanılacaktır. Katılımınız için teşekkür ediyorum.

BÖLÜM I.

Kişisel Bilgiler

Öğretmenin;

Cinsiyeti:

Kıdemi:

Anadili:

Görüşmenin;

Tarihi:

Yeri:

Kodu:

Sınıftaki çocukların anadili sayısal olarak nelerdir?

Kürtçe

Türkçe.....

Bölüm II.

Dil Becerileri

1. Konuşma

- Çocuklar ders esnasında ve ders aralarında okul dilini hangi sıklıkta konuşuyorlar?

- Anadili okul dilinden farklı olan öğrencileriniz duygularını ve düşüncelerini okul dilinde ifade etmede sorun yaşıyorlar mı?

2. Okuma

- Anadili okul dilinden farklı olan çocukların okuma becerileri olması gereken bakımından nasıldır?
- Anadili okul dilinden farklı olan çocukların okumaya geçmesi zaman açısından sorun oluyor mu?
- Anadili okul dilinden farklı olan çocukların okuduklarını anlama becerileri nasıldır?

3. Yazma

- Anadili okul dilinden farklı olan çocukların yazma becerileri nasıldır?
- Anadili okul dilinden farklı olan çocukların yazmaya geçmesi zaman açısından sorun oluyor mu?
- Anadili okul dilinden farklı olan çocuklar yazdığını anlamada sorun yaşıyorlar mı?

Bölüm III

İletişim Becerileri:

- İkidilli olan öğrencileriniz arkadaşları ile iletişimde sorun yaşıyorlar mı?
- Çocuklar anadilinin okul dilinden farklı olmasından dolayı kendisini size yeterince ifade edememe sorunu yaşıyorlar mı?
- Çocuklar anadilinin okul dilinden farklı olması sebebiyle dinleme, duyduklarını anlama ve yönergeleri uygulamada sorun yaşıyorlar mı?

Bölüm IV

Okul ve Sınıfa Uyum

- Çocukların anadillerinden farklı bir dilde eğitim görmeleri sınıfa ve okula uyum sorunları yaşamalarına sebep oluyor mu?

- Çocukların anadilin okul dilinden farklı olması derse ve etkinliklere katılımlarını nasıl etkiliyor?
- Anadili okul dilinden farklı olan öğrenciler, diğer öğrenciler ya da diğer öğretmenler ile uyum sorunu yaşıyorlar mı?

Bölüm V

Öğretmenlerin ikidilli Çocuklara İlişkin Görüş ve Deneyimleri

- Mevcut eğitim sistemini ikidilli çocuklar için yeterli ve uygun görüyor musunuz, neden?
- Sizce çocuğun ikidilli olmasının eğitim açısından bir faydası var mı?
- Sizce anadili okul dilinden farklı olan çocukların anadili okul dili ile aynı olan çocuklara göre dezavantajları nelerdir?
- Sizce anadil temelli ikidilli eğitimin olması çocuğun dil gelişimi, sosyalleşme ve akademik başarısı üzerinde olumlu veya olumsuz nasıl etkisi olur?

Pêvek II: Lîsteya Gotûbêjkeran

A01DJ- Zimanê zikmakî erebî ye, 2 sal in dixebite û jin e.

T02DJ- Zimanê zikmakî tirkî ye, 3 sal in dixebite û jin e.

T03DJ- Zimanê zikmakî tirkî ye, 2 sal in dixebite û jin e.

T04DM- Zimanê zikmakî tirkî ye, 4 sal in dixebite û mên e.

T05DJ- Zimanê zikmakî tirkî ye, 2 sal in dixebite û jin e.

T06DJ- Zimanê zikmakî tirkî ye, 2 sal in dixebite û jin e.

T07DJ- Zimanê zikmakî tirkî ye, 3 sal in dixebite û jin e.

T08DJ- Zimanê zikmakî tirkî ye, 3 sal in dixebite û jin e.

T09DM- Zimanê zikmakî tirkî ye, 3 sal in dixebite û jin e.

K10DM- Zimanê zikmakî kurdî ye, 11 sal in dixebite û mên e.

K11DM- Zimanê zikmakî kurdî ye, 5 sal in dixebite û mên e.

K12DJ- Zimanê zikmakî kurdî ye, 3 sal in dixebite û jin e.

K13DM- Zimanê zikmakî kurdî ye, 17 sal in dixebite û mên e.

T14DM- Zimanê zikmakî tirkî ye, 8 sal in dixebite û mên e.

K15DM- Zimanê zikmakî kurdî ye, 19 sal in dixebite û mên e.

K16DJ- Zimanê zikmakî kurdî ye, 2 sal in dixebite û jin e.

K17DJ- Zimanê zikmakî kurdî ye, 2 sal in dixebite û jin e.

T18DJ- Zimanê zikmakî tirkî ye, 4 sal in dixebite û jin e.

T19DM- Zimanê zikmakî tirkî ye, 4 sal in dixebite û mên e.

T20DM- Zimanê zikmakî tirkî ye, 4 sal in dixebite û mên e.

K21DM- Zimanê zikmakî kurdî ye, 11 sal in dixebite û mên e.

K22DM- Zimanê zikmakî kurdî ye, 20sal in dixebite û mên e.

K23DJ- Zimanê zikmakî kurdî ye, 8 sal in dixebite û jin e.

K24DM- Zimanê zikmakî kurdî ye, 7 sal in dixebite û mên e.





T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilimdalı

Yüksek Lisans Tezi

**İKİDİLLİ ÖĞRENCİLERİN TEKDİLLİ
OKULLARDA YAŞADIĞI SORUNLAR**

Cemil GÜNEŞ

16711035

Tez Danışmanı

Dr. Öğr. Gör. Mustafa ASLAN

Mardin-2018



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilimdalı

Yüksek Lisans Tezi

İKİDİLLİ ÖĞRENCİLERİN TEKDİLLİ OKULLARDA YAŞADIĞI SORUNLAR

Cemil GÜNEŞ

16711035

Tez Danışmanı

Dr. Öğr. Gör. Mustafa ASLAN

Mardin-2018